K.T.
Zanîngeha Dîcleyê Enstîtuya Zanistên Civakî
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

JI MEŞRÛTIYETA DUYEM HETA SALÊN 1990'Î DI KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ DE TEMSÎLIYETA JINA KURD

Bünyamin IŞIK
22933200

Şêwirmend
Prof. Dr. Mehmet Mesut ERGİN

Diyarbekir 2025

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

İKİNCİ MEŞRUTİYETTEN 1990'LI YILLARA KADAR KÜRT GAZETE VE DERGİLERDE KÜRT KADININ TEMSİLİYETİ

Bünyamin IŞIK
22933200

Danışman
Prof. Dr. Mehmet Mesut ERGİN

Diyarbakır 2025

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **"Ji Meşrûtiyeta Duyem Heta Salên 1990'î di Kovar û Rojnameyên Kurdî de Temsîliyeta Jina Kurd" (İkinci Meşrutiyetten 1990'lı Yıllara Kadar Kürt Gazete ve Dergilerde Kürt Kadınının Temsiliyeti)** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

07/11/2025

Bünyamin IŞIK

PÊŞGOTIN

Ji destpêkê ber bi roja îroyîn ve di wê demajoya dirêj a paşxaneya civakbûyînê de dema mijar dibe jin û mafên jinan, di warê helwest û hişmendiyê de bêguman pirrengî têk diçe û tenê rengek bi hemû taritiya xwe serweriya xwe ya "reş" radigihîne me. Ew kesk a bi rengê xwe deşt û çiyayên Kurdistanê dixemilîne, ew sorahiya rengê xwe daye gulên di paxila Cudî de û ew zerahiya rojê ya li asîmanê Kurdistanê tîrêjên xwe dibiriqîne û yên din yek bi yek têkdiçin û li ber bayê "reş" ê kujer edî hew dikarin li ber xwe bidin. Belê ew bextê-reş bi jan û êşên xwe bûye para jinan. Serînetewandina li hemberê vê siûda-reşî ya jînên berxwedêr, bû bingeha motîvasyona xebatê û hêz da min.

Di mijareke ewqas girîng de, ji bo kesên xwedî hasasiyet elbet hilbijartina xebateke bi vî rengî ne tesadufî ye. Ji bo belavbûyîn û bicihbûna vê hasasiyetê li seransarê civaka Kurdistanê pêwistiya xebatên bi vî rengî û kêmasiya xebatên di vê qadê de bû sedem ku ez bibim bargir û hevkarê vê barî.

Di vê rêwitiya dirêj û watedar de, di serî de ji şêwirmendê xwe Prof. Dr. Mehmet Mesut Erginî re, herwiha ji endamên jurîyê Prof. Dr. Hayrullah Acar û Doç. Dr. Osman Aslanogluyî re spasdar im ku bi pêşnîyaz û rexneyên xwe piştgirî dan vê xebatê. Dîsa ji Prof. Dr. Tahirhan Aydın re, ji bona piştgirî û hevkariyê ji Laleş Ongun, Gulsum Kaplan û Rıdvan Karakaplan re spasdar im. Herî dawiyê, ji malbata xwe re spasdar im ku, di her rêwitiyek min de bi dilsozî bi min re dibin rêheval.

Bünyamin IŞIK

Diyarbekir 2025

KURTE

Ev xebat, li ser tespîtkirin û vekolîna rol û temsîliyetên jinên kurd ên di rojname û kovarên kurdî ku di navbera salên piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem (1908) heta salên 1990'î disekine. Heman demê de hewl dide ku bizanîbe, ka ev rol û temsîliyetên di wan kovar û rojnameyan de xwe didin der, di konteksta civakî û dîrokî de çawa hatine dirûvîn? Di gotarê de rastî guherîneke çawa hatine? Rol û temsîliyet li gor rihê serdemê rastî guherînan hatine, yan nehatine? Eger hatibe guherîneke çawa ye?

Bê guman dema behsa veguherînê tê kirin, divê faktor û dînamîkên di vê guherînê de bûne diyarker, bi karîgeriyeke hûrgerî li ser xebat were kirin û xetên wan qasê ku çarçoveya xebatê rê dide were tespîtkirin. Dînamîk û faktor li gor rihê serdeman (salên dawiyê yên Împaratoriya Osmanî û salên destpêkê yên Komara Tirkiyeyê -destpêka salên 1980'î heta dawiya salên 1990'î) hatine diyar kirin, û bi pronivîsa metnê re paralel hatine senifandin. Her binemaya ku em di rûpelên pêş de bi berfirehî li ser disekinin, di diyarkirin û sînordarkirina erk û rolan de bûne diyarkerên xweser. Ji navê xebatê jî diyar e ku mijara em li ser lêpirsînê dikin di demajoyeke berfireh de xwe pêk aniye. Ji ber vê yekê, li gor dîsîplînên lêkolînên zanistî, bi hinek teknîkên metodolojîk (Metodolojiya Kombînasyona Tehlîla Naveroka Dîrokî û Tehlîla Gotarî) em çarçoveya xebatê teng dikin. Lê divê neyê jibîrkirin ku ev tengkirina xebatê ne bi mebesta sînordariyê ye û nayê wê wateyê ku ji melûmatên hinek hêlên xebatê me bêpar dihêle. Berovajiyê vê zêdetir derfetê dide xwîneran ku ew bikaribin bi zelalî bi veguherînên serdêmî re hemhal bibin û bala xwe baştir bidin wan diyardeyan û ji nakokî û nezelaliya hêmanên heyî xwe rizgar bikin.

Bêjeyên Sereke

Kurd, jin, rolên civakî, nasnameya netewî, kovar, rojname, kevneşopî, nûjenî

ÖZET

Bu çalışma, 1908 yılında İkinci Meşrutiyet'in ilanından 1990'lı yıllara kadar olan dönemde yayımlanan Kürtçe gazete ve dergilerde Kürt kadınlarının rollerinin ve temsillerinin tespit edilmesi ve incelenmesi üzerine odaklanmaktadır. Aynı zamanda, bu rollerin ve temsillerin, söz konusu yayınlarda nasıl ortaya çıktığını ve toplumsal-tarihsel bağlamda nasıl şekillendiğini anlamaya çalışmaktadır. Çalışmada, bu rollerin ve temsillerin hangi değişimlere uğradığı sorgulanmaktadır. Roller ve temsiller, dönemin ruhuna bağlı olarak değişime uğramış mıdır, uğramışsa bu değişim nasıl olmuştur? Gibi temel sorulara cevaplar bulunmaya çalışılmıştır.

Kuşkusuz değişimden bahsedildiğinde, bu değişime katkıda bulunan faktörlerin ve dinamiklerin, çalışmanın kapsamı elverdiğince titizlikle incelenmesi ve bu dinamiklerin çizgilerinin belirlenmesi gerekmektedir. Dinamikler ve faktörler, dönemlerin ruhuna (Osmanlı İmparatorluğu'nun son yılları, Türkiye Cumhuriyeti'nin erken dönemi- 1980'lerin başından 1990'ların sonuna kadar) göre tanımlanmış ve metnin argümanlarıyla paralel bir şekilde sınıflandırılmıştır. İlerleyen sayfalarda detaylı olarak ele alacağımız her bir alt tema, görev ve rollerin belirlenmesinde ve sınırlandırılmasında kendine özgü belirleyici unsurlar olmuştur. Çalışmanın başlığından da anlaşılacağı üzere, üzerinde durduğumuz konu geniş bir zaman diliminde şekillenmiştir. Bu nedenle, bilimsel araştırma disiplinlerine uygun olarak bazı metodolojik teknikler (Tarihsel İçerik Analizi ve Söylem Analizi Kombinasyonu Metodolojisi) kullanılarak çalışmanın çerçevesi daraltılmıştır. Ancak, bu daraltmanın sınırlama amacı taşımadığı ve çalışmanın bazı yönlerden eksik kalmasına neden olmayacağı unutulmamalıdır. Tam tersine, bu yaklaşım, okuyuculara dönemsel dönüşümleri daha net bir şekilde kavramaları ve mevcut unsurların çelişkilerinden ve belirsizliklerinden arınarak bu olgulara daha iyi odaklanmaları için bir fırsat sunmaktadır.

Anahtar Kelimeler

Kürt, kadın, toplumsal roller, ulusal kimlik, dergi, gazete, gelenek, modern

ABSTRACT

This study focuses on identifying and examining the roles and representations of Kurdish women in Kurdish newspapers and magazines published from the proclamation of the Second Constitutional Era in 1908 to the 1990s. It also seeks to understand how these roles and representations emerged in these publications and how they were shaped within their socio-historical context. The study investigates the transformations these roles and representations underwent and whether these changes were influenced by the spirit of the respective periods. If changes occurred, it explores how they took place.

When discussing change, it is essential to meticulously examine the factors and dynamics contributing to these transformations within the scope of the study and to delineate their contours. These dynamics and factors are defined and classified in alignment with the text's arguments, reflecting the spirit of the periods (the final years of the Ottoman Empire, the early period of the Republic of Turkey, and from the early 1980s to the late 1990s). As elaborated in subsequent pages, each sub-theme has served as a distinctive determinant in defining and delimiting tasks and roles. As indicated by the study's title, the subject spans a broad temporal scope. Therefore, to narrow the framework, methodological techniques such as (Historical Content Analysis and Discourse Analysis Combination Methodology) have been employed, in line with scientific research disciplines. However, it should be noted that this narrowing does not aim to limit the study or cause deficiencies in certain aspects. On the contrary, this approach offers readers an opportunity to more clearly grasp periodic transformations and focus on these phenomena, free from contradictions and ambiguities.

Keywords

Kurdish, women, societal roles, national identity, magazine, newspaper, tradition, modern

NAVEROK

Hejmara Rûpelan

PÊŞGOTIN ..... **I**

KURTE ..... **II**

ÖZET ..... **III**

ABSTRACT ..... **IV**

NAVEROK ..... **V**

DESTPÊK **1**

1. MIJAR Û KÊŞEYA TEZÊ **1**

2.ARMANCA TEZÊ **2**

3.RÊBAZA TEZÊ **3**

4.SÎNORÊN TEZÊ **3**

5.DANASÎNA BEŞÊN TEZÊ **4**

BEŞA YEKEM **6**

A. KURTENÊRÎNEK LI SER DÎROKA WEŞANGERIYA KURD **6**

B. XULASEYEK LI SER REWŞA JINA KURD **14**

BEŞA DUYEM **22**

A. JI SERDEMA PIŞTÎ ÎLANKIRINA MEŞRÛTIYETA II. HETA QONAXA PIŞTÎ HAWARÊ (1908-1950) **22**

1. ROJÎ KURD (1913) **22**

JINÊN KURD Û PIRSGIRÊKA JINÊ **23**

1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ **25**

1.1. Netewperweriya Kurd 25

1.1.1. Avakariya Nasnameya Kurd 25

1.2. Binyada Sosyo-Kulturî ya Civaka Kurd 25

1.2.1. Cudakariya di navbera Gund û Bajaran de 25

1.3. Perwerdehî û Reformên Civakî 26

1.3.1. Rola Navendî ya Perwerdehiyê 26

1.3.2. Malbat û Civak 26
1.3.3. Zayenda Civakî û Malbat 26
2. TEHLÎLA GOTARÎ 26
2.1. Ziman û Şêwaz 26
2.1.1. Zimanê Mobîlîze û Hestewer 26
2.1.2. Zimanê Berawirdî 26
2.1.3. Dulibiyên Erênî û Neyinî 27
2.2. Çarçoveya Îdeolojîk 27
2.2.1. Gotara Nûjenbûnê 27
2.2.2. Perspektîfa Netewperwer 27
2.2.3. Lihevanîna Kevneşopî û Nûjeniyê: 27
2.3. Stratejiyên Gotarî û Girseya di Hedefê de 27
2.3.1. Girseya di Hedefê de 27
2.3.2. Hevsengiya Pejnî û Mentiqî 27
2.3.3. Temsîliyetên Erênî û Neyînî 28
2.4. Avakariya Hêz û Nasnameyê 28
3.ENCAM 28
2. SERBESTÎ (1908) 28
KURD Û KURDISTAN: JINÊN KURD 29
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ 30
1.1. Têkoşîna Neteweyî ya Kurd û Rola Jinan 30
1.2. Rola Civakî ya Jinan û Nujenbûn 31
1.3. Berawirdiya bi Rojava re û Rola Îslamê 31
1.4. Di Civaka Kurdan de Cihê Jinê yê Kevneşopiyî 32
2. TEHLÎLA GOTARÎ 32
2.1. Wek Remza Neteweyî Bicihkirin û Muqedeskirina Jinê 32
2.2. Gotara Medeniyet û Nûjenbûnê 33
2.3. Pêşçavkirina Nirxên Dînî 33
2.4. Stratejiyên Hestewer û Rewanbêjî 33
2.5. Gotara Serdestiyê ya Li Dijberî Rojava 34
3. ENCAM 34

3. JÎN (1919) **34**
a. XANIMA KURD **35**
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ **38**
1.1. Temayên Sereke û Temsîliyet 38
1.1.1. Rola Jinan a Şanîdera Şariştanî 38
1.1.2. Azadî û Xweseriya Jina Kurd 38
1.1.3. Hêza Exlaqî û Fîzîkî 39
1.1.4. Dahatûya Netewî û Perwerde 39
1.1.5. Hevsengiya Civakî û Binyata Malbatê 39
2. TEHLÎLA GOTARÎ **40**
2.1. Stratejiyên Gotarî yên Sereke 40
2.1.1. Gotara Raserî ya Berawirdî 40
2.1.2. Ji Nû ve Şîrovekirina Îslamê 40
2.1.3. Îdealîzekirina Jina Kurd 41
2.1.4. Nasnameya Netewî û Rola Jinan 41
2.1.5. Gotara Hevsengiya Patriyarkal 41
2.1.6. Hêz û Otorîte 41
3. ENCAM **42**
b. DESTÛRNAMEYA KOMALEYA TEALIYA JINÊN KURD **42**
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ **43**
1.1. Zeman û Mekan 43
1.2. Armanc 43
2. TEHLÎLA GOTARÎ **43**
2.1. Ziman û Şêwaz 43
2.2. Nasname û Aîdiyet 43
2.3. Rolên Zayendî 44
2.4. Çarçoveya Îdeolojîk 44
3. ENCAM **44**
c. JI BO CIVATA DAYÎKAN **44**
1. TEHLÎLA DI KONTEKSTA DÎROKÎ DE **45**

1.1. Zeman û Mekan 45
1.2. Jin û Rola Dayîkbûnê 45
1.3. Çarçoveya Exlaqî û Olî 46
1.4. Tesewura Pêşerojî 46
2. TEHLÎLA GOTARÎ 46
2.1. Ziman û Şêwaz 46
2.2. Rolên Zayendî 46
2.3. Hêz û Otorîte: 46
3. ENCAM 46
4. HAWAR (1932-43) 47
a. KEBANÎ Û MAMOSTE 47
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ 49
1.1. Konteksta Dîrokî 49
1.2. Binemayên Siyasî û Kulturî 49
1.2.1. Polîtikayên Bişaftinê 49
1.2.2. Netewperweriya Kurd 49
1.2.3. Cihê Jinan ên Civakî 50
1.3. Rolên Jinan û Temsîliyet 50
1.3.1. Rolên Kevneşopiyî 50
1.3.2. Rolên Netewperwer/Nûjen 50
1.3.3. Hilberîner/Parazvana Kulturî 50
2. TEHLÎLA GOTARÎ 50
2.1. Avakariya Nasnameyê û Şêwaz 50
2.1.1. Şêwaz 50
2.1.2. Avakirina Nasnameyan 51
2.1.2.1. Jina Kurd 51
2.1.2.2. Mamoste û Xwendevan 51
2.1.2.3. Aktora Fedakar 51
2.2. Stratejiyên Retorîkî û Metafor 51
2.2.1. Metafora Nexweşiya Nezaniyê 51
2.2.2. Retorîya Cengê 51

2.2.3. Bikaranîna Gotinê Pêşiyan 51
2.2.4. Îqnakirina Hestî û Mantiqî 52
2.3. Çarçoveya Îdeolojîk 52
2.3.1. Zayenda Civakî 52
3. ENCAM 52
b. JIN Û BEXTIYARIYA MALÊ 52
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ 53
1.1. Binyata Civakî ya Serdemê 53
1.1.1. Rolên Jinan û Civaka Kurd 53
1.1.2. Pozberiya Kevneşopî û Nûjenîbûnê 53
1.1.3. Ronîdarî û Perwerdehî 54
1.2. Peyama Metnê ya Dîrokî 54
2. TEHLÎLA GOTARÎ 54
2.1. Ziman û Şêwaz 54
2.1.1. Şêwaza Fêrker 54
2.1.2. Zimanê Metaforîk 54
2.1.3. Barê Hestewer 55
2.2. Gotara Zayenda Civakî 55
2.2.1. Rola Jinê 55
2.2.2. Dulibiya Jin-Mêrî 55
2.2.3. Xweseriya Jinê 55
2.3. Gotara Sadeyî û Bextewariyê 55
2.3.1. Rexneya li ser Dewlemendiya Madî 55
2.4. Çarçoveya Îdeolojîk 56
2.4.1. Îdeolojiya Patriyarkal 56
2.4.2. Piştgiriya Civakî 56
2.4.3. Pendên Exlaqî 56
3. ENCAM 56
B. SERDEMA GEŞEDANÊN POLÎTÎK Û VEJÎNÊ (JI DESTPÊKA SALÊN 1970'Î HETA DAWIYA SALÊN 1990'Î) 57
1. DEVRİMCİ DEMOKRAT GENÇLİK 57

KOMALEYA JINÊN ŞOREŞGER ÊN DÎMOKRAT **58**
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ **59**
1.1. Tirkiyeya Salên 1970'yî û Tevgera Kurd 59
1.2. Bicihbûna Îdeolojîk û Rola DDKD'yê 60
1.3. Pêşçavkirina Birêxistinbûna Jinan 60
1.4. Pozisyona Dîrokî ya Jinên Kurd 60
2. TEHLÎLA GOTARÎ **61**
2.1. Gotara Marksîst û Antî-Kolonyal 61
2.2. Gotara Navendparêzî û Yekîtiyê 61
2.3. Gotara Proto-Femînîst a di Derbarê Rola Jinê ya Şoreşger de 61
2.4. Gotara Enternasyonalîst û Hevkariyê 62
2.5. Zimanê Mobîlîzasyon û Performansê 62
2. 6. Kirdewariya Jinê ya Siyasî 62
3. ENCAM **62**
2. MEDYA GUNEŞİ (1988) **63**
REWŞA JINA KURD **63**
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ **67**
1.1. Konteksta Dîrokî û Temayên Sereke 67
1.1.1. Bandora Feodalîzm û Mêtinkariyê 67
1.1.2. Neyeksaniya di Perwerdeyê de 68
1.1.3. Nebînayiya Aborî û Kedê 68
1.1.4. Temsîliyeta Jinan a Siyasî û Birêxistinbûn 68
1.2. Referansên Dîrokî 69
2. TEHLÎLA GOTARÎ **69**
2.1. Hêmanên Bingehîn yên Gotarê 69
2.1.1. Gotara Tadeyî ya Pevgînî (intersectionality) 69
2.1.2. Rexneya Patriyarkal 69
2.1.3. Bangewaziya Birêxistinbûna Xweser a Jinan 70
2.1.4. Îmaja Jinê ya Şoreşger û Şervan 70
2.2. Bicihbûna Îdeolojîk a Gotarê 71
2.2.1. Gotara Netewperwer û Çînî 71

2.2.2. Gotara Rexneyî 71
2.3. Stratejiyên Gotarî û Pêwendiyên Hêzdariyê 71
3.ENCAM 71
3. REWŞEN (1992) 72
***EY JINA KURD* 72**
1.TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ 75
1.1. Konteksta Dîrokî 75
1.1.1. Meseleya Kurd û Tirkiyeya Salên 1990'î 75
1.1.2. Rola Jinan 76
1.2. Temayên Dîrokî yên Helbestê 76
1.2.1. Nasnameya Piralî 76
1.2.2. Berxwedêrî û Têkoşîn 76
1.2.3. Berxwedana Kulturî 76
2. TEHLÎLA GOTARÎ 77
2.1. Ziman û Retorîk 77
2.1.1. Îdealîzasyon û Pesn 77
2.1.2. Xîtab û Dubare 77
2.1.3. Metaforên Estetîkî û Xweza 77
2.1.4. Metaforên Şer û Berxwedêrî 77
2.2. Gotara Îdeolojîk 77
2.2.1. Netewperweriya Kurd 77
2.2.2. Gotara Femînîst 77
2.2.3. Avakariya Nasnameya Kolektîf 78
3.ENCAM 78
4. NÛDEM 78
a. BIXWÎNE JINÊ 79
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ 81
1.1. Konteksta Civakî û Polîtîk a Serdemê 81
1.1.1. Têkoşîna Azadiyê ya Kurdan 81
1.1.2. Rola Civakî ya Jinan 81
1.2. Peyama Dîrokî ya Helbestê 81

1.2.1. Bîrewerbûn û Perwerdehî 81
1.2.2. Fedakarî û Welatparêzî 82
1.2.3. Wekhevî û Veguherîna Civakî 82
2. TEHLÎLA GOTARÎ 82
2.1. Ziman û Şêwaz 82
2.1.1. Şêwaza Bicoş û Epîk 82
2.1.2. Dubarekirina Bêjeyan 82
2.1.3. Zimanê Remzî û Metaforîk 82
2.2. Gotara Zayenda Civakî 82
2.2.1. Nasnameya Nû ya Jinê 82
2.2.2. Wekheviya Zayendî 83
2.2.3. Xweseriya Jinê 83
2.3. Welatparêzî û Gotara Nasnameyê 83
2.3.1. Nasnameya Kurd 83
2.3.2. Niştimanperwerî û Fedakarî 83
2.3.3. Berxwedana Kulturî 83
2.4. Çarçoveya Îdeolojîk 84
2.4.1. Îdeolojiya Femînîst 84
2.4.2. Îdeolojiya Netewperwer 84
2.4.3. Perwerde û Nûjenbûn 84
3. ENCAM 84
b. DI CIVATÊ DE WEKHEVIYA JIN Û MÊRAN 84
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ 89
1.1. Cihê Civakî yên Jinan 89
1.2. Têgihiştina Roja Jinan a Navneteweyî 89
1.3. Ji Binemayên Dîrokî re Bersiva Metnê 89
1.3.1. Kêmasiya Perwerde û Bîrewerbûnê 89
1.3.2. Zextên Civakî û Siyasî 89
1.3.3. Lihevnekirina Kevneşopî û Modernîteyê 90
2. TEHLÎLA GOTARÎ 90
2.1. Stratejiyên Retorîk û Ziman 90

2.1.1. Zimanê Muqayeseyî û Gerdûnî 90
2.1.2. Vebêja Metaforîk 90
2.1.3. Tewra Rexneyî û Pirsyarker 90
2.1.4. Bi Pirsan Avakariya Argumentan 90
2.2. Temayên Sereke 91
2.2.1. Wekheviya Mêr û Jinê û Binemayên Civakî 91
2.2.2. Kevneşopî, Bawerî û Rolên Civakî 91
2.2.3. Veguherîna Civakî û Perwerde 91
2.2.4. Hevrûkirina Rojava û Rojhilatanavînê 91
2.2.5. Kirdewariya Daxwaza Wekheviyê 91
2.3. Pozisyona Îdeolojîk 91
3. ENCAM 92
5. HEVDEM 92
BI BÎRANÎNA LEYLA QASIM 92
1. TEHLÎLA NAVEROKA DÎROKÎ 95
1.1. Konteksta Dîrokî 95
1.2. Temsîliyeta Dîrokî ya Leyla Qasim 96
1.3. Girîngiya Wê ya Dîrokî û Bandora li ser Tevgera Jinê 96
2. TEHLÎLA GOTARÎ 97
2.1. Zimanê Mobîlîzeyî û Hestewerî 97
2.2. Pozisyona Îdeolojîk: Gotara Netewî û Femînîst 97
2.3. Tewra Rexneyî û Bangewazî 98
2.4. Metafor û Remz 98
3. ENCAM 99
ENCAM 100
ÇAVKANÎ 103
PÊVEK 106

DESTPÊK

1. MIJAR Û KÊŞEYA TEZÊ

Ev xebat, li ser tespîtkirin û vekolîna rol û temsîliyetên jinên kurd ên di rojname û kovarên kurdî ku di navbera salên piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem (1908) heta salên 1990'î disekine. Ev rol û temsîliyet di konteksta civakî û dîrokî de çawa hatine dirûvîn û hewl dide bizanîbe ka ew rolên civakî bi bandora kîjan faktor û dînamîkan guherîne an jî forma xwe parastine tespît bike. Herwiha ev xebat hewl dide ku, bersiveke zelal ji vê pirsa lêkolînê ya sereke: Ji Meşrûtiyetê heta salên 1990'î di çapemeniya kurdî de temsîliyetên jina kurd, di çarçoveya nasname, îdeolojî û zayenda civakî de çawa hatine avakirin û kîjan veguherînan derbas kirine? Û ji pirsa lêkolînê ya alîkar re: Veguherîna normên zayenda civakî ên jinên kurd ji serdema destpêka salên 1900'î ber bi salên dawiya 1990'î ji hêla kîjan binemayên îdeolojîk û sosyolojîk ve hatine beralîkirin? Peyda bike û li ser rewşa nasnameya zayendî ya civakî û li ser cih û temsiliyetên jinan bi ser serdeman re rapîrsînek pêk bîne.

Çima ev pirsa lêkolînê? Ya rast ahenga di navbera pirsê û metodolojiyê rê da vê hevalbendiyê. Ji aliyê tehlîla naveroka dîrokî ve qismên pirsa lêkolînê yên "ji Meşrûtiyetê heta salên 1990'î" û "kîjan veguherînan derbas kiriye" perspektîfeke dîrokî û bi awayekî sîstematîk tehlîlkirina veguherînên metnan ên di nava demê de îma dike. Ev yek, ji bo tehlîla naverokê bikaribe daneyên dîrokî kategorîze bike û qalibên metnan diyar bike guncav e. Ji aliyê tehlîla gotarî ve diyardeya "bi çi awayê hatine avakirin" lêpirsînek li ser pêvajoya bi rêya remz, ziman û gotarên îdeolojîk avakirina temsîliyetan pêk tîne.

Eger em berê xwe bidin serboriya pêvajoya tespît û diyarkeriya faktor û dînamîkan, em dikarin bêjin ku ev xalên jêrîn wek hokarên sereke derdikevin pêş:

a) Piraniya rojname û kovarên piştî Meşrûtiyeta Duyem û serdema ewil a Cimhûriyetê hatine weşandin, yan di arşîvan de nehatine parastin, yan jî bi hejmarên sînordar hatine weşandin. Xwegihiştina kopiyên fîzîkî yên van weşanan wek dijwariya sereke derdikeve pêş: hinek ji wan wenda bûne, deforme bûne an jî di

koleksiyonên taybet de tên parastin. Ev rewş, ihtimala sînordariya bergeha xwebatê bi xwe re tîne.

b) Bandora polîtîkayên devletê; li Tirkiyeyê qedexeya bi salên dirêj (bi taybetî navbera salên 1920-1980) a li ser weşanên kurdî, hejmar û naveroka rojname û kovarên kurdî sînordar kirî ye. Ev rewş, dikare li ser avakirina vegotineke domdar a li ser temsîliyeta jinên kurd wek astengiyek were xwendin.

c) Di warê hesasiyetên polîtîk de kêşe û merezên potansiyel îhtîmal in, lewre nasnameya kurdbûnê û tevgerên serdema modern ên jinên kurd ku di qada polîtîk de pêk tên xalên hasas in. Bi hesasiyeta bêlayen a akademîk kêşeyên potansiyel dê werin berteref kirin.

d) Bariyera ziman jî kêşeyeke bingehîn a vê xebatê ye. Lewre rojname û kovarên kurdî yên destpêkê bi gelemperî di tekela hukumraniya Osmaniyan de ne û gelemperî bi zimanên wek kurdî, tirkiya Osmanî û erebî hatine weşîn. Kêmasiya lêkoleran a di van zimanan de bandor li ser kapasîteya di cih de û rast nirxandin û tehlîla naveroka van dokûmentan dike. Heman demê de, di dema pêvajoya wergerê de wendabûna wateya bêjeyan jî kêşeyeke ihtîmal e. Lê bi hevkariya kêsên di vê qadê de pispor û amûrên teknolojîk kêşeyên potansiyel hatine mînîmîze kirin.

e) Jin di nivîsandin û cihgirtina wan daneyan de nebûne kirde, gelek caran jî rasterast cih negirtine û karê nivîs û qeyda wan dokumentan bi serdestiya mêrane hatine dîzaynkirin; ev jî dibe sedem ku temsîliyet û cihê jinan bi rêdan û însiyatîfa mêrên wê serdemê were tayînkirin.

2. ARMANCA TEZÊ

Bi qasê îmtiyazên zayendeke, zayenda din ji xwe re bergehek dikare biafirîne û di wê qadê de fonksiyonên jiyînê li dar bixîne. Di qadên civakî de fonksiyonên cihêreng û kiryarên xwezayî gelek caran li jinan hatine astengkirin, li gor daxwazên dilê xwe kêm caran dikarin di biryar û kiryarên xwe de bibin xwedîsoz. Ev xebat jî hewl dide ku di paşxaneya civakî de heta niha faktorên di avakariya vê rewşê de xwedîrol in tespît bike û faktor û dînamîkên di veguherînê de bi bandor in, bi rêya metodolojiyên di cih de baş binirxîne û bi lêpirsîneke sîstematîk bersivan ji wan re peyda bike. Heman demê de di nav wê hewlê de ye ku hişmendiya wekhevîxwaziya

zayendî di civaka kurdan de berbiçav bike. Bibe yek ji referansên sereke yên di vê qadê de û bi forma xwe rê li ber zêdebûna xebatên bi vê rengî vebike û ji wan re pêşengtiyê bike.

3. RÊBAZA TEZÊ

Di destpêka hilbijartina vê mijarê de xala ku zêdetirîn hişê min tevlîhev dikir danîn û diyarkirina rêbaz û metodolojiya xebatê bû. Çimkî mijara ku ezê li ser bixebitiyam xwediyê çarçoveyeke gelekî berfireh bû, tenê bi berhemek an jî bi rol û temsîliyetên ku xetên wan diyar in nehatîbû sînordarkirin, elbet ev jesta bi comerdî hatibû kirin dê bi xwe re hinek kêşe û merezan bianîba rojevê; nîtekîm di demajoya amadekirinê de anî jî. Lê bi saya vê metodolojiyê ez bi piştrastî ji wan kêşe û merezan rizgar bûm. Lewre medotolojiya "Metodolojiya Kombînasyona Tehlîla Naveroka Dîrokî û Tehlîla Gotarî" wê derfetê dide ku em têbigihêjin statû, temsîl û rolên civakî ên jinên kurd ji serdema destpêka salên 1900'î ber bi salên 1990'î ve bi çi rengî veguherîne.

Ev tehlîl li ser du bingehan xwe diafirîne: Ya yekem tehlîla naveroka dîrokî ye, ya duyem jî tehlîla gotarî ye. Tehlîla naveroka dîrokî, konteksta sosyo polîtîk û kulturî ya serdema ku metin lê hatine nivîsîn dide ber çavan û bi awayekî sîstematîk temsîliyetên jinên kurd di nav herikîna demê de çawa hatine veguherîn vedikole. Ev rêbaz wê derfetê dide ku di demajoya dirêj a ji Meşrûtiyetê (1908) heta salên 1990'î de, di serdemên cuda de bandora bûyerên polîtîk (hilweşîna Osmanî, avabûna Komara Tirkiyeyê, polîtîkayên bişaftinê, tevgerên li dîasporayê) a li ser temsîliyeta jinê were fêmkirin. Tehlîla gotarî, bi rêya nirxandina binyata ziman, retorîk û îdeolojiya metnan, derpêş dike ku jinên kurd di rojname û kovaran de bi kîjan rolan pêşçav bûne, bi çi awayê hatine temsîlkirin, û armancên îdolojîk-polîtîk ku di bingeha vê temsîliyetê de veşartî ne derdixe holê. Ev rêbaz, ne tenê wateyên ji rû ve yên metnê, heman demê de ji bo dîtin û fêmkirina têkiliyên hêzî, bînemayên zayenda civakî û gotarên netewperwerî çawa hatine derpêşkirin rêbazeke di cih de ye.

4. SÎNORÊN TEZÊ

Ev xebat, bi serdema piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem (1908) heta salên 1990'î hatiye sînordarkirin. Kovar û rojnameyên di navbera salên navborî de hatine

weşandin bûne bingeha avakirina zemîna vê xebatê. Bi taybetî rol û temsîliyetên jinên kurd ên di van rojname û kovaran (Rojî Kurd, Jîn, Serbestî, Hawar, Devrimci Demokrat Gençlik, Medya Guneşi, Rewşen, Hevdem, Nûdem) de ji xebatê re bûne referans, û hatine vekolîn.

5. DANASÎNA BEŞÊN TEZÊ

Ev xebat, ji du beşên sereke pêk tê; beşa yekem rojname û kovarên ber bi serdemên dawiya Osmanî û salên destpêkê ên Komara Tirkiyeyê hatine weşandin (Rojî Kurd, Jîn, Hawar û Serbestî) werdigre nava xwe, beşa duyem jî kovar û rojnameyên destpêka salên 1980'î heta salên 1990'î (Devrimci Demokrat Gençlik, Medya Guneşi, Rewşen, Hevdem, Nûdem) werdigre nava xwe. Ji kovara Rojî Kurd nivîsek, ji rojnameya Serbestî nivîsek, ji kovara Jînê 3 nivîs, ji kovara Hawarê 2 nivîs, ji kovara Medya Guneşi nivîsek, ji kovara Devrimci Demokrat Gençlik nivîsek, ji kovara Nûdemê 2 nivîs, ji kovara Hevdemê nivîsek; bi temamî 12 metin ji bo tehlîlkirinê hatine hilbijartin. Wekî ku tê dîtin di navbera kovar û rojnameyên salên ber bi dawiya Osmanî û destpêkê yên Komara Tirkiyeyî (1918-1943) û kovar û rojnameyên destpêka salên 1980'î valahiyek demdirêj dixuye. Sedema bingehîn ya vê rewşê polîtîkayên bişaftinê yên ji aliyê dewletê ve li ser ziman û weşangeriya kurdî ne. Lewre di navbera wan salan de xebat û lebatên di vê derbarî de bi qasê ku tune be kêmpeyda ne, yên hene jî mixabin temendirêj û domdar nebûne.

Beşa yekemîn (1908-1950), Serdema destpêkê ya tezê werdigre nava xwe û xala destpêkê ya temsîliyetên di çapameniya kurdî de, yanî bi piranî çarçoveyên kevneşopiyî, kulturî û netewperweriyê di xwe de dide der. Ev beş, ji bo têgihiştina bingehên dîrokî û formên ewil ên temsîliyetan zemînek ava dike. Zêdetir bala xwe dide ser qisma pirsa lêkolînê ya "bi çi awayê hatine avakirin" û herwiha îdeolojiyên serdema destpêkê û rolên zayendî yên civakî vedikole.

Beşa duyemîn (1960-1990), serdema modern û polîtîk a tezê werdigre nava xwe. Bi pêşçavbûna tevgera kurd, têkoşîna polîtîk û çeşîtdariya îdeolojîk re veguherîna avabûna temsîliyetan tehlîl dike. Zêdetir bala xwe dide ser qisma pirsa lêkolînê ya "kîjan veguherînan derbas kiriye" û polîtîkbûna temsîliyetan û veguherîna di dînamîkên zayenda civakî de derpêş dike.

Beşa yekemîn, formên ewil û kokên temsîliyetan, beşa duyemîn jî veguherînê û nûjenbûnê vedikole. Her du beş jî, perspektîfên nasname, îdeolojî û zayenda civakî bi kar tîne. Lê di beşa yekemîn de zêdetir temsîlên kevneşopî û kulturî, di beşa duyem de jî temsîlên îdeolojôk û polîtîk dertên pêş.

BEŞA YEKEM

A. KURTENÊRÎNEK LI SER DÎROKA WEŞANGERIYA KURD (Ji Salên 1898'î ber bi Salên 1990'î Dîroka Weşangeriya Kurd)

Beşa yekemîn di konteksta xebatê de, dikare wek beşeke alîkar were pênasekirin. Lewre di vê xebatê de wê fokûsa me zêdetir li ser beşa duyemîn be ku di wê derê de meqseda xebatê biteferûat hatiye pêşkeşkirin. Feqet, bi kurtasî be jî xulaseya dîroka weşangeriya kurd, wê ji bo têgihêştina şert û mercên atmosfera dîrokî ya serdeman ji me re bibe alîkar.

Pel û refên weşangeriya kurdî, rûzemînên girîng in ku li wê derê tovên seruvena têkoşîna siyasî, nasname û kulturî ya gelê kurd lê hatine çandin. Lewre weşangeriya kurd, ji serdema ku di dawiya sedsala 19an heta dawiya sedsala 20an, bi taybetî heta salên 1990'î dirêj dibe de, ji salên dawiya Împaratoriya Osmanî yên lemelem bigre, heta polîtikayên monîst ên Komara Tirkiyeyê, di rêwitiyeke dijwar re bihûriye. Di vê demajoyê de, weşangeriya kurd, bi tevger û cemiyetên kurd re parelel geş dibe ku di avakirina bîreweriya neteweyî, parastina ziman û kulturê de roleke krîtîk bi cih aniye. Ev kurtenêrîn di wê armancê de ye ku, dîroka weşangeriya kurd, ji sala 1898an heta salên 1990'î bi rêxistin û cemiyetên di salên dawî û piştê Împeratoriya Osmanî de derketine re gêre bike û bi ser wê re kompozîsyoneke kronolojîk pêşkeş bike.

Divê neyê ji bîr kirin ku, ev kompozîsyon di rêwîtiya xwe de tenê bala xwe dide ser xetên bingehîn û tenê di rawestgeh û qonaxên girîng yên dîrokî de radiweste. Ji pêla yekemîn ber bi pêlên heta salên 1990'î, çirûska ewilîn a bi navê "Kurdistan" ê agirê seruvena weşengeriya kurdî li qada dîrokê pêdixe.

Di 22'yê Nîsana 1898an de, rojnameya kurdan a ewil a bi navê "Kurdistan" li Qahîreya Misrê, ji alî Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve tê çapkirin. Avakarê rojnameyê Mîthet Bedirxan tenê 5 hejmaran berpirsiyariya rojnameyê pêk tîne û piştre karê berpirsiyariyê sewqê birayê xwe Evdirehman Bedirxan dike. Heta hejmara 31an a rojnameyê, Evdirehman Bedirxan li ser vê karê dimîne. Di navbera salên 1898 û 1902an de rojnameya Kurdistan 5 caran cih guhertiye, li sê welatên cihê hatiye çapkirin. (Dilgeş, 2017) Ev welat ev in: Misr, Swîsre û Îngîlîstan.

Wekî ku li jor jî hatiye destnîşankirin, di veguhestina vê serûvenê de emê çîroka welidîna cemiyet û komaleyên kurd û welidîna rojname û kovarên kurd bi awayek têkel vebêjin. Lewre piştî kombûn û avabûna cemiyetan, cih û zemînên fikrên neteweyî, polîtîk û kulturî lê vedije nav rûpelên wan weşanan in. Bi vê mexsedê yekemîn qonaxa ku emê lê rawestin, sala 1908an e. Tê zanîn di wê salê de, bi saya xebatên cemiyeta bi navê "Îtîhad û Teraqî" û buhrana siyasî-civakî ya serdemê, rejîma îstîbdad a Ebdulhemîdê II. neçar dimîne ku di Tebaxa 1908an de Meşrûtiyeta II. îlan bike.

Piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyemîn, li cihê rejîma destpot a Evdilhemîdê II. kêm be jî bayê azadiyê bi xwe re hewayeke qismî-azad tîne. Bi saya vê hewaya nû, gelek malbat û rewşenbîrên kurd derfet dibînin ku ji sirgunê vegerîn Stenbolê. Herwiha Meşrûtiyeta Duyemîn û encamên wê, bîlhesa li ser rewşa xebatên weşangerî, ronakbîrî û siyasî yên kurdên li Stenbolê tesîreke girîng kiriye. Ew rewşenbîrên ku ji nû ve li Stenbolê civiyane, di şertên serbestiya Meşrûtiyetê de dest bi xebata avakirina rêxistinên civakî, siyasî, neşriyat û çapameniyê kirine. (Veroj, 2017)

Di heyamekê wisa de, piştî demekê Seyîd Evdilqadirê kurê Şêx Ûbeydullah Nehrî, Bedîûzzeman Seîdê Kurdî, Babanzade Îsmaîl Heqî, Hecî Tewfîq (Pîremêrd) û hinek rewşenbîrên din ên kurd hatin cem hev û di sala 1908an de Komeleya Hevkarî û Pêşveçûna Kurdan (Cemiyeta Teawûn û Teraqî ya Kurdan) ava kir. Seyîd Evdilqadir bû serokê vê saziyê û Mûşîr Ehmed Paşa jî wek alîkarê wî hat hilbijartin. (Onen, 2018)

Di rêznameya Komeleya Alîkarî û Pêşveçûna Kurdan de, weşîna rojnameyekê hefteyî ya bi kurdî- tirkî hatibû destnîşankirin. Bi ser vê yekê re wekî organa resmî ya Cemiyetê, di 5ê Kanûna 1908an de Rojnameya Teawûn û Teraqî ya Kurdan li Stenbolê dest bi weşanê kir. (Malmisanij, 1998) Tewfîqê Silêmanî (Pîremêrd) xwediyê îmtiyaz, mudirmesûl û niviskarê rojnameyê ye. Naverok û temaya herî berçav a Rojnameya Teawûn û Teraqî ya Kurdan, wekî ku di nivîsên hatine weşandin de jî hatiye diyarkirin; daxwaza xwendin û perwerdeyiya bi zimanê kurdî, ji holê rakirina dijminî û îxtîlafên nav civata kurd û yekgirtina miletê kurd e. (Veroj, 2021)

Pêla duyemîn a ku di sala 1908an de xwe li qeraxê weşangeriya kurdî dixe "Serbestî" ye. Rojnameya Serbestî, yek ji rojnameya herî temen direj a salên dawî yên Dewleta Osmanî ye. Xwedî û mudirmesûlê Serbestiyê Mewlanzade Rifat e. Neşriyata rojnameya Serbestî, di 16'yê Sermaweza 1908an de dest pê dike. (Veroj, 2017) Rojnameya Serbestî bi qasê ku tê zanîn û li gor xebatên li ber dest bi tevî hev 770'ê hejmar hatine weşîn. (Issı, 2010) Nivîsên rojnameyê li gor babetên xwe, di bin sernivîsên cur bi cur de hatine belavkirin. Di bin sernivîsa "Siyasiyê" de maqaleyên siyasî yên li ser rojevê hatine belavkirin. Di bin sernivîsa "Hududû daxiliye" û "Hududî Xariciye" de jî, nûçeyên hundir û derve hatine nivîsîn. Bi piranî di rûpelên dawî de jî nameyên xwendevanan hatine belavkirin. (Veroj, 2017)

Di vê rêwîtiyê de qonaxa duyem ku emê lê rawestin sala 1912an e. Piştî ceribandina Cemiyeta Teawûn û Teraqî ya Kurdan, di pêvajoya navbera salên 1908-12yan de, kurd hem ji Îtîhad û Teraqiyê dûr ketin hem jî di nav wan de fehma "Îtîhadê Osmanî" lawaztir bû. Di encama vê de, têgihîştin û hişyariya netewî û çêkirina rêxistinên xomalî bihêztir bû. (Veroj, 2017) Yek ji van rêxistinên xomalî, Komeleya Xwendekarên Kurd-Hêvî (Kürt Talebe-i Hêvî Cemiyeti) bû. Bêguman, kadroya "Hêviyê" ku kêliyek din emê yek bi yek navên wan bibîr bînin, di belavkirin û geşkirina wê agirê ji çîka ewil a bi navê "Kurdistan" welidîbû de xwedî ked û roleke pîroz e.

Komela Hêvî ya Xwendekarên Kurd, di 27'ê Tîrmeha 1912an de hatiye damezrandin û ji bo sekreteriya komelê Omer Cemîl Paşa hatiye hilbijartin. Ev komel bi kurtayî wek Komela Hêvî jî tê binavkirin. Piştî ku Komela Hêvî tê damezrandin di demeke kurt de gelek endamên wê çêdibin. Di nav van endaman de yên herî naskirî ev in: "Kemal Fewzî, Memduh Selîm Begî, Ekrem Cemîl Paşa, Ziya Wehbî, Nejmedîn Huseynî, Ezîz Babanzade, Hemzeyê Muksî, Mihemed Şefîq Arwasî, Mehmed Mihriyê Sineyî, Tayib Elî, Ebdulqadirê Diyarbekirî, Asaf Bedirxan, Mistefa Reşatê Diyarbekirî, Dr. Mistefa Şewqiyê Mehabadî, Dr. Fuad, Ebdurehîm Rehmiyê Hekarî. (Veroj, 2021)

Piştî vê pevrayiyê, şewq û ronahiya "Rojî Kurd" ê tîrêjên xwe li ser weşangeriya kurd direşîne. Komela Hêvî, piştî damezrandinê ji bo belavkirin û pêkanîna armancên xwe kovara Rojî Kurd diweşîne. Rojî Kurd, kovareke duzimanî

ye ku bi kurdî-tirkî hatiye weşandin. Bi tevahî 4 hejmarên wê hatine weşandin. Jimara yekemîn a kovarê di 6'ê Hezîrana 1913an de hatiye çapkirin, li ser bergê kovarê hatiye nivîsandin ku xwedî îmtiyaz û midurê mesûl Ebdulkerîm Efendî yê Silêmanî ye. Jimara duyemîn, di 6'ê Temûza 1913an, jimara sêyemîn di 1'ê Tebaxa 1913an, jimara çaremîn jî di 30'yê tebaxa 1913an de hatiye çapkirin.

Xebata Komaleya Hêvî di nav civata kurd de hiş û hişyariyek neteweyî peyda kiriye. Ji ber vê yekê, dorûberê hikumetê û bi taybetî jî Tevgera Îtihad û Teraqî, ji xebata Komela Hêvî û derçûna kovara Rojî Kurd gelek aciz bûn. Ji ber vê gelek zextên hikumetê li ser komelê û xebatkarê wê çêbûn. Piştî weşandina çar jimaran, çapkirina kovara Rojî Kurd hatiye rawestandin. Ji rawestandina weşana vê kovarê şûnve, li şûna wê, bi navê Hetawî Kurd kovareke nû hate weşandin. Kovara Hetawî Kurd, wek berdewamiya kovara Rojî Kurd û xebata Komela Hêvî, hetanî sala 1914an weşana xwe didomîne. Wek kovara Rojî Kurd, kovara Hetawî Kurd jî ji ber zext û astengên deshilatdariya siyasî û rewşa awarte ya Şerê Giştî, hatiye sekinandin. (2021)

Qonaxa sêyem ku emê niha lê rawestin sala 1918an e ku, piştî Şerê Cîhanê yê Yekem rewşenbîr û welêtperwerên kurd ji nû ve, ji cihê navber dabûn xebatên xwe, dest bi xebatên xwe kirin. Xebatên Komaleya Hêvî li dar xistibûn, rihê fikra netewî vejand û ji bo têkoşîna peydakirina fikra netewî wek çîka ewil agirê netewperweriyê pêxistibû. Rewşenbîrên kurd ku ji kadroyên kevn ên rêxistinên beriya xwe, vê carê bi rêxistineke cuda û fikrên ciyawaz derketin qada têkoşînê.

Rewşa piştî şer ji bo tevgerên cudaxwaziyê guncav bûbû ji ber ku Şerê Cîhanê yê Yekem Kurdistan kiribû keşeyeke navneteweyî û Dewleta Osmanî hema bêje li ber belavbûnê bû. Xala 12an a 14 Xalên Wîlson hêviya Kurdistaneke xweser bilind kir, bi taybetî jî di nav hinek esîlên kurd de. Rêzikên Wîlson û belavbûna Dewleta Osmanî cesaret da kurdan û di encama van xalên navborî de rêxistineke nû ya bi navê Komaleya Bilindkirina Kurdistanê (Kurdistan Teali Cemiyeti) hate avakirin. (2018)

Navenda vê komaleyê li Stenbol e. Li Amed, Bedlîs, Xarpêt, Dêrsim û cihên din li ser hev 19 şubeyên wê hatine vekirin. Di kongrê de ji bo Civata Kargêriya Komelê, Seyîd Evdilqadir wek serokê komelê, Emîn Alî Bedirxan wek alîkarê pêşîn

ê serokê komelê, Fuad Paşa wek alîkarê diduyan ê komelê, Hemdî Paşa wek sekreterê giştî hatin hilbijartin. Herwiha, gelek kurdên navdar û naskirî jî bûne endamên Komelê û bi awayekî aktîf xebitîne. Hinek endamên naskirî û xebatkar ev in: Seyîd Evdillah, Mîralay Xelîl Beg, Mîralay M. Elî Bedirxan, Xoce Elî Efendî, Şefîq Arwasî, Prof. Şukrî Baban, Fetullah Efendî, Mewlanzade Rifat, Dr. Şukrî Mihemed, Dr. Fuad Berxo, Kemal Fewzî, Kamran Elî Bedirxan, Reşîd Axa, Mihemed Mihrî, Memduh Selîm Begî, Evdirehîm Rehmî Hekarî, Mele Seîdê Kurdî, Hemzeyê Muksî û Xelîl Xeyalî. (Veroj, 2023)

Rêxistina Komeleya Bilindkirina Kurdistanê, ji bo belavkirina xebat û fikrên siyasî, netewî û kulturî dest bi weşandina kovara "Jîn" ê kirin. Kovara Jîn, wek organa resmî ya Komelê li piştî navber û vemra Şerê Cîhanê yê Yekem ji nû ve agirê weşangeriyê "Jîn" dar kir.

Jimara yekemîn a kovara Jînê, di roja 7'ê Çiriya Paşîn a 1918an de hatiye çapkirin. Li ser beşê kunyeya jimara yekemîn a Jînê, ev motto nivîsandiye û heta jimara 25an hatiye dubarekirin: "Kovareke bi zimanê kurdî-tirkî ye, behsa dîn, edebiyat, îctîmaiyat û îqtîsadiyatê dike." Xwedî û berpirsiyarê Jînê Hemzeyê Muksî bû. 20 jimarên Jînê di bin berpirsiyariya Hemzeyê Muksî de hatine çapkirin û jimara 20 û ji wê pê ve jî Memduh Selîm Begî bûye berpirsyarê kovarê. Îro li gorî jimarên mewcûd, tê zanîn ku 36 jimarên kovara Jînê hatine çapkirin. Temayên cihêreng di nav pel û jimarên Jînê de hatine hûnandin. Di naveroka van nivîsan de; babetên li ser ziman, edebiyat, helbest, dîrok, perwerdehî, pirsgirêkên jinan, folklor, siyaset û meseleya netewî, koçberkirina kurdan û encamên Şerê Giştî hatine nivîsandin û gengeşîkirin. (2021)

Duyemîn kovara ku Komeleya Bilindkirina Kurdistanê, ji bo belavkirina xebat û fikrên xwe yên siyasî, netewî û kulturî weşandiye jî "Kurdistan" e. Yekemîn hejmara kovara Kurdistanê, di roja 30'yê Kanûna 1919an di çapxaneya Necmî Îstîqlal de hatiye çapkirin. Ev kovar, kovareke hefteyî ye, tê de nivîsên bi zimanê osmanî, kurdî, farisî û erebî hatine belavkirin. Ciyê çapkirina wê Stenbol e. Mihemed Mihrî xwediyê îmtiyaz û Arwasîzade Mehmed Şefîq jî sernûserê kovara Kurdistanê ye. (Veroj, 2015)

Ji ber ku bi xebata me re têkildar e, di vê qonaxê de bibîranîna Komaleya Pêşxistina Jinên Kurd jî hêjayê vegotinê ye. Di hejmara Serbestiyê ya 26'ê Nîsana 1919an de, bi navê "*Saziyeke nû ya kurdan"* nûçeyek hatiye belavkirin û di vê nûçeyê de agahdariya damezrandina "Cemiyeta Tealiya Jinên Kurd" hatiye belavkirin. Ev rêxistina nû bi Komeleya Bilindkirina Kurdistanê ve girêdayî bû. Di nûçeya navborî de meqseda cemiyetê bi vî awayî hatiye beyankirin: "Pêkanîna pêşxistina jinên kurd bi zihniyeteke hevdemî; pêkanîna esasên jiyana malbati û zêdekirina hilberîna wê ya di jiyana sosyal de; ji ber tehcir û kuştinê, gelek zarokên kurd sêwî û jinên wan jî jinebi mane, divê xweyîtî û alîkarîya wan bête kirin û karibin wan ji vê sefaletê xelas bikin." (Veroj, 2017)

Qonaxa çarem a ku niha emê lê rewestin sala 1922an e. Piştî hilweşîna Dewleta Osmanî, bi avabûna netew-dewletên nû bi taybetî jî avabûna Komara Tirkiyeyê re, heyameke nû li ber weşangeriya kurd reng vedide. Lewre piştî avabûna Komarê, weşangeriya kurdî rastî helwesteke hovanetir tê ku; li Tirkiyeyê di 3'yê Adara 1924an de weşanên kurdî tê qedexekirin. (Malmîsanij, 2006) Piştî biryara qedexekirinê, weşangeriya kurdî hebûna xwe di çarçoveyeke berfireh de li sirgunê didomîne. Li derveyê axa Kurdistanê, weşanên peryodîk bi taybetî yên li Şam, Beyrût û Ermenîstana Sovyetê hatine weşandin dikare were bibîranîn. (Kaya, 2021)

Ew agirê ku xwe li ber bayê kujer û bêrehm bi awayekî heta vê merheleyê anîbû, bi vê biryar û helwesta hovane ketibû sekeratê û li ber vemirinê bû. Ta ku di sala 1932an de, du birayên Bedirxanî yên nemir, xwe bi "Hawar" ê re gihandin. Ew "Hawar" ji nû ve bû çîrûsk, li dûrê Kurdistanê lê di dilê Kurdistanê de wê agirê geş kir.

Hejmara ewil a Hawarê di 15'ê Gulana 1932yan de derket. Ew kovar heta hejmara pêncî û heftan hat çapkirin, hejmara dawî di 15'ê tebaxa 1943yan de derket. Bîst û sê hejmarên ewil hem bi herfên latînî hem jî bi yên erebî çap dibû. Piştre ji hejmara bîst û çaran û pê ve tenê bi alfabeya latînî hat çapkirin. (Onen, 2018)

Wekî ku li jor jî hatiye diyarkirin, piştî avabûna Komara Tirkiyeyê ji ber biryara hovane ya qedexekirina zimanê kurdî, kar û xebatên weşengeriyê xwe sipartiye welatên biyanî û li dîasporayê xebatên netewî, siyasî û kulturî hatine lidarxistin. Herwiha qasê ku tê zanîn, ji ber polîtîkayên li Tirkiyeyê, ji sala 1923an

heta 1965an tenê du pirtûkên kurdî yên dînî hatine weşandin. (Malmîsanij, 2006) Bi rastî ev diyarde jî valahiya demdirêj a di weşangeriya kurdî de li ber çavan radixîne ku di demajoyeke berfireh de hilberînerî û berhemdarî, ji aliyê polîtîkayên serweran ve hatine vemirandin. Ev rewşa reştarî, bi vê awayê li ser weşangeriya kurdî heta sala 1991an didome û di nav wê salê de bi vekişandina zagona bi hejmara 2932an qedexeya li ser weşanên kurdî radibe. (Malmîsanij, 2006) Di navbera salên navborî de kêm be jî rojname û kovarên kêmtemen hatine weşandin, lê bi kurtasî rewş ji vê yekî îbaret e.

Herî dawiyê, Ji bo beşa yekem belkî hinek çav di xebatê de, wê li navê kovar û rojnameyên wekî; Rojnameya Kurdistan, Rojnameya Teavûn û Teraqiya Kurdan, Rojnameya Şerq û Kurdistan, Rojnameya Ronahî û Rojnameya Roja Nû û li kovarên Hetawî Kurd û Kurdistanê bigerin, lê nebînin. Lewre ev kovar û rojnameyên navborî, li nav refên zêrîn ên dîroka weşangeriya kurd de her dem xwedî cihekî payebilind bûne. Di vekolîna li ser kovar û rojnameyên navborî de qasê ku hat tespîtkirin rasterast li ser "jin" ê nûçeyek yan jî nivîsek nehate bidestxistin. Herwiha tenê di rojnameya Kurdistanê û rojnameya Teavûn û Teraqî ya Kurdan de, navê jinê, di nav çend hevokên wekî; *"jin û zarokên wan tezî û birçî mane"* û *"jin û zarokan kuştin û dan ber sunguyan"* de hatiye derbaskirin. Dîsa di kovara Hetawî Kurd de tenê di hejmara 10an de nameyek li ser navê *"Mağnisa'da Kürt Kızı Kevser"* hatiye weşandin. Di naveroka nameyê de, dilxweşiya ji ber xebatê kovar û komaleyê hatiye veguhestin. Rojnameyên wekî Ronahî û Roja Nû, dîsa nûçeyek li ser jinê parve nekirine. Ji ber ku, di heyama Şerê Cîhanê yê Duyem de hatine weşandin zêdetir nûçeyên di derbarê şer de, di nav pel û nexşên rojnameyan de hatine weşandin.

Dîsa di beşa duyem de, em rastê valahiyek ji piştî qonaxa Hawarê heta salên dawiya 1980'î tên. Lewre beriya niha jî me destnîşan kiribû ku sedema bingehîn a vê valahiyê; helwesta hovane ya Komara Tirkiyeyê ye ku, bi salên dûvdirêj qedexeya li ser zimanê kurdî pêk anîbû. Feqet dîsa jî, ji bo salên 1960'î kovarên sereke yên wekî; Roja Newe (tenê hejmareke hatiye weşîn), Yeni Akış (4 hejmar), Doğu (2 hejmar), Dengê Siwêregê (tenê hejmareke) û Deng (2 hejmar) hatine weşandin. Ji van kovarên navborî hinek ne li ber dest in, di hinekan de jî di derbarê mijarê de nivîsek nehatiye weşandin.

Ji bo salên 1970'î kovarên sereke yên wekî; Devrimci Demokrat Gençlik, Ozgurluk Yolu (44 hejmar), Rizgarî (9 hejmarên ewil li Tirkiyeyê, 9+ li Almanyayê), Tîrêj (4 hejmar), Heval (3 hejmar) hatine weşandin. Di 9 hejmarên ewil ên kovara Rizgariyê de nivîsek li ser jinê nehat tespîtkirin û herwiha hejmara 10an di sala 1987an de li Elmanyayê derketiye. Di 4 hejmarên Tîrêjê de jî nivîsek di derbarê xebatê de nehatiye bidestxistin. Herî dawiyê qasê ku hat vekolîn di Ozgurluk Yolu de jî nivîsek di derbarê jinê de nehatiye weşandin. Ji bo temsiliyeta salên 1970'î ji kovara Devrimci Demokrat Gençlik metneke hatiye bidestxistin û di beşa duyemîn de bi berfirehî analîza wê hatiye parvekirin.

Ji bo salên 1980'î kovarên serekê yên wekî; Medya Guneşi û Deng hatine weşandin. Di xebatê de ji kovara Medya Guneşi metneke ji bo tehlîlê hatiye hilbijartin û bi berfirehî analîza wê hatiye kirin.

Ji bo salên 1990'î ku tê zanîn, di sala 1991an de bi vekişîna zagona bi hejmara 2932an qedexeya li ser weşanên kurdî radibe. Piştî wê hedî hêdî kovar û rojnameyên nû tên weşandin. Ji van ên sereke; Rewşen, Nûbihar, Hevdem, Nûdem (li diasporayê- Swêd), Deng, Newroz û hwd. Ji bo temsîliyeta salên 1990'î kovarên "Rewşen, Hevdem û Nûdem" hatine hilbijartin û metnên ji nav wan hatine derxistin bûne mijara analîzan.

B. XULASEYEK LI SER REWŞA JINA KURD
(Ji salên 1900'î ber bi salên 1990'î ve)

Dema em li rastî gotareke mîna "rewşa jina kurd" tên, bêguman derbirîneke piralî xwe li qeraxê hişê me dixe. Qesta ji gotara 'derbirîna piralî' ev xelek in; rewşa jina kurd a aborî, ya sosyo-kultûrî, ya demografîk û tenduristî, ya hiqûqî û siyasî. Wê demê ev piralîbûna mewcûd, me dabînê bersiveke maqûl bo zelalkirina pirsa "Gelo ji van xelekan wê kîjan bibe ya sereke yan jî muxatabê mijarê?" dike. Ji bo eşkerekirina bersiva maqûl, wê di vê xelekê de serûven û serpêhatiya jinên kurd a di qada polîtîk de, tevger û tecrûbeyên di têkoşîna wergirtina mafan de were veguhestin.

Têkoşîna jinên kurd a ji bo mafan, bi herikîna dîrokê re hem li hemberî newekheviya zayenda civakî, hem jî li hemberî zextên li ser nasnameya etnîkî wek têkoşîneke pirtebeqeyî dirûviye. Di demajoya, ji serdema dawiya Dewleta Osmanî heta avabûna Komarê û ji wir jî heta salên 1990'î dirêj dibe de, cihê jinên kurd ên di tevgerên siyasî de, rolên wan ên civakî û têkoşîna wan a ji bo mafan, hem di çarçoveya dînamîkên civaka kurd ên navxweyî, hem jî di çarçoveya binema û dînamîkên derveyî de veguherîne. Ev kompozîsyon, têkoşîna mafên jinên kurd û tevgerên jinê bi perspektîfeke dîrokî vedikole û xulaseya ji dawiya serdema Osmanî heta salên 1990'î vediguhezîne. Elbet beriya vê ragahindinê kurtenêrînek li ser rewşa jînên cihanê jî, di warê hemhaliyê de wê ji me re bibe alîkar.

Dema li têkoşîna jinê ya ji bo bidestxistina maf û hewla tesîskirina wekheviya zayendî tê nêrîn, bêguman gotarên hêz û enerjiya xwe ji femînîzmê werdigrin derdikevin pêş. Lewre femînîzm, tevgereke civakî, siyasî û hizrî ye ku li gel mêran, wekheviya jinê ya di warên maf, azadî û derfetan de diparêze. Bi nêrîneke din feminîzm, navê têkoşîna li hemberê serweriya mêran û cihêkariya bingeha xwe ji zayendê werdigre ye; di sedsala 18an de bi bandora ramanên wekhevî û azadiyê ku çavkaniya xwe ji Heyama Ronîdariyê wergitine derketiye holê û li seranserê cihanê belav bûye. Armanca femînîzmê ya herî bingehîn, li gel mêran ji jinê re peydakirina statûyeke wekhev û kavilkirina pêvajoya civakbûnê ya ku jinê li piştî mêran bicih dike ye (Aydemir & Özdemir, 2019).

Femizîm, li ser 3 pêlên bingehîn çerxa xwe li dinyayê gerandiye. Eger, em di vê heyama dawiyê de bi geşbûn û belavbûna teknolojî û înternetê 'femînîzma dîjîtal' jî bihesibînin, em dikarin vê pêlê jî wek pêla çarem bisenifînin. Pêla yekem a femînîzmê; piştî Şoreşa Fransî bi alîkariya nirxên mîna wekhevî, azadî û mafên mirovan ên ku ketine rojeva cîhanê bişkiviye û heta salên 1960'î berdewam kiriye. Berhema Mary Wollstonecraft a bi navê A Vindication of the Rights of Women (Parastina Mafê Jinê) ku di sala 1792'an de hatiye weşandin, yek ji wan berhemên pêşeng e ku, ji îdeolojiya femînîst re çavkanitiyê kiriye. Femînîstên pêla yekem, ketine nav lêgerîna veguherîneke siyasî; di mafên siyasî yên wek mafê dengdanê û mafê perwerdeyê de daxwaza wekhevîyê kirine û di vê qadê de têkoşîn dane. Bi kurtasî, femînîstên pêla yekem bi doktrîna mafên xwezayî ve girêdayî mane û di mafên xwezayî de li wekheviyê geriyane; aqil derxistine pêş, balê kişandine ser lêçûnên ontolojîk ên mêr û jinê (Aydemir & Özdemir, 2019).

Di qonaxa yekem de femînîst zêdetir li ser bingeha wekheviyê daxwazên xwe dianîn ziman. Li gel vê pêla duyem a femînîzmê; cihêrengiyê ji xwe re dike bingeh. Li gorî vê tevgera femînîst a pêla duyemîn ku di salên 1960'î de bipêş ket ku xwe li ser bingeha cihêrengiyên di navbera zayendan de ragirtibû, diyar dike ku ev zayendana, ne cihêrengiyên ku ji aliyê kultûra patriyarkal ve hatine hilberandin, bîlakîs cihêrengiyeke ji hêla wê ve tê tepisandin e. Ev femînîstên qonaxa duyemîn, li ser pêwendiyên hêzî yên ziman ên li ser cinsiyetan û bi taybetî di pergala sembolîk de, li ser hegemonyaya fêmberiya mêrserwer rapirsînek pêk tîne (Aydınalp, 2020).

Pêla sêyemîn a femînîzmê; di destpêka salên 1990'î de wekî bertekek li hemberî pratîk û çewtiyên di fêmberiya femînîzma pêla duyemîn de derketiye holê. Ev bertek, gelemperî nêrîna ku femînîzmê tenê bi jinên spî yên çîna elît û navîn re sînordar dike bû, heman demê de berbelavbûna tevgerên jinan li rasteyên berfireh ji xwe re kiribû armanc. Têgihiştinên hizrî yên jinên femînîst ên pêla sêyemîn, bi redkirina têgihiştina jinbûna gerdûnî ya tek celebî ku di ramînên jinên femînîzma pêla duyemîn de cih girtibû, balê dikişînin ser wê yekê ku pirsgirêkên jinan ne tenê pirsgirêkên jinên spî ne, her wiha di arasteya gerdûnî de di konteksta ferdî de pêdivî bi mijûlahiya pirsgirêkên jinan dibîne. "Femînîstên pêla sêyemîn, bi gelemperî bi polîtîkayên mîkro yên wekî; tundiya li ser jinê, zayendîtî (sexuality), hêzdarkirina jinê ve peywendî danîne. Her wiha ji aliyê naverokê ve li gorî her du pêlên din li ser

mijarên rengîn rawestiyane. Femînîzma pêla sêyemîn, bi taybetî bi mijarên ku jinan sînordar dikin û di bin zordariyê de dihêlin ve mijûl bûye û wekî hêmanên ku rê li ber guherîna civakî vedikin jî çalakgeriya ku bîreweriyê zêde dike û perwerdehiya ku li ser bingeheke berfireh belav dibe dîtine û piştgirî dane vê yekê." Tevgera femînîst a pêla sêyemîn, bi gelemperî peywendî bi mijarên wekî; zayenda civakî, çîn, nijad, etnisîte, zayendîtî, neteweperestî, siyaset û aboriyê re danîne û hewl daye ku van fenomenan bi nêrîneke femînîst bi formeke teorîk bidirûvîne (Taş, 2016).

Di dawiya veguhestîna vê serboriya femînîzmê de, ka em lê binêrin bi kurtasî, guherînên çawa li parzemînên cihê di rewşa jinên cihanê de qewimîne. Ji ber ku xulaseya li jor bi awayekî kronolojîk hatiye veguhestin, li vir jî em ê bûyerên ku li zemînên cihê qewimîne, li gor rêzê û bi pêlên tevgera femînîst re bi awayekî paralel veguhêzin.

Bi olana yekemîn pêla femînîzmê re; di 7ê Rêbendana 1792an de, Mary Wollstonecraft a îngilîz ku yekemîn berxwedana sîstematîk a femînîstî pêk anî, di pirtûka xwe ya bi navê "A Vindication of the Rights of Woman" (Parastina Mafên Jinê) de, ji bo jinan daxwaza nasîna mafên medenî û siyasî yên wekî; dayîna mafê dengdanê û mafê milkiyetê û wekheviya derfetan di perwerdeyê de kiriye. Ev daxwaz, wesfa mafên bingehîn di xwe de dihewînin û pêla yekemîn a femînîzmê li ser vê hatiye avakirin. Ev berhem, ji ber ku şahesera gotara wekheviyê ya jinê xurt kiriye, wekî yekemîn berhema bingehîn a femînîzmê tê dîtin û bi vê munesebetê yekem car bi feraseteke tevayî mafên jinê bi fêmberiyeke wekhevîparêz hatiye pêşkêşkirin. Di encama têkoşîna nîşandayî de, Meclîsa Zagonsaz di 20ê Îlona 1792an de neçar ma ku mafê hevberdan/telaqê bide jinê. Di 1793an de jî li Fransayê, ji bo ku mafên jinê bi awayekî rêxistinkirî biparêzin, Komeleya Jinên Şoreşger hatiye damezrandin (Bayraktar, 2023).

Di proseya endustrîbûnê de jinên burjiwa, di nava malên ku tenê hilberîna sînordar dikarin pêk bînin de îzole bûn, li gel vê jinên karker neçar man ku di kargehan de karên herî giran qebûl bikin. Gava ku tê sedsala 19an, ku wekî serdema kapîtalîzmê ya ku wekî hêza kar ji hundirê malê derdixe û li qada giştî belav dike tê zanîn, tevgera femînîst bi pergala aborî ya kapîtalîst û bi binyata wê ya mêrserwer re ketiye nav têkoşînê. Di kapîtalîzmê de, keda jinê ya bêbedel ji bo pêkanîna

berhevkirina sermayeyê wekî tiştekî bivênevê hatiye dîtin. Wekî ku di avahiya civaka patriyarkal de, di pergala lîberal de jî jin bi hinceta ku ne rasyonel in, ji mafê hemwelatiyê yê wekhev hatine mehrûmkirin. Di wê demê de, dirûşma jinên ku li hemberî tehakûmê dest bi berxwedanê kirine "Heke deng nedim, bacê jî nadim" bû. Jinên karker pêşî li hemberî şertên xebatê, kêmbûna mûçeyên ku digirin û li hemberî îstîsmara kedê serî rakirin, lê têkoşîna jinên burjiwa bêtir ber bi bidestxistina mafên xwe yên siyasî ve bû.

Nivîskara amerîkî Sarah Moore Grimke di sala 1838an de, bi pirtûka xwe ya bi navê Letters on the Equality of the Sexes, and the Condition of Woman (Nameyên li ser Wekheviya Zayendan û Cihê Jinê) ku weşandiye, li hemberê di nav avahiya lîberal de ji aliyê mêran ve nenaskirina mafên xwezayî yên jinan ku xwe dispêrê hebûn û mirovbûnê, berteka xwe aniye ziman û fikra ku, newekheviya fizîkî kêmkirina statûya newekhev a jinê ye û ev yek rê dide binpêkirina mafên xwezayî, berpêş kiriye. Gava ku tê sala 1848an, ji aliyê nivîskara amerîkî Elisabeth Cady Stanton, di Yekemîn Konvansiyona Mafên Jinê ya Seneca Falls de, di Danezana Hestan (Declaration of Sentiments) de, nasîna mafên wekî; li qada giştî li gel mêran dabînkirina mafên wekhev ên jinê û mafê dengdanê yê siyasî hatiye destnîşankirin. Ji aliyê din ve, di heman salê de, li Fransayê ji bo mafên siyasî, rêxistinên der-hikumetî yên wekî "Mafên Jinê" û "Komeleya Rizgariya Jinê" hatine damezrandin. Bi bandora van teşebusan, fikra di Meclîsê de ji aliyê jinê ve temsîlkirina jinê belav bûye (2023).

Di vê serdemê de li seranserê cîhanê mafê hilbijartin û hilbijêrîbûna jinê wekî qadeke pirsgirêkê hebûna xwe didomîne. Li Ewropayê tenê jinên ku mêrên wan di mewqiyên girîng de ne û jinên di avahiya hiyerarşîk de cih digirtin xwediya mafê dengdanê bûn, lê mafê dengdanê yên jinên din tune bûn. Li Amerîkayê jî, li gel jinan mafê hilbijartin û hilbijêrîbûnê yên reşikan jî tune bû. Li Amerîkayê nasîna mafê dengdanê ji bo mêrên reş, di vê mijara de lêgerîna mafan ya jinên spî û reş gur kiriye. Berî ewil jinên Kanada û Fransayê, li hemberî nêzîkatiyên nijadperest û ji bo bidestxistina mafên wekhev ketine nav têkoşîna dijber û kiryarên tund li dar xistine. Ji aliyê din ve, Konseya Jinê ya Navneteweyî (International Council of Women) ku beriya şer di sala 1888an de hatibû damezirandin û di sala 1902an de li Amerîka û Îngilîstanê Yekîtiya Mafê Dengê Jinê ya Navneteweyî (The International Woman

Suffrage Alliance) ji bo bidestxistina mafên siyasî hewldanên mezin dane. Bi tevî hemû zextên civakî, di encama têkoşînên tund ên aktîvîstên femînîst ên ku wekî sufrajêt têne binavkirin, ji bo jinan di sala 1893an de; li Zelandaya Nû, 1902an de li Avusturalyayê, 1906an de li Fînlandiyayê, 1913an de li Norwêcê û 1917an de li Îngilîstanê mafê dengdanê tê nasîn. Piştî şer, Amerîka, Rûsya, Almanya, Îtalya, Denmark, Holland û bi tevî Tirkiye, 21 welat ji bo jinan mafê dengdanê bêşert dabîn dike.

Tevgera femînîst a ku di salên 1960'î de careke din vejiya, ji Amerîkayê dest pê dike ber bi Rojavayê Ewropayê belav dibe. Di vê pêvajoyê de tevgera femînîst, rasterast ji tevgera 1968'an, a ku li hemberî rêveberiyên otorîter ên kevnare bi awayekî berfireh derketibû holê û li seranserê cîhanê bandora xwe nîşan dabû bandor wergirtiye. Piştî destkeftiyên jinan ên di warê perwerdeyê de, jinên ciwan ên başperwerdebûyî tevgera femînîst a pêla duyemîn piştî van tevgerên azadîxwaz bi awayekî eşkere derxistin pêş. Ji aliyê din ve, mafên siyasî û aborî yên di pêla yekemîn de hatibûn bidestxistin jî bûye xala destpêkê ya vê tevgerê. Feylezofa frensî Simone de Beauvoir a ku damezrînera bingeha femînîzma modern e û yek ji ramanwerên girîng ên tevgera femînîst a pêla duyemîn e, di berhema xwe ya bi navê Le Deuxième Sexe (The Second Sex- Cinsa Duyemîn) ku di sala 1949an de weşandiye û lêkolînek psîkolojîk, sosyolojîk û felsefî li ser zordariyên ku jin pê re rû bi rû dimînin dike, bingeha teorîk a femînîzma pêla duyemîn ava kiriye. Di vê serdemê de wekî hêmanên herî girîng ên tevgera femînîst; li gel qada giştî, balê dikişîne ser qada taybet jî û ew projeyên ku ji bo pêkanîna guhartinê ji malbatê bide dest pê kirin, gavên girîng ji bo azadiya zayendî ya jinê bide avêtin, û ji bo pêkanîna bi nêzîkatiya xwişkbûnê birêxistinbûn û guhartinê pêk bîne dertên pêş. Di encama têkoşîna gur a feministan de, li Fransayê di sala 1967an de, sepana venêrîna zayînê wek qanûn tê pejirandin. Feminîst li Îngilîstanê di sala 1967an de, li Amerîkayê di sala 1973an de mafê kurtajê bi dest dixin, qanûnîkirina sepana venêrîna zayînê û kurtajê li welatên din jî di salên pişt re pêl bi pêl belav dibe (Bayraktar, 2023).

Piştî vê serûvenê em careke din vegerin ser mijara xwe ya bingehîn, careke din em berê şîpê bidin rewşa jina kurd a di qada polîtîk de. Wekî li jor jî hatiye rêzkirin di encama gelek xebat û têkoşînên gur de, li welatên cuda pêşketin û destkeftiyên hevreng hatine bidestxistin. Ew mîrasa ku xwişkên jinên kurd ên li

deverên cuda yên cîhanê ji wan re diyarî kiribû, elbet wê li deverên Kurdistanê jî ji aliyê jin û xwişkên kurd ve jî bihatiba parastin û geşkirin. Nîtekim wisa jî bû. Di salên dawiya Dewleta Osmanî de bi qebûlkirina Meşrûtiyeta II. û bi destpêka peydabûna fikrên netewperwer; ramanwer û rewşenbîrên kurd jî, dest bi xebata dabînkirina bîreweriyeke kolektîf û netewper kirin.

Rewşenbîrên kurd piştî sala 1908an bi îlankirina Meşrûtiyeta Duyem, li ber bayê qismî-azad ketin û ew jî wekî rewşenbîrên netewcuda yên derdora xwe ketin nav liv û tevgereke bêhepma. Yekemîn rêya ku xwe lê girtin bêguman avakirina komel û cemiyetan, bi ser wan re jî derxistina kovar û rojnameyan bû. Wan nava berg û pelên kovar û rojnameyan ji xwe re wek qada têkoşîn, propaganda û cihê hişyariyê hilbijartibûn. Yekemîn tecrûbeya di vî warê de; di sala 1908an de avakirina Komeleya Hevkarî û Pêşveçûna Kurdan (Cemiyeta Teawûn û Teraqî ya Kurdan) bû. Piştre di sala 1912an de komaleyeke bi navê Komeleya Xwendekarên Kurd-Hêvî (Kürt Talebe-i Hêvî Cemiyeti) hate avakirin. Heta Şerê Cîhanê yê Yekemîn jî, hewla rewşenbîrên kurd li gel hebûn û parastina Dewleta Osmanî bi ser umetpariziyê re avakirina hişmendiyeke yekgirtî û kolektîf bû. Bi gotineke din; di nav pirrengî û pirnetewiya Osmanî de, bi ser rengê xwe re parastina pirrengiyê bû. Dema sal tê 1918an, piştî Şerê Cîhanê yê Yekem çerx diguhere û dewran vedigere. Rewşenbîr û welêtperwerên kurd ji nû ve, ji cihê navber dabûn xebatên xwe, dest bi xebatên xwe dikin. Xebatên Komaleya Hêvî li dar xistibûn, rihê fikra netewî vejand û ji bo têkoşîna peydakirina fikra netewî mîna çîka ewil agirê netewperweriyê pêxistibû. Rewşenbîrên kurd ku ji kadroyên kevn ên rêxistinên beriya xwe, vê carê bi rêxistineke cuda û fikrên ciyawaz derketin qada têkoşînê.

Rewşa piştî şer ji bo tevgerên cudaxwaziyê guncav bûbû, ji ber ku Şerê Cîhanê yê Yekem Kurdistan kiribû keşeyeke navneteweyî û Dewleta Osmanî hema bêje li ber belavbûnê bû. Xala 12an a 14 Xalên Wîlson hêviya Kurdistaneke xweser bilind kir, bi taybetî jî di nav hinek esîlên kurd de. Rêzikên Wîlson û belavbûna Dewleta Osmanî cesaret da kurdan û di encama van xalên navborî de rêxistineke nû ya bi navê Komaleya Bilindkirina Kurdistanê (Kurdistan Teali Cemiyeti) hate avakirin (Onen, 2018).

Bêgûman di nav ewqas liv û tevgerên ji bona avakirina welatekî serbixwe û ji bona perwerdekirin, pêşxistin û hevdemîkirina neteweke serbixwe li gel mêrên kurd peywendî bi jinên kurd jî hebû. Di destpêka salên 1900an de, bi taybetî di sala 1913an de, 'kêşeya jinan' kêşeyeke ji bo çareseriyê bi ser hêmanên mîna; pêşketina kurdan, modernbûyîna kurdan, û bilindkirina netewa kurdan ve wekî kêşeyeke civakî dikevin rojeva rewşenbîr û netewperwerên kurd (Mojab, 2013). Lewre di daxuyaniyên komel û rêxistinên ewil de jî ev hewcedarî û perspektîf di gelek gotar û nivîsên hatine belavkirin de jî xwe dide der. Di vê xalê de em ji kovara Rojî Kurd, gotara bi serenavê "Jinên Kurd û Pirsgirêka Jinê" bi îmzeya Erganî Madenlî Y. C. hatiye weşandin, ji rojnameya Serbestî, nivîsa bi serenavê Kurd û Kurdistan: Jinên Kurd û herî dawî jî ji kovara Jînê, nivîsa bi serenavê Xanima Kurd (Kürt Hanımı) bi îmzeya Memdûh Selîm Begî hatiye weşandin wekî referansên gewre dikarin birêz bikin.

Di sala 1919an de jî Komaleya Bilindkirina Kurdistanê li vê tradîsyonê xwedî derket û gaveke din bi pêş ve bir. Wekî şaxeke Komaleyê saziyek nû bi navê "Cemîyeta Tealîya Jinên Kurd" di sala 1919an de li Stembolê tê vekirin ku yekemîn komaleya birêxistinkirî a jinên kurd e (Alakom, 2019). Armanca komaleyê bi vî awayî hatiye beyankirin: "Pêkanîna pêşxistina jinên kurd bi zihniyeteke hevdemî; pêkanîna esasên jiyana malbatî û zêdekirina hilberîna wê ya di jiyana sosyal de; ji ber tehcir û kuştinê, gelek zarokên kurd sêwî û jinên wan jî jinebî mane, divê xweyîtî û alîkarîya wan bête kirin û karibin wan ji vê sefaletê xelas bikin" (Veroj, 2017). Li gorî agahiyên li ber dest, mixabin Komale netemendirêj e. Lewre hinek kes dibêjin 3 meh piştî avabûnê hatiye girtin, hinek kes jî dibêjin 6 meh piştî avabûnê hatiye girtin (Alakom, 2019).

Herwiha, ew pêlên li piştî okyanûs û parzemînên cuda ku bi xebat û keda xwişkên jinên kurd ên cîhanê xwe li qeraxê wekheviyê dixistin xwe gihandibû nav axa Kurdistana bê derya û av. Piştî perçebûna dewleta Osmanî, bi destpêka avabûna netew-dewletan heyamek nû ji bo jinên kurd dest pê dike. Bi taybetî li perçeya Tirkiyeyê polîtîkayên ji hêla serweran ve tên meşandin ji bo pêşketin û birêxistinbûna tevgerên jinê bûne astengiyên herî berbiçav. Wekî ku li jor jî hatibû destnîşankirin; yekemîn komaleya birêxistinkirî a jinên kurd bi navê "Cemîyeta Tealîya Jinên Kurd" di sala 1919an de li Stembolê hatibû vekirin. Piştî vebûna vê

komaleyê 58 sal şûnda di sala 1977an de, li Diyarbekirê Komaleyeke bi navê Komaleya Jinên Şoreşger- Demokrat vedibe. Ev rewş jî li ber çavan radixîne ku li Tirkiyeyê di heyameke dirêj de jinên kurd ji tecrûbeya komelbûnê bêpar manin. Heman demê de ev rewş, diyardeya domdariya zext û qedexeyên li welat e jî. (Kürt tarihi dergisi, 2020, 39)

Di dawiya salên 1970an û destpêka salên 1980an de, bi geşbûna tevger û rêxistinên netewî û geşbûna gotarên femînîst jinan derfet dîtin ku veguhezin qadên giştî û berbiçav bibin. Di destpêka van salên navborî de rêxistinên xweser ên jinan û gotarên femînîst derketin holê û bi awayek geş xwe birêxistin kirin. Bi taybetî em vê li ser tevgera sereke a kurdan (Partiya Karkerên Kurdistan-PKK) ku zêdetir karibûye birêxistin bibe de dibînin. Piştî salên nodî tevger û rêxistinên kurd zêdetir di gotar û daxuyaniyên xwe de cih dan jinan. Vê jî, derfet da ku jin di bin siya wan tevgeran de xwe birêxistin bikin û di warê sazûmaniyê de gavên xurt biavêjin. (Açık, 2021)

Di vê xalê de, bi taybetî giringiya ku tevgera siyasî ya kurd ji dawiya salên 1980'î ve daye azadiya jinê, di sala 1987an de wekî şaxeke PKK'ê bi damezrandina Yekîtiya Jinên Welatparêz ên Kurdistanê (YJWK) zêdetir derketiye pêş. Di sala 1995'an de Yekîtiya Jinên Azad ên Kurdistanê (YJAK) ku tenê ji şervanên jin pêk tê hatiye damezrandin. Bêguman yek ji armancên damezrandina van rêxistinan piştgirîdayîna têkoşîna neteweyî ya kurd be, ya din jî îspatkirina fikara ku wekheviya mêr û jinê ya bi ser heman awayê ve beşdariya têkoşînê ye. Bi taybetî di salên 1990'î de êrîşên xwekujiyê û çalakiyên xweşewitandinê yên ku ji aliyê milîtanên jin ve hatine organîzekirin (û cara ewilîn in), wekî gaveke girîng a ku jinên kurd di PKK'ê de cih digirin û bi riya milîtanbûnê îspat dikin ku ew bi mêran re wekhev in û di têkoşîna neteweyî de jî xwedîsoz in, tê qebûlkirin. Di vê çarçoveyê de di sala 1999'an de di nava PKK'ê de Partiya Jinên Karker ên Kurdistanê (PJJK) tê damezrandin, paşê navê Partiya Jinên Azad ên Kurdistanê (PAJK) werdigre (Arakon, 2015).

Bi saya vê rewşê, jinên kurd zêdetir di qadên giştî de bi sazî û dezgehên temsîlî karibûne kar û xebatan li dar bixin. Lê ev rewş her çiqas di warê sazûmaniyê û têkoşînê de bergehek fireh ji bo jinê avakirî be jî, di heman demê de bi xwe re pirsgirêkên nû jî welidandiye ku; rêxistin û tevgerên ji hêla jinên kurd ve hatine

avakirin, hebûna xwe di bin siya rêxistinên siyasî de parastine. Pratîk û pêkanîna armanca wan her dem dualiteyek di xwe de afirandiye. Jinên di wan xebatan de cih girtine, berê li ser pêkanîna esasên wan rêxistinan, piştre jî li ser azadiya jinê xebitîne (Mojab, 2013). Bi vê awayê tê dîtin ku enerjiya jinê hatiye perçekirin û jinê, rasterast hêz û motîvasyona xwe nekaribûye bide têkoşîna bidestxistina mafên xwe.

BEŞA DUYEM

A. JI SERDEMA PIŞTÎ ÎLANKIRINA MEŞRÛTIYETA II. HETA QONAXA PIŞTÎ HAWARÊ (1908-1950)

Metnên ji kovarên bi navê "Rojî Kurd, Jîn, Hawar û Rojnameya Serbestiyê" hatine hilbijartin, di bin banê vê beşê de bi ser metodolojiya navborî re hatine vekolîn. Ji ber ku di beşa destpêkê û di beşa yekemîn de bi berfirehî li ser rewşa jina kurd û kurtedîroka weşnageriya kurd hatiye rawestîn, di vê beşê de wê rasterast li ser analîza metnên hatine hilbijartin were sekinandin.

1. ROJÎ KURD (1913)

Roji Kurd bi zimanê kurdî-tirkî hatîye weşandin û li ser hev çar jimar hatine belavkirin. Jimara yekemîn a kovara Roji Kurd, di 6ê Hezîrana 1913an de hatîye çapkirin, li ser bergê kovarê hatîye nivîsandin ku xwedî îmtiyaz û midurê mesûl Ebdulkerîm Efendî yê Silêmanî ye. Li ser bergê jimara pêşîn wêneyê serdar û navdarê kurd Selehedînê Eyubî hatîye çapkirin. Jimara duyemîn, di 6ê Temûza 1913an de hatîye çapkirin û li ser bergê wê wêneyê Kerîm Xanê Zend hatîye belavkirin ů jimara sisê jî di 1ê Tebaxa 1913an de hatîye çapkirin û li ser bergê wê jî wêneyê Hûsên Kenan Paşa hatîye çapkirin. Jimara çaran jî, di 30yê Tebaxa 1913an de hatîye çapkirin û li bin wêneyê li ser bergê wê weha hatîye nivisandin: "Kürdistan'ın Müstahkem Şehirlerinden Erzrum Şehri/ Bajarê Mûstahkem ê Kurdistanê Erzerom." (Veroj, 2021)

Ev metna ku ji bo tehlîlê hatiye hilbijartin, di hejmara 4an a di sala 1913an de, bi sernava "Jinên Kurd û Pirsgirêka Jinê" bi îmzeya Erganî Madenlî Y. C. hatiye belavkirin.

JINÊN KURD Û PIRSGIRÊKA JINÊ

Di nav Kurdan de "Mijara Jinê" di vê navberê de, pirsgirêkeke girîng e ku temamê rojavayê, hinekî jî rojhilatê, çapemenî, zanyarên sosyolojiyê û bi kurtasî her kesî bi awayekî tam meşqûl dike heye: "Pirsgirêka jinê" heta hin ramanwer hene ku ji vê serdemê re dibêjin "Sedsala Jinê". Li Bakurê Ewropayê û Amerîkayê, cîhana jinê li saheya geşbûnê gavekî pir mezin û dilxweşker davêje. Ew, nîvê hemû zanîngeh û dibistanan dagir dikin, di jiyana sosyal de bi mêran re pêşbaziyê dikin û ji bo bilindbûna zêdetir jî têkoşîna xwe didomînin. Jinên Rojava, Ewropaya Navîn û Amerîkayê jî xwişkên xwe yên Bakurî dişopînin û teqlîd dikin. Ew ji bo bidestxistina mafê jiyanê û dahatûya xwe, mafên xwe yên siyasî û civakî têdikoşin û şer dikin. Ev tevgera jinan a Rojava û Bakurê ku bi serkeftî û ronî ye, di dawiyê de li rojhilatê, li Asyayê jî bandora xwe nîşan daye; jina japonî ji bo bidestxistina mafên xwe yên rewa dixebitî û bi ser jî dikeve. Di van demên dawî de, her çendî bi awayekî qels be jî, di nav cîhana Osmanî de jî di vî warî de tevgereke tê dîtin. Bila ev tevger û ev têkoşîn bi serkeftî berdewam bikin, em werin ser mijara xwe. Mijara me li cem kurdan pirsgirêka jinê ye. Ev mijar hem girîng e, hem jî zehmet e. Pêdivî bi lêkolîneke ciddî û nîqaşê heye. Bi rastî jî, em ne di wê wêrekiyê de ne ku em vê pirsgirêkê bi qaîdeyên hişk çareser bikin. Armanca me ew e ku em, wekî her kesî, bala ciwanan bikişînin ser pirsgirêka jinê, ku ji bo kurdan jî pirsgirêkeke jiyanî ye, û bi vî awayî em behsa pirsgirêka malbatê jî bikin. Em dikarin bibêjin ku gotina hema hema di tevahiya cîhana Osmanî de çi ji aliyê madî û çi ji aliyê manewî ve rewşa jinê di rewşeke reştarî de ye, dê derî rastiyê be. Em texmîn dikin ku mêrên me bi temamî di nav nezaniyeke kûr de asê mane. Jinên me jî, ji ber quretîya nezaniyê ya mêrên me, hem nezan in û hem jî belengaz in.

Cihê jinê û girîngiya wê bi vî rengî nehat fêmkirin. Malbat, li şûna ku bingeheke paqij û zexm bin, bûn çavkaniya hemû bêexlaqî û tevliheviyên ferdî û civakî. Malbata kurd jî, bi awayekî xwezayî, ji vê nexweşiyê bandor wergirtiye û zirar dîtiye. Mîna her kesî, ew jî bivênevê hewcedarê dermanê vê nexweşiyê ye. Halêhazir, di nav kurdan de hin bawerî û têgihiştinên derbarê cihê jinê de, çi di malbatê de û çi di jiyana derve de hene ku dê alîkariya çareserkirina nexweşiya jinê û malbatê bi awayekî zûtir û hêsantir bikin. Wekî di pirsgirêka tîpan de, di sererastkirina pirsgirêka jinê de jî, kurd dê berê xwe bidin hêsaniyeke taybet. Niha

em vê yekê îzeh bikin: Li Kurdistanê, ji navendên bajaran ên ku xwezaya xwe winda kirine cuda, bi piranî di jiyana gundiyan de, bi hemû (prmitivity)hoveberîtiya xwe ji cihê jinê razî ne. Di nav kurdan de jin, pir bi rûmet tê hesibandin. Jin hema bêje wekî aliyekî bêguneh tê dîtin, û her kes hurmetkirina jinê wekî erkekê dibîne. Gund û eşîrên ku li hemberî hev in, bi rojan bi hev re şer dikin û guleyan li hev dibarînin, lê jin di qada şer de bi serbestî tevdigerin. Ew, têkiliyên mecbûrî yên di navbera her du aliyan de peyda dikin. Êrîşkirina li ser jina aliyê hember, ti kes bi bîra xwe nayîne. Revandina keçekê bi zorê ji eşîreke din, kîneke pir xirab û dijminatiyê derdixe, û bi salan tolhildan berdewam dike. Mirov dikare bêje ku piraniya dijminatî û nakokiyên di navbera gund û eşîran de ji ber pirsgirêka revandina keçan derdikevin.

Eger di herêmekê de êrîşeke piçûk li ser jineke gundî bê kirin, hemû gelê wî gundî diçe tevgerê û ji bo parastina mafê wê jinê têkoşîn dike. Ji cihên wisa ku mêr jê ditirsin tê re derbas bibin, ji kolanên tarî yên ku diz xwe lê vedişêrin, jin bi tena serê xwe, bê tirs derbas dibin. Ev yek nîşan dide ku di civaka kurdan de, dîsa jî li hember hukumraniya nezaniyê, jin bi hurmeteke mezin têne pêşwazîkirin. Li gund û bajarokên kurdan tesetûr jî di asteke maqûl de ye; ji bilî xwepêçîna ku dîn û aqil emir dike, zêdetir nîne. Jinên kurd tu carî di nav çewalên stûr û westîner de nehatine rapêçan; ew bi awayekî azad digerin, ji tu êreşekî jî natirsin, jixwe îhtîmala tecavûzê jî tune ye. Di jiyana olî de jî cihê jina kurd, li Kurdistanê nîvê karan ji aliyê jinan ve tê kirin. Jin, digel erkên malbatê yên din, li zeviyan, li baxçeyan bi mêrê xwe re bê navber dixebite û karên dijwar û zehmet bi cih tîne.

Jina kurd ji bo firotina genimê xwe, darên xwe, bi saetan rê bi tena serê xwe û bi peyatî dimeşin, tê bajêr, bi azadî bazariyê dike, malên xwe difiroşe, karên xwe bi rêk û pêk dike û dîsa bi azadî vedigere gundê xwe. Ev yek jî tê wê wateyê ku di malbata kurd de jin, di jiyana sosyal de nêzîkî asta mêran dixebite. Halê jinên ku rihê wan di bin bandora efsaneyên cin û perî û xurafeyên deraqil de ne, bi halê jina gundî ya kurd re qet nayê berawirdkirin. Tirs û panîka zêde, ku hema bêje taybetmendiyeke jinên me ye, di jina kurd de nîspeten pir kêm e. Jina kurd bi rastî cahil e, bê perwerde ye, lê xwedî karektereke hêzdar e. Waye ev prensîb û pêşniyarên ku me îzeh kirin pir bi qîmet in; ev adet, ev nêrîn bi hêsanî dikarin were hevdemîkirin. Tê wê wateyê ku beşek ji prensîbên bingehîn hatine amadekirin, a ku noqsan e perwerde û ilma bi demê û serdemê re hemhal e. Eger ev jî ji jina kurd re

bên dayîn, yanî karektera wê ya bihêz bi ilm û terbiyeyeke maqûl were xemilandin, di civaka kurdan de çareserkirina pirsgirêka jinê gelekî hêsan dibe. Di nav kurdan de di binyata malbatî de şêweyê zewacê, rewşa jinê a li hemberê mêrî, ji gelek aliyên wê ve xirab û nebaş e, di cih de pêdivî bi islehkirinê dibîne. Ew esasên ku me li jor destnîşan kirin, dê dermankirina vê nexweşiyê hêsan û bileztir bike. Islehkirina jinên kurd ên bajarî, ku raman û karekterên xwe yê resen wenda kirine, dê bêtir bi zehmetî û bi xerckirina qeweteke zêdetir wê pêk were. Ciwanên kurd divê fêm bikin ku pirsgirêka jin û malbatê, pirsgirêkeke manûnemanê ye. Berî her tiştî kurdbûyîn, divê li çareyên bilindkirina jinê binêrin. Divê zanibin ku ji bo civakan, dayikên xwedî hişmendî bi qasî zewadê pêwîst in. "Jinên miletekî, pîvana asta pêşketina wî miletî ne." Asta pêşketina mirovan her dem bi asta jinên wan re têkildar e, divê ev prensîb her dem, her deqîqe li ber çavan bê girtin (Madenli, 1913: 185-186).

Erganî Madenlî Y.C.

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

Ev metin, di sala 1913an de di kovara Rojî Kurd de ji aliyê Erganî Madenlî ve hatiye nivîsîn û li ser meseleya di civaka kurdan de "meseleya jinê" disekine.

1.1. Netewperweriya Kurd

1.1.1. Avakariya Nasnameya Kurd

Metin, statûya jinan wek hêmaya pîleya "pêşveçûna" netewa kurd pêşkeş dike û bi ser vê re jî di wê armancê de ye ku ji Împaratoriya Osmanî cudatir nasnameya kurd xurt bike. Îfadeya *"Jinên miletekî, pîvana asta pêşketina wî miletî ne",* bi awayekî eşkere vê vîzyona netewperwer di xwe de dide der.

1.2. Binyada Sosyo-Kulturî ya Civaka Kurd

1.2.1. Cudakariya di navbera Gund û Bajaran de

Metin, civaka kurd bi gelemperî di bingeha saziyeke gundî û eşîrî de teswîr dike. Li gundan cihê rêzdar ê jinê, wek perçeyek pergala eşîrî dikare were dîtin. Lê belê angaşta jinên bajarî *"karekterên xwe wenda kirine"*, wekî rexneyeke li ser guherînên kulturî yên modernbûnê bi xwe re anî ne, dikare were xwendin.

1.3. Perwerdehî û Reformên Civakî

1.3.1. Rola Navendî ya Perwerdehiyê

Metin, li ber rexneya xwe ya jin "nezan" in, perwerdeyê wek mifteya nûjenbûnê derdixe pêş. Îfadeya *"eger jinên kurd bi ilm û terbiyeyeke maqûl were xemilandin"* bendewariya bi rêya perwerdeyê veguherîna civakî di xwe de dide der.

1.3.2. Malbat û Civak

Metin, malbatê wek *"çavkaniya bêexlaqiyên civakî"* dibîne, diparêze ku perwerdeya jinan, ji bo binyateke bi tendûrist a malbatê û ji bo civakeke hêzdar tişta elzem e. Rexneya li ser pratîkên kevnerû ên wekî revandina keçikan, destnîşan dike ku hinek hêlên pergala eşîrî bi îdeala civaka modern re di nav dudiliyê de ne.

1.3.3. Zayenda Civakî û Malbat

Metin, meseleya jinê rasterast bi binyata malbatê re girê dide. Angaşta malbat "çavkaniya bêexlaqiyên civakî" ye, temayeke xurt a gotarên reformîst ên serdemê ye. Bilindkirina statûya jinan û pêşvebirina perwerdehiya jinan, ji bo binyateke bi tendûrist a malbatê her wiha ji bo civakeke hêzdar elzem tê dîtin.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Ziman û Şêwaz

2.1.1. Zimanê Mobîlîze û Hestewer

Metin, meseleya jinan wek mijareke "man û neman" ê pênase dike û xwîneran (bi taybetî ciwanên kurd) vedixwîne tevgerînê. Îfadeyên mîna *"Pêdivî bi lêkolîneke ciddî û nîqaşê heye"* amadehî ji bo avakirina zemîneke entelektûel pêşniyar dike, lê di heman demê de bi îfadeyeke hişk ku *"mêrên me bi temamî di nav nezaniyeke kûr de asê mane"* rengekî rexneyî di xwe de dide der. Ev hem bangewaziya rexneyê, hem jî ya reformê di xwe de dihewîne.

2.1.2. Zimanê Berawirdî

Metin, civaka kurdan bi civakên cihêreng ên mîna Bakurê Ewropayê û Amerîkayê, Japonya, Rojava û Osmanî re muqayese dike. Ev muqayeseyên tên kirin, îma dike ku civaka kurd di meseleya jinê de li paş maye, heman demê de bi pêşçavkirina cihê jina kurd a "rêzdar" xwe-nirxîneke pêk tîne.

2.1.3. Dulibiyên Erênî û Neyinî

Jin, di metnê de hem bi awayê "nezan û belengaz" hem jî bi awayê "rêzdar, jîr û xwedî karektereke zexm" hatiye teswîrkirin. Ev jî potansiyela jina kurd derdixe pêş û di heman demê de balê dikşîne ser kêmasiyên mewcûd.

2.2. Çarçoveya Îdeolojîk

2.2.1. Gotara Nûjenbûnê

Metin, bi rêya perwerde û mafên civakî pêşveçûna jinan, wek merca pêşîn a civakeke modern dibîne. Îfadeya "sedsala jinê", îlham ji tevgerên femînîst ên li Rojava werdigre, heman demê de diparêze ku divê civaka kurd jî beşdarî vê peşveçûna global bibe.

2.2.2. Perspektîfa Netewperwer

Têkiliya meseleya jinê û avakirina nasnameya kurd bi hev re tên danîn. Îfadeya *"Jinên miletekî, pîvana asta pêşketina wî miletî ne",* statûya jinan wek hêmaya pîleya pêşveçûna netewa kurd bi cih dike. Ev jî bi rêya cihêbûna ji Osmanî, hewla civaka kurd a hêzdarkirina nasnameya xwe di xwe de dide der.

2.2.3. Lihevanîna Kevneşopî û Nûjeniyê:

Metin, rolên jinê yên kevneşopiyî (rêzdarî, maqûliya tesetûrê) dipesîne, heman demê de pêşniyariya girêdana wan a bi perwerdeya modern re tîne ziman. Vê jî, wek hewleke avakirina hevsengiyek di navbera nirxên kevnerû û nûjen de derpêş dike.

2.3. Stratejiyên Gotarî û Girseya di Hedefê de

2.3.1. Girseya di Hedefê de

Ciwanên Kurd: Metin, xîtabê "ciwanên kurd" dike û bi vê awayê wan wek pêşengê reforma civakî bi cih dike. Ev, di tevgerên netewperwer ên serdemê de hewla balkişandina li ser rola ciwanan ya pêşengtiyê ye.

2.3.2. Hevsengiya Pejnî û Mentiqî

Metin, bi gotara jin di rewşeke "dilpêşewat" de ne empatiyê hişyar dike, bi argûmanên rasyonel ên wek pêdiviya perwerdehiyê zemîneke niqaşî ya entelektûel înşa dike. Ev hevsengî, di wê armancê de ye ku xwîner hem ji aliyê pejnî ve hem jî ji aliyê mentiqî ve di binê bandora xwe de bihêle.

2.3.3. Temsîliyetên Erênî û Neyînî

Jina kurd, ji aliyekî ve wek “nezan” tê rexnekirin, ji aliyê din ve bi wesfên wekî “mesûm”, “rêzdar” û “jîr” tê pîrozkirin. Ev hem balê dikişîne ser pirsgirêkên mewcûd, hem jî balê dikişîne ser potansiyela civaka kurd ku, jixwebaweriyê ava dike.

2.4. Avakariya Hêz û Nasnameyê

Metin, li ber parastina hêzdarkirina di civakê de cihê jinan, di heman demê de armanca xurtkirina nasnameya kurd jî di xwe de dihewîne. Bi pênasekirina jinan a wek “nezan” lê “xwedî karektereke zexm” balê dikişîne ser potansiyela wan, heman demê de “serbilindiya nezaniyê” ya mêran tê rexnekirin. “Gera bi serbestî” ya jina kurd û cihê wê yê “rêzdar” wek karektereke xweser a civaka kurdan be tên pêşkeşkirin. Ev jî, wekî stratejiyeke gotarî ku ji bo bi awayê erênî avakirina nasnameya kurd dikare were dîtin.

3.Encam

Metna bi navê “Di nav Kurdan de Meseleya Jinê”, di sala 1913’an de di çarçoveya Osmanî de, di civaka kurd de cihê jinan ji perspektîfên modernbûn û neteweperweriyê ve vedikole. Ji aliyê gotarî ve, rewşa jinan a mewcûd a “nezan” tê rexne kirin, di heman demê de bi pêşniyara bi perwerdeya modern yekkirina taybetmendiyên wan ên kevneşopî yên “rêzdar” û “kedkar” vîzyoneke hêvîdar pêşkêş dike. Ji aliyê tehlîla naveroka dîrokî ve, metin, di dema hilweşîna Osmaniyan de nîşaneya hewldanên ronakbîrên kurd ên ji bo avakirina nasnameyê û modernbûnê ye. Meseleya jinê ne tenê wekî wekheviya zayendî ya civakî, herwiha wekî amûreke ji bo pêşketina giştî ya neteweya kurd tê dîtin. Ev metin, mînakeke xurt a hewldanên ronakbîrên kurd ên ji bo pêşxistina gotareke reformîst hem di çarçoveya herêmî, hem jî ya cîhanî ye.

2. SERBESTÎ (1908)

Serbestî yek ji rojnameya herî temen dirêj a salên dawî yên Dewleta Osmanî ye. Xwedî û midurê mesûl ê Serbestiyê Mewlanzade Rifat e. Neşriyata rojnameya Serbestî, roja 3’yê Teşrîna Sanî ya 1324 (16’yê Sermaweza 1908) dest pê dike. (Veroj, 2017) Rojnameya Serbestî bi qasê ku tê zanîn û li gor xebatên li ber dest bi

tevî hev 770'ê hejmar hatine weşîn. (Issı, 2010) Nivîsên rojnameyê li gor babetên xwe, di bin sernivîsên cur bi cur de hatine belavkirin. Di bin sernivîsa "Siyasiyê" de maqaleyên siyasiyên li ser rojevê hatine belavkirin. Di bin sernivîsa "Hududû daxiliye" û "Hududî Xariciye" de jî, nûçeyên hundir û derve hatine nivîsandin. Bi piranî di rûpelên dawî de jî nameyên xwendevanan hatine belavkirin. (Veroj, 2017)

Ev metna ku ji bo tehlîlê hatiye hilbijartin, di hejmara 479an a di 28'ê Avrêla 1919an de bi sernavê "Kurd û Kurdistan; Jinên Kurd" hatiye belavkirin.

KURD Û KURDISTAN: JINÊN KURD

Hemwelatiyên ku hejmara rojnameya me ya do xwendine, bi mizgîna Cemiyeta Tealiya Jinên Kurd (Komaleya Pêşxistina Jinên Kurd), bi dilxweşiyeke kûr û bêserûber hestewar bûne. Ji bo pêkanîna rizgarî û dahatûya Kurdistana me ya ezîz û xoşewist, xîret û xebateke zêde pêwîst e. Di vê xebatê de îştiraqkirin û beşdarbûna jinên me yên esîl, bêguman zewqeke bilind a însanî û wijdanî dide mirov. Ji alîyê her kesî ve malûm e ku ji bo pêşketin û gihandina milletan, tesîreke kûr û gewre ya jinan heye. Di welatê me de, delîlên muxtelîf hene û didin dîyarkirin ku ev heqîqeta esasî bi şayesteyî hatîye îdrakkirin. Çawa ku jinên kurd di malbatê de xwedîyê rêzgirtin û mewqîyek bijarte ne, dayikên kurd jî di navenda jîyana neteweyî de cî digrin û ji alîyê mêrên kurd ve bi hîsseke bilind û pîroz têne dîtin. Li Kurdistanê jin, endameke rêzdar a malbatê ye. Mêrên kurd îhtîmameke mezin didin jinan û baş dizanin, destên ku hêlekanê bihejînin wê hukmê cîhanê jî bikin.

Tevî ku di nav eşîran de jî, jin di nav refeh û aramiyekê de dijî. Her ku li Kurdistanê rewş wisa ye, bi taybetî li welatên medenî, delîlên ciyawaz hene ku jin di jiyana civakî, heta di asta siyasî de jî serkeftinên mezin bidest xistine. Îro li Ewropa û Amerîkayê bi hezaran jinên diktor û mamoste, bêrawest ji bo peydakirina hewcedariyên miletên xwe dixebitin. Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, erkên mêrên ku ji bo parastina welat çûne eniya şer, jinan wergirtine ser xwe, û pê re hewl dane hewcedariyên welatên xwe peyda bikin. Li Ewropayê, serkeftina jinê ya di van însiyatîfan de, di encama zehmetiyên derasayî û bi fedakariyên mezin pêk hatiye. Çimkî Îsewiyet, jinê ji aliyê mafên hiqûqî ve, bizêdehî sînordar dike.

Mînak; jineke xiristiyan dema ku zewicî, nikare dest bide ser mal û milakan û erseya xwe bifiroşe. Bi kurtasî mafê milkiyetê di cih de derbasî mêrê wê dibe. Îro li Fransayê û Îngilîstanê, bi tevî hemû pêşveçûnên hevdem jî, sererastkirina temamê hukmên hiqûqî û olî ne pêkan bûye. Halbûkî di dînê me yê pîroz de ku ji fikrên ronî yên azadiyê welidiye, jin xwediyê cihekî payebilind e.

Wek mînak, mafê milkiyetê yê jineke, bi zewacê re tu carî wenda nabe. Jin, bi awayekî teqez xwediya mafê milkiyetê ye. Xwedê Teala, fêrbûna ilmê li ser mêr û jinê bi heman awayî ferz kiriye. Heta di hedîseke pîroz de, Pêxemberê me diyar kiriye ku "Bihuşt di binê nigên dayikan de ye." Puxteya vê meseleya girîng ku dikare bibe mijara bi cildan pirtûkan, di van xalên ku min diyar kir de, dibe ku carinan bê paşguhkirin.

Şefqeta neteweyî ya jinê, bi taybetî ya jina kurd, wê birînên bêhejmar ên Kurdistanê bipêçe û ji derdên wê re bibe derman. Di heman demê de ev teşebis, wê bide nîşandan ku di hizûra cîhana medeniyetê de, kurd xwedî fikrên hevdem in.

Em saziyên cemiyetê pîroz dikin û serkeftina wan dixwazin. (Veroj, 2017)

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

Tehlîla naveroka dîrokî, çarçoveya sosyo-polîtîk û kulturî ya sala 1919 ku metin lê hatiyê nivisîn, bi ser referansên navmetnê re dinirxîne û eşkere dike ka metin bersiva kîjan mercên heyî dide û fonksiyona metnê ya civakî li ber çavan radixîne. Metin, di dawiya serdema Osmanî de, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, di çarçoveya geşbûna hişmendiya neteweyî ya kurd û pêşçavbûna rêxistinên jinan de hatiye nivîsîn.

1.1. Têkoşîna Neteweyî ya Kurd û Rola Jinan

Metin, mizgîna avabûna Cemîyeta Tealîya Jinên Kurd (Komaleya Pêşxistina Jinên Kurd) di çarçoveya têkoşîna *"pêkanîna rizgarî û dahatûya Kurdistana me ya ezîz û xoşewist"*de pîroz dike. Ev daxuyanî, di serdema belavbûna Împaratoriya Osmanî ya sala 1919an de, diyardeya serdema lêgerîna kurdan ya bidestxistina nasnameya neteweyî û xweseriyê di xwe de dide der. Avabûna komaleyê, bi îfadeya "*di vê xebatê de îştiraqkirin û beşdarbûna jinên me yên esîl, bêguman zewqeke bilind a însanî û wijdanî dide mirov",* têkoşînê de potansiyela hilgirtina roleke aktîf a jinan

derdixe pêş. Ev yek, di serdema piştî şer a kaotîk de, di warê ji nû ve avakirina civakê û hevgirtinê de giringiya jinan derpêş dike. Tewra metnê ya hestewar, di îfadeya *"bi dilxweşiyeke kûr û bêserûber hestewar bûne"* de, şahî û heviya civakê ya di vê teşebisê de bi awayekî navend-mirovî vediguhêze.

1.2. Rola Civakî ya Jinan û Nujenbûn

Metin, rolên civakî yên jinan, bi daxuyaniya "*ji alîyê her kesî ve malûm e ku ji bo pêşketin û gihandina milletan, tesîreke kûr û gewre ya jinan heye"* pîroz dike. Ev, di Dewleta Osmanî de sala 1919an, wekî serdema geşbûna hewlên nûjenbûnê derpêş dike; beşdariya civakî û perwerdehiya jinan, wekî nîşaneya civakeke modern dihate dîtin. Damezrana Cemîyeta Tealîya Jinên Kurd, di pêvajoya vê nûjenbûnê de wek diyardeyeke xweser a aîdê civaka kurd dertê pêş. Îfadeya metnê ya *"şefqeta neteweyî ya jinê, bi taybetî ya jina kurd, wê birînên bêhejmar ên Kurdistanê bipêçe û ji derdên wê re bibe derman",* derpêş dike ku jin ne tenê di nav malbatê de, heman demê de di têkoşîna neteweyî de jî wek failên aktîf tên dîtin. Ev, di serdema piştî şer de ji bo dermankirina birînên civakê û dahatûyeke hêvîdar, rola jinan a navendî derdixe pêş.

1.3. Berawirdiya bi Rojava re û Rola Îslamê

Metin, pozisyona jina kurd a civakî, bi ser muqayeseya jinên li Rojava re dinirxîne: "*Îro li Ewropa û Amerîkayê bi hezaran jinên diktor û mamoste, bêrawest ji bo peydakirina hewcedariyên miletên xwe dixebitin."* Ev diyarde, bi mînakdana rolên jinên ku li Rojava di pîşeyên modern de dixebitin, îma dike ku civaka kurd jî xwediyê potansiyela modernbûna hevşib e. Lê, metin, diyar dike ku jinên li Rojava marûzê sînordariyên hiqûqî tên: "*Îsewiyet, jinê ji aliyê mafên hiqûqî ve, bizêdehî sînordar dike. Mînak; jineke xiristiyan dema ku zewicî, nikare dest bide ser mal û milakan û erseya xwe bifîroşe."* Li hemberî vê yêkî, diparêze ku Îslam zêdetir mafan dide jinê: "*Halbûkî di dînê me yê pîroz, ku ji fikrên ronî yên azadiyê welidiye de, jin xwediyê cihekî payebilind e."* Ev berawirdkirin, diyar dike ku civaka kurd di pêvajoya moderbûnê de wê bi parastina nasname û ola xwe jî bikaribe bi pêş ve biçe. Diyardeyên wekî "*mafê milkiyetê yê jineke, bi zewacê re tu carî wenda nabe"* û "*Xwedê Teala, fêrbûna ilmê li ser mêr û jinê bi heman awayî ferz kiriye"*, mafên ku Îslamiyetê dane jinê derdixe pêş û di navbera nirxên kevneşopîyî û nûjen de pireyeke ava dike.

1.4. Di Civaka Kurdan de Cihê Jinê yê Kevneşopiyî

Metin, pozisyona civakî ya jina kurd, bi îfadeyên "*Li Kurdistanê jin, endameke rêzdar a malbatê ye"* û "*Tevî ku di nav eşîran de jî, jin di nav refeh û aramiyekê de dijî"* payebilind dike. Ev yek, di binyata kevneşopî ya civaka kurd de rola bi rûmet a jinê ya di nav malbatê de nîşan dide. Diyardeya "*mêrên kurd îhtîmameke mezin didin jinan û baş dizanin, destên ku hêlekanê bihejînin wê hukmê cîhanê jî bikin"*, rolên kevnerû yên jinê ku dêtî û hevjîniyê, bi potansiyela pêşengtiya civakî re dike yek. Ev yek, yanî avabûna komaleyê, hewla têkelkirina rolên kevnerû yên jinê û têkoşîna neteweyî ya modern di xwe de dide der. Îfadeya metnê ya "*dayikên kurd jî di navenda jîyana neteweyî de cî digrin û ji alîyê mêrên kurd ve bi hîsseke bilind û pîroz têne dîtin"*, nirxa jinê ya di civakê de di çarçoveyeke hestewer û exlaqî de pêşkeş dike.

2. Tehlîla Gotarî

Metin, li gel armanca xwe ya pîrozkirina rolên civakî û netewî yên jinên kurd, gotereke yekkirina nasnameya neteweyî ya kurd, îdeala nûjenbûnê û nirxên dînî ava dike. Ev gotar, bi hasasiyetekê navend-mirovî, xurtkirina hest û hêviyên civakê armanc dike.

2.1. Wek Remza Neteweyî Bicihkirin û Muqedeskirina Jinê

Metin, ji bo jina kurd gotareke pîrozwer bi kar tîne: "*Dayikên kurd jî di navenda jîyana neteweyî de cî digrin û ji alîyê mêrên kurd ve bi hîsseke bilind û pîroz têne dîtin."* Ev daxuyanî, di çarçoveyeke exlaqî û dînî de jinê wek figûreke pîroz bi cih dike û pîroziya rola dêtiyê ya di Îslamê de bibîr tîne: *"Bihuşt di binê nigên dayikan de ye."* Ev gotar, li gel hêzdarkirina nirxa civakî ya jinê, wê ji aktoreke şexsî wêdetir, ji bo malbat û netewê dike sembolek. Îfadeya "*Şefqeta neteweyî ya jinê, bi taybetî ya jina kurd, wê birînên bêhejmar ên Kurdistanê bipêçe û ji derdên wê re bibe derman"*, jinê wek rizgarker û bargira nasnameya neteweyî ya kurd teswîr dike. Ev yek, jinê wek faileke aktîf ya têkoşîna neteweyî pêşkeş dike û di heman demê de hêviya dermankirina birînên civakê yên piştî şer bi şêwazeke hesetwer tîne ziman.

2.2. Gotara Medeniyet û Nûjenbûnê

Metin, têkiliya têgehên medeniyet û nûjenbûnê, bi ser beşdariya civakî ya jina kurd re datîne: "*Ji alîyê her kesî ve malûm e ku ji bo pêşketin û gihandina milletan, tesîreke kûr û gewre ya jinan heye.*" Ev yek, diyar dike ku bi rêya beşdariya li qada gişti û perwerdekirina jinê, di pêvajoya avakirina civakeke modern de dikare piştgirî bê dayîn. Daxuyaniya "*Di heman demê de ev teşebis, wê bide nîşandan ku di hizûra cîhana medeniyetê de, kurd xwedî fikrên hevdem in*" avabûna komaleyê, wek nîşaneyeke kapasîteya moderbûna civaka kurd tê pêşkeşkirin. Ev gotar, hewla li qada navneteweyî meşrûkirina tevgera neteweyî ya kurd di xwe de dide der. Heman demê de, lihevhatina nirxên kevneşopiyî û nûjenbûnê derdixe pêş: "*di dînê me yê pîroz, ku ji fikrên ronî yên azadiyê welidiye de, jin xwediyê cihekî payebilind e.*" Ev, li gel nûjenbûna civaka kurd, daxwaza parastina nasnameya xwe ya dînî û kulturî bi hesasiyeteke însanî tîne ziman.

2.3. Pêşçavkirina Nirxên Dînî

Metin, bi rêya pêşçavkirina mafên Îslamê dane jinê, îdeala modernbûnê bi gotareke dînî destek dike: "*Mafê milkiyetê yê jineke, bi zewacê re tu carî wenda nabe. Jin, bi awayekî teqez xwediya mafê milkiyetê ye.*" Ev, li gel pêşçavkirina mafên hiqûqî yên Îslamê dane jinê, heman demê de îma dike ku civaka kurd dikare di pêvajoya modernbûnê de rêyeke bi nirxên dinî re lihevkirî bişopîne. Beyana "*Xwedê Teala, fêrbûna ilmê li ser mêr û jinê bi heman awayî ferz kiriye*", diyar dike ku xwegihêştina perwerdeyê ya jinan xwe dispêre meşrûiyeteke dînî. Hedîsa "*Bihuşt di binê nigên dayikan de ye*", li gel payebilindkirina nirxên menewî û exlaqî yên jinê, dilsoziya civakê ya li hemberî nasnameya dînî hêzdar dike. Ev gotar di wê mebestê de ye ku, di xwîner de, di navbera sedeqeta nirxên dînî û nûjenbûnê de hîsa lihevkirinê ava bike.

2.4. Stratejiyên Hestewer û Rewanbêjî

Rewanbêjiya metnê, bi hêmanên hestewer û exlaqî ve dagirtî ye. Îfadeyên *"bi dilxweşiyeke kûr û bêserûber hestewar bûne"* û "*pîroztirîn zewqa însanî û wijdanî*" ji ber avabûna komaleyê bextewarî û hêvî ya di civakê de peyda bûye dide der. Ev jî, di serdema piştî şer de xîtabê lêgerina civakê ya ji nû ve avakirin û hevkariyê dike. Daxuyaniya "*Em saziyên cemiyetê pîroz dikin û serkeftina wan dixwazin*" meşrûiyeta komaleyê û piştgiriya civakî xurt dike û xwîneran vedixwîne refên vê tevgerê. Ev

belexat, bi hesasiyeteke navend-mirovî, xurtkirina hêvî û hestên hevpar ên civakê ji xwe re dike armanc.

2.5. Gotara Serdestiyê ya Li Dijberî Rojava

Metin, sînordariyên hiqûqî yên jinan yên li Rojava derdixe pêş: "*Îsewiyet, jinê ji aliyê mafên hiqûqî ve, bizêdehî sînordar dike.*", Li hemberê vê yekê diparêze ku Îslamiyet zêdetir xweseriyê pêşkeşî jinê dike: "*mafê milkiyetê yê jineke, bi zewacê re tu carî wenda nabe.*" Ev hevrûkirin, di pêvajoya modernbûna civaka kurd de arzûya parastina dîn û nasnameya xwe ya netewî derpêş dike. Îfadeya "*di dînê me yê pîroz, ku ji fikrên ronî yên azadiyê welidiye de, jin xwediyê cihekî payebilind e.*" ligel derpêşkirina serdestiya exlaqî û hiqûqî ya Îslamê, mebesta di xwîner de hişyariya hîsa şanaziya kulturî di xwe de dihewîne.

3. Encam

Metna di rojnameya Serbestî ya sala 1919'an de, damezrandina Komaleya Pêşxistina Jinên Kurd wekî beşek ji têkoşîna neteweyî ya kurd û hewldanên modernîzasyonê pîroz dike. Analîza naveroka dîrokî, nîşan dide ku nivîs di çarçoveya hilweşîna Osmanî û geşbûna bîrewariya neteweyî ya kurd de hatiye nivîsîn. Metin, li gel armanca xwe ya pîrozkirina rolên civakî û netewî yên jinên kurd, gotereke yekkirina nasnameya neteweyî ya kurd, îdeala nûjenbûnê û nirxên dînî ava dike. Ev gotar, bi hasasiyetekê navend-mirovî, xurtkirina hest û hêviyên civakê armanc dike. Metin, bi yekkirina rolên kevneşopiyî (dê, hevjîn) û modern (faila têkoşîna neteweyî) di lêgerina nasnameya neteweyî û modernbûna civaka kurd de rola navendî ya jinê derdixe pêş. Tehlîl, ne tenê naveroka metnê, herwiha bi pêşçavkirina rahendên hestewer û însanî, lêgerîna hevkarî û hêviyên civaka kurd derdixe holê.

3. JÎN (1919)

Kovara Jînê di payiza sala 1918an da li Stenbolê dest bi weşanê kiriye. Wisa tê zanîn ku organa ne resmî ya Komela Pêşketina Kurdistanê bûye. Jîn bi tevahî 25 jimare hatîye weşandin. Hejmara ewil di tarîxa 7'ê Mijdara 1918an de hatiye belavkirin. Mesulmidûriya kovarê, 20 hejmarên ewil Hemzeyê Muksî bi rê ve biriye, 5 hejmarên dawiyê jî Memdûh Selîm Begî bi rê ve biriye. Di hejmara yekemîn de bi

nivîsareke kurt a bi sernivîsara "Amanca me" (Maksadımız), mebesta weşandina kovarê û amanca wê bi vê awayê hatiye veguhestin: Di derbarê edebiyat, mafên neteweyî, sosyolojî û jiyana dîrokî ya gelê kurd de ku ji sedan salan vir ve hatiye îhmalkirin de weşanan lidarxistin e. Kovara Jînê, bi wê bawerîyê û bi wê biryarê, jîyana xwe nêzîkê salek domandiye Jimareya wê ya dawiyê, yanî ya 25an di tarîxa 2.10.1919an de derketiye. Kovar piştê wê tarîxê hatîye girtin û bi wî awayî di dîroka gelê kurd da veşirîye. (Bozarslan, 1985)

Bi tevahî ji bo tehlîlê 3 nivîs ji kovara Jînê hatine hilbijartin. Nivîsa yekem, di hejmara 14an de bi sernava “Xanima Kurd” bi îmzeya Memdûh Selîm Begî hatiye belavkirin. Nivîsa duyem, di hejmera 22an de helbestek bi navê “Ji bo Civata Dayîkan” bi îmzeya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî hatiye belavkirin. Nivîsa sêyem jî bi serenavê “Destûrnameya Komaleya Tealiya Jinên Kurd” hatiye belavkirin ku, ji pirtûka Rohat Alakom a bi navê “Kürt Kadınları Teali Cemiyeti” hatiye wergirtin.

a. XANIMA KURD

Pîvaneke şaristaniyê jî, cihê jinê yê di civakê de û serkeftinên wê yên xwegihîştî ne. Di neteweyên şareza de jin bi rastî nîvê wê neteweyê ye; her cûre maf û îmtiyaz, rûmet û girîngî, ku mêr xwedî ne, hinek caran ji wan zêdetir, bi comerdî ji jinan re jî tê pêşkeşkirin. Bingeha nifşên dahatûyê jin ava dikin. Dikare were gotin ku neteweyên ku jinên wan baş nehatibin perwerdekirin û erkên dêtiyê teqdîr nekiribin, sêwî ne. Di civakên hoveber(primitif) de jî hêzeke taybet a jinan li ser mêran hebû. Em vê hêzê di dîroka van qewman de bi awayên cihêreng; mînak, di serdema hoveber ya Ereban de dibînin. Wek mînak, peywirdarkirina jinan di şer de bi erka cesaretkirina mêran, heta alîkariya wan a ji birîndaran re jî cureyeke hêzê ye. Civakên ku jinê pir xirab û biçûk dîtine, heta ku jinê ji kategoriya mirovahiyê jî nehesibandine, hebûne û hîna jî hene. Ev rastiyek bêguman e ku cih û mafên ku jin di Îslamê de xwedî ne, ji cihê ku îro ji wan re layiq nayê dîtin, gelekî bilindtir û ji mafên ku îro ji wan re layiq nayê dîtin gelekî berfirehtir in. Erka kesên ku bi karên dînî re têkildar in û alimên dînî ne ew e ku jinan ji mafên dînî bêpar bihêlin, lê belê van mafan li gorî hewcedariyên demê berfireh bikin û ji nû ve birêkûpêk bikin, da ku karanîna wan neyê astengkirin.

Ez bawer im ku îro, ji bo di Îslamê de têgihiştina fêmberiya xelet a dijberiya mafên jinan li hemberê qaîdeyên bingehîn ên dînî, û ji bo fêmberiya xelet sepandina wê, vekolîna jinên li neteweyên Misilman û tebeqeyên cihêreng ên vê netewêyê bes e: Çawa ku jinên kurd, tirk, ereb, çerkez û arnavût îro her yek ji wan naşibin hev, her wiha hinek caran jî li gor hev di nav mercên dijberî hev de dijîn, bi heman awayî heman tebeqeyên gundî, bajarî ku ji yek binemalê ne jî şêwazên jiyînî yên ji hev cihêreng li dar dixin. Çawa ku emrên olî bêîstîsna û giştî ne, çima di navbera wan kesên ku bi yek dînî ve girêdayî ne de, di têgihiştin û sepandina heman xisleta dînî de di vê astê de cudahiyek ewqas heye? Di vî warî de, wek mînak, em mijara cilûbergan bidin ber çav û bêjin ku: Çima jina Misilman a arnavut, jina Misilman a kurd, jina Misilman a tirk, jina Misilman a ereb û jina Misilman a çerkez bi awayên cuda xwe dipêçin? An jî yek ji van yan jî hin ji van, pêçanê bi wateyeke din têdigihîjin û bi awayê ku em dixwazin xwe ranapêçin? Niha, ji bo hinek ji vana, ma em ê bêjin, "Li gorî fermanên Îslamê, an jî kevneşopiyên diyarker tevnagerin?" Ji van cudahiyan derdikeve holê ku ji şêwazên jiyana cuda yên jinan ên îro, belkî gelek ji wan bi armanca esasî ya Îslamê re li hev nakin. Bi gotineke din, ji van şêwazan belkî tenê yek bi usûlên ku Îslam ferman dike û nîşan dide re li hev dike, yanî rast e; yên din şaş in. Çimkî divê dîn tenê ji rastiyeke yekgirtî pêk bê. Rastî jî yek e, cihêrengiyê qebûl nake. Wê demê, li gorî cilûbergên hin jinên Misilman, divê emê mecbûr bimînin bêjin, "Şêwaza ku dîn ferman dike li gorî demê ev e, yên din bi şerîet û dînî re naguncin." Gelo ev cilûbergên kîjan girse an girseyên Misilman in ku bi hewcedariyên demê re herî zêde li hev dikin an jî bi temamî diguncin? Ji bo vê pirsê, belkî gotinên me yên jêrîn kêm zêde bersivekê bidin.

****

Piştî ku me mijarê heta vir anî, êdî em werin ser kurdîtiyê: Di gotinên me yên jorîn de, ku bi mijara esasî ve ne girêdayî bûn, me got, "Dilsoziya kurdan a bi dîn re ji aliyê her kesî ve tê qebûlkirin." Em, rewşa jinên civakeke ewqas dîndar, li gorî pêdiviyên serdema me gelekî guncaw dibînin. Ev rewş, ji bo kurdîniya ku dixwaze nûjen bibe û bi taybetî bi ronakbîrên xwe re ber bi vê armancê ve dimeşe, ewqas kêrhatî ye ku, wekî di hin neteweyên nûjenbûyî de, mînak di tirkan de, îhtîmala derketina "pirsgirêka jinan" a komplîke tune ye. Rewşên ku dikarin bibin sedema gotegotên wekî "Wey, ev jin vekirî ye, ya din bi mêran re diaxive, ev li gorî rapêçînê

tevnegeriyaye" di civaka kurdîtiyê de tune ne. Jina kurd bi esasî azad e, xwediya mala xwe ye; ji bendên nehewce yên pêçanê, ku derveyî kevneşopiyên diyarker ên Îslamê ne, azad e; di jiyana civakî ya ku mêr jî tê de ne, bi cihekî rûmetdar beşdar bûye. Eger em hinekî din li tebeqeya jorîn binêrin, emê "serweriyeke jinan" jî bibînin. Ma jixwe serdema me, ji mafê serweriya jinan re jî negot erê? Jina kurd, di têkiliyên xwe yên civakî yên bi mêran re, erkên hevjînê xwe, yanî mêrê xwe, jî pêk tîne; mînak, mêvan qebûl dike, bi xwe wekî mêr wan mêvanan pêşwazî dike. Jina kurd xwedî karakterekî taybet û bijarte ye jî. Ez ê mînakeke rastîn pêşkêşî we bikim:

Demeke ku mêr ne li malê ye, biyanîyekî ku ne kurd e tê. Havîn e. Jina ciwan a kurd ji mêvanê xwe re li binê dara li ber malê cih çêdike û li gorî usûlê xwarinê pêşkêş dike. Mêvan dema xwarinê dixwe, jina ciwan li gorî dilxwaziya xwe dibîne û dixwaze xwarinê ji bîr bike. Xanim ciddiyeta xwe xirab nake. Mêvan jî xwarina xwe diqedîne. Ma niha wê di dilê wî de hêviyeke zêdetir çênebe? Fehş dibe. Jina ciwan, a ku exlaqê wê jî wekî pazûyên wê bi hêz e, vê nankorê di cih de bi dara li tenişta xwe ve girê dide. Mêvan bila li wir bimîne, êvarê axayê malê tê û bi şaşwazî dipirse: Ev kî ye? Jinik bersiv dide: Yekî ku dixwest malê te bidize ye. Axa dipirse: Ji bo diziyê hatibû? Kê ew girê da? Jinik dibêje: Erê, wî dixwest destdirêjiyê li namûsa te bike, min jî wî wisa girê da. Li hemberî vê bûyerê, ku hestên namûsdariyê yên kurdan bilind dike. Jiyana vê dizê bi van gotinên jinê tê rizgarkirin: Ji sibê ve cezayê ku wî kişandiye bes e; ji vê wêdetir ji bo min bibexşîne. Ev mînakeke asayî ya zexmbûna karaktereke bilind e. Mînakên bi vî rengî di civaka kurdîtiyê de ewqas zêde ne ku, hema bêje giştî ye. Her wiha, ne mêrekî kurd an jî bavek ji jina xwe an keça xwe guman bike û bibêje: Dema ez ne li malê bûm, nebî nebî tu ti kesî bike hundir, nebî tu rûyê xwe nîşan bidî, nexwe ez ê li te bixim, te bikujim; ne jî jina kurd azadiya fireh a ku bi dest xistiye li dijî mêrê xwe û malbata xwe bi kar tîne. Ev hevsengiyeke civakî ye û serkeftineke medeniyetê ye ku her hal ji bo neteweya Kurd wekî hebûneke hêja tê hesibandin. Ji bilî vê, jina kurd perwerdekarê mutleq û yekane yê zarokên xwe ye. Di ruhê her zarokek kurd de, têkeleke bi hêz a bi dest û ruhê dayîka wê/î amade bûye heye. Ji ber vê yekê, jin û mêrên kurd xwedî karaktereke ewqasî nêzî hev in.

Zewaca pirjinî di nav kurdistaniyan de tenê ji çend kesên çînekê re ku endamên wan pir kêm in, xweser e, û di nav kurdan de talaq jî bi qasê em bêjin tune ye kêmpeyda ye." Zilamek ku, ji jina xwe veqete û jineke ku veqetînê heq kiribe, bi

nefreta ku di nav malbat û hevalên hevdem ên wan de peyda dibe, gelek caran nikarin careke din bizewicin, û bi taybetî jin nikare dîsa mêrekî bibîne. Ev rewşa xwezayî ya jina kurd, bi pêdiviyên roja me re di vê astê de li hev dikin. Eger tiştek kêm hebe, ew e ku ev terbiyeya bi taybetmendiyê, ku ji kevneşopiyên neteweyî yên nenivîsandî derketiye û di nav wan de pêş ketiye, bi qaîdeyên ronîkirinê û qaîdeyên hînkirina nûjen nehatiye temamkirin û tacîdarkirin e. Roja ku em van qaîdeyên perwerdehiyê, van qaîdeyên hînkirinê bi cih bikin, em ê dereceya fezîleta jina kurd û çawa zarokên wê yên perwerdekirî bingeheke welatparêziyê ya bi heybet ava dikin, bibînin. Em bawer dikin ku ev dahatû ne ewqas dûr e. (Selîmbegî, 1919: 14-15)

Vanlı M. C. Selîmbegî

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

Tehlîla naveroka dîrokî, hewl dide ku bi nirxandina metnê di çarçoveya sosyo-polîtîk, kulturî û dîrokî ya sala 1919an de temsîliyet û rolên jinan fêm bike. Di vê çarçoveyê de, metin, cihê jina kurd a civakî bi pêvajoyên modernîzasyonê û avakirina nasnameya neteweyî ve girê dide û taybetmendiya xweser a civaka kurd derpêş dike.

1.1. Temayên Sereke û Temsîliyet

1.1.1. Rola Jinan a Şanîdera Şariştanî

Metin, diparêze ku pîleya şaristaniya civakekê bi statûya civakî ya jinan tê pîvandin: "Pîvaneke şaristaniyê jî, cihê jinê yê di civakê de û serkeftinên wê yên xwegihîştî ne. Di neteweyên şareza de jin bi rastî nîvê wê neteweyê ye; her cûre maf û îmtiyaz, rûmet û girîngî, ku mêr xwedî ne, hinek caran ji wan zêdetir, bi comerdî ji jinan re jî tê pêşkeşkirin." Ev daxuyanî, derpêş dike ku xwedîbûna mafên wekhev ên jinan şerta bingehîn a civakekê nûjen e û gotarên modernîst ên serdemê di xwe de dide der. Jin di metnê de, ne tenê wekî aktorên şexsî, heman demê de wekî remza pêşketina neteweyek tên bi cih kirin.

1.1.2. Azadî û Xweseriya Jina Kurd

Jina kurd, wek figûreke di malê de xwedîotorîte, di jiyana sosyal de çalak û dûrê bendên nehewce yên pêçanê, ku derveyî Îslamê ne, tê teswîrkirin: *"Jina kurd bi esasî azad e, xwediya mala xwe ye; ji bendên nehewce yên pêçanê, ku derveyî*

kevneşopiyên diyarker ên Îslamê ne, azad e; di jiyana civakî ya ku mêr jî tê de ne, bi cihekî rûmetdar beşdar bûye." Ev temsîliyet, nêzîkayiya civaka kurd a li hemberî jinan wekî taybetiyek cihêrengiyê di navbera civaka kurd û civakên Misliman ên din (ereb, çerkez, arnavut û tirk) de pêşkeş dike. Metin, diyar dike ku jinên kurd di jiyana sosyal de bi mêran re xwedî temsîliyeteke wekhev e, heta di hinek rewşan de serdestiyek ku jê re dikare "serweriya jinan" bê gotin derdixe pêş: *"Eger em hinekî din li tebeqeya jorîn binêrin, emê "saltanateke jinan" jî bibînin."*

1.1.3. Hêza Exlaqî û Fîzîkî

Anekdota di metnê de, bi bûyera ji aliyê jineke ciwan a kurd ve bi darê ve girêdana mêvanekî ji ber kiryarên xwe yên bêexlaq, wê derfetê dide ku jina kurd hem hêza xwe ya exlaqî hem jî ya fîzîkî pêşkeş bike: *"Jina ciwan, a ku exlaqê wê jî wekî pazûyên wê bi hêz e, vê nankorê di cih de bi dara li tenişta xwe ve girê dide… Jinik bersiv dide: Yekî ku dixwest malê te bidize ye… Erê, wî dixwest destdirêjiyê li namûsa te bike, min jî wî wisa girê da."* Ev çîrok, diyar dike ku jina kurd ne tenê figûreke ku namûsa malbatê diparêze, heman demê de ji aliyê fîzîkî û exlaqî ve jî bi mêran re wekhev e, heta di hinek rewşan de xwedî roleke serdestir e. Ew dilovaniya ku jinê pêşkeşî mêvan kir *(Ji sibê ve cezayê ku wî kişandiye bes e; ji vê wêdetir ji bo min bibexşîne*) karektera wê ya xwedîexlaq xurtir dike.

1.1.4. Dahatûya Netewî û Perwerde

Metin, diparêze ku fezîletên xwezayî yên jina kurd bi rêya perwerdeyeke modern zêdetir dikare bipêş bikeve: "Roja ku em van qaîdeyên perwerdehiyê, van qaîdeyên hînkirinê bi cih bikin, em ê dereceya fezîleta jina kurd û çawa zarokên wê yên perwerdekirî bingeheke welatparêziyê ya bi heybet ava dikin, bibînin." Jin, wekî bargirên dahatû û nasnameya netewî tên dîtin; bi taybetî bi rêya mezinkirina zarokan bingehên ruhî û kulturî yên civaka kurd ava dikin: "Di ruhê her zarokek kurd de, têkeleke bi hêz a bi dest û ruhê dayîka wê/î amade bûye heye." Ev, rola krîtîk a jinan a di veguhêziya perwerde û kulturê de derdixe pêş.

1.1.5. Hevsengiya Civakî û Binyata Malbatê

Metin, diyar dike ku di nav civaka kurdan de têkiliyên mêr û jinê di nav hevsengiyeke sosyal de ye: "Her wiha, ne mêrekî kurd an jî bavek ji jina xwe an keça xwe guman bike û bibêje: Dema ez ne li malê bûm, nebî nebî tu ti kesî bike hundir,

nebî tu rûyê xwe nîşan bidî, nexwe ez ê li te bixim, te bikujim; ne jî jina kurd azadiya fireh a ku bi dest xistiye li dijî mêrê xwe û malbata xwe bi kar tîne.” Herwiha, diyar dike ku di nav civaka kurdan de pirjinî û talaq pir kêmpeyda ye: “Zewaca pirjinî di nav Kurdistaniyan de tenê ji çend kesên çînekê re ku endamên wan pir kêm in, xweser e, û di nav kurdan de talaq jî bi qasê em bêjin tune ye kêmpeyda ye.” Ev diyarde, îma dike ku binyata malbatî ya civaka kurd modeleke hevseng û nûjen pêşkeş dike.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Stratejiyên Gotarî yên Sereke

2.1.1. Gotara Raserî ya Berawirdî

Metin, rola sosyal û azadiya jina kurd, bi cihê sînordar ên jinên civakên Misilman ên din re berawird dike: “Çawa ku jinên kurd, tirk, ereb, çerkez û arnavut îro her yek ji wan naşibin hev, her wiha hinek caran jî li gor hev di nav mercên dijberî hev de dijîn, bi heman awayî heman tebeqeyên gundî, bajarî ku ji yek binemalê ne jî şêwazên jiyînî yên ji hev cihêreng derpêş dikin.” Ev berawirdkirin, diyar dike ku jina kurd zêdetir azad û xweser e û herwiha wê li ciheke biîmtiyaz bi cih dike. Bi taybetî ev cihêrengiya bi ser pratîkên xwepêçînê de tê kirin, bi îfadeya “wê demê, li gorî cilûbergên hin jinên Misilman, divê emê mecbûr bimînin bêjin, şêwaza ku dîn ferman dike li gorî demê ev e, yên din bi şerîet û dînî re naguncin” tê piştxurtkirin. Ev gotar, îma dike ku civaka kurd Îslamê zêdetir “rast” û modern disepîne.

2.1.2. Ji Nû ve Şîrovekirina Îslamê

Metin, diyar dike ku mafên jinan ên di Îslamê de xelet hatine fêmkirin û nayên sepandin: “Ev rastiyek bêguman e ku cih û mafên ku jin di Îslamê de xwedî ne, ji cihê ku îro ji wan re layiq nayê dîtin, gelekî bilindtir û ji mafên ku îro ji wan re layiq nayê dîtin gelekî berfirehtir in.” Ev, gotareke modernîst e ku, divê bendên dînî li gor pêdiviyên nûjen ji nû ve were dîzaynkirin. Metin, îfade dike ku erka alimên Misilman “ew e ku jinan ji mafên dînî bêpar nehêlin, her wiha van mafan li gorî hewcedariyên demê berfireh bikin û ji nû ve birêkûpêk bikin, da ku bikaranîna wan neyê astengkirin”, bi vê awayê Îslamê ji çarçoveyeke statîk derdixe û ji şîroveyeke dînamîk re vedike.

2.1.3. Îdealîzekirina Jina Kurd

Jina kurd, bi hêza xwe ya fîzîkî, zexmiya exlaqî û xweseriya sosyal ve tê pênasekirin. Çîroka jina ku mêvan bi darê ve girêda ye, wek *"mînakeke asayî ya zexmbûna karaktereke bilind"* tê pêşkeşkirin: *"Xanim cidiyeta xwe xirav neke… Vê nankorê di cih de bi dara li tenîşta xwe ve girê dide… Ji sibê ve cezayê ku wî kişandiye bes e; ji vê wêdetir ji bo min bibexşîne."* Ev anekdot, destnîşan dike ku jina kurd hem di asta takekesî de, hem jî di asta civakî de wekî rol modeleke ye. Helwesta jinê hem ya cezakirinê, hem jî ya dilovan, wesfa wê ya parastina hevsengiya civakî û serdestiya wê ya exlaqî derpêş dike.

2.1.4. Nasnameya Netewî û Rola Jinan

Jin, wek bargirên nasnameya netewî û avakarên dahatûyê tên bicihkirin: *"Di ruhê her zarokek kurd de, têkeleke bi hêz a bi dest û ruhê dayîka wê/î amade bûye heye."* Ev gotar, dide zanîn ku jin, bi rêya mezinkirina zarokan û veguhêziya kulturî, têşe didin bîreweriya netewî. Diyardeya jina kurd *"perwerdekarê mutleq û yekane yê zarokê xwe ye"*, rola wê ya navendî ya di domdariya nasnameya neteweyî de zexm dike.

2.1.5. Gotara Hevsengiya Patriyarkal

Metin, ji aliyek ve azadiya jinan pîroz dike, ji aliyê din ve vê azadiyê bi namûsa malbatê û ahenga civakî ve parseng dike: "Her wiha, ne mêrekî kurd an jî bavek ji jina xwe an keça xwe guman bike… Sînordariyê tîne bîra xwe… Ne jî jina kurd azadiya fireh a ku bi dest xistiye li dijî mêrê xwe û malbata xwe bi kar tîne." Ev, diyar dike ku azadiya jinê, di nav normên civakî de hatiye meşrûkirin. Her wiha, kêmpeydayiya pirjinî û talaqê, hevsengiyeke sosyal a wek "heybereke hêja ji bo netewa kurd" dertê pêş.

2.1.6. Hêz û Otorîte

Metin, ji aliyek ve rolên civakî û xweseriya jinan pîroz dike, ji aliyê din ve jî van rolên pîrozkirî di çarçoveyeke patriyarkal de sînordar dike. Her çiqas gotara jin di jiyana sosyal de çalak in hebe jî, têkiliya vê çalakiyê gelemperî bi rolên kevnerû yên wekî namûsa malbatê, kevanîtî û mezinkirina zarokan re tê danîn: *"Jina kurd, di têkiliyên xwe yên civakî yên bi mêran re, erkên hevjînê xwe, yanî mêrê xwe, jî pêk tîne; mînak, mêvan qebûl dike, bi xwe wekî mêr wan mêvanan pêşwazî dike."* Ev,

diyar dike ku xweseriya jinan ji xweseriya ferdî wêdetir, bi awayê ji berjewendiyên malbatî û hevsengiya civakî re di nav xizmetê de be tê pênasekirin. Di heman demê de, pîrozkirina metnê ya; jin bargira nasnameya netewê ne, wan di cihekî sembolîk de bi cih dike û bi ser re jî ji mafên şexsî zêdetir berpirsiyariyên kolektîf ên jinan derdixe pêş.

3. Encam

Metna bi serenavê "Jina Kurd", di çarçoveya exlaqî û civakî de wek figûreke hêzdar temsîliyeta jina kurd, bi gotarên nûjenbûn û nasnameya netewî re bi hostayî xerman dike. Tehlîla naveroka dîrokî, piştî Meşrutiyeta Duyem di metnê de hewlên ronakbîrên kurd ên avakariya nasnameya netewî, nûjenbûn û reformên civakî di xwe de dide der. Metin, bi îdealîzekirina rolên civakî û xweseriya jina kurd, cihêrengiya civaka kurd ji civakên din ên Misliman û potansiyela wê ya lihevkirina bi dinyaya nûjen re derdixe pêş. Tehlîla gotarî, destnîşan dike ku di çarçoveya şîroveya "rast" a di Îslamê de jina kurd li gor vê şîroveyê di pozisyoneke azad û xweser de hatiye bicihkirin. Lê tê dîtin ku ev xweserî bi normên patriyarkal û li gor berjewendiyên netewî hatiye sînordarkirin. Jin, hem ji aliyê exlaqî hem jî ji aliyê kulturî ve wek bargirên nasnameya neteweyî tên pîrozkirin. Îmaja jina kurd a hêzdar û xweser, yek ji wan mînakanên destpêkê ye ku di pêvajoyên avakirina nasnameya neteweyî û nûjenbûnê de rola navendî ya jinan derdixe pêş.

b. DESTÛRNAMEYA KOMALEYA TEALIYA JINÊN KURD

1- Destûrnameya Komeleya Tealiya Jinên Kurd

Bi navê Komeleya Tealiya Jinên Kurd ku navenda wê li Stembolê ye cîhekî kombûnê hatiye vekirin.

2- Armanca komeleyê

Armanca komeleyê bilindbûn û pêşxistina jinantiya Kurd (rewşa jina Kurd) bi bîreweriya hevdem, pêkanîna reformên bingehîn û civakî di jiyana malbatî de, dîtina kar bona sêwî û jinebiyên Kurd ên ku ji ber sedemê sirgûn û qirkirinê perîşan bûne û alikariya diravî bona xelaskirina wan ji xizaniyê ye.

3- Awayê pêkanîna armancê

Komele bona armanca xwe pêk bîne dê rojname, kovar, pirtûk û namilkeyan biweşîne, şaxên (şube) komeleyê, xwendegeh û pirtûkxaneyan veke, herweha dersên serbest û konferansan bide.

Ji bili karên ku di xala sêwem de tên nîşandan û xebatên ku dikarin di nav komeleyê pêk bên, her jina Kurd bona gihiştina armanca komeleyê dê ji her fersenda derdikeve holê sûd werbigire û propagandayên hewcedar bike. Armanca van propagandayan hişyarbûna neteweyî ye. (Alakom, 2019: 70)

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

1.1. Zeman û Mekan

Ev rêzname, di sala 1919an de li Stembolê di "Divan Yolunda Kadınlar Dunyası Matbaası" de hatiye çapkirin. Ev serdem, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn heyama bilindbûyîn û belavbûyîna pêlên tevgerên netewî ye. Di vê mîhwerê de birêxistinbûyîna jinên kurd jî di warê lêgerîna nasnameya zayendî û netewî de dikare were fêmkirin.

1.2. Armanc

Mebesta sazkirina Komelê li ser perwerdekirina jinan û li ser bilindkirina nirxên wan ên civakî hatine avakirin. Heman demê de piştgiriya aborî jî bo jinan tê fikirîn.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Ziman û Şêwaz

Metin bi zamaneke fermî û şêwazeke nerm hatiye hunandin. Gotara *"bi bîreweriya hevdem"* pêşketinek li gor nirxên modernîst û rojavayî ji xwe re dike nexşerê. Heman demê de gotara "sirgûn û qirkirin" di derbarê rewşa atmosfera polîtîk de ji me re dibe referans û di atmosfereke çawa de ev xebat pêk hatine bi me dide zanîn.

2.2. Nasname û Aîdiyet

Îfadeyên bi rengê "jinên kurd" û "hişyarbûyîna netewî", dide nîşandan ku nasameya kurdbûnê û hişmendiya kolektîf hêmanên bingehîn pêk tîne. Hevkariya jinan bi şiara peywirgirtina komîn xwe ava dike.

2.3. Rolên Zayendî

Metin, bi gotarên mîna *"dîtina kar bona sêwî û jinebiyên kurd"* rolên kevneperest di serdema nû de bi nêzîkayîyeke modern ji nû ve pênase dike. Bangewaziya lidarxistina propagandayê bi rêya hemû jinan ve tê pêkanîn.

2.4. Çarçoveya Îdeolojîk

Gotarên di rengê *"propaganda û hişyarbûyîna netewî"* de radigihîne ku metin di konteksta nijadperestiya kurd de ye û xwediyê pêkanîna armancên polîtîk e.

3. Encam

Bi rêya referansa vê rêziknameyê em dibînin ku di wê heyama ku tevgerên netewî hedî hêdî lê peyda dibe de, di warê hişyariya civakî û netewî de jinên kurd jî wekî failên sereke cih girtine. Metin bi rêya perspektîfeke reformîst û bi alîkariya perwerde, kar û hevkariyê ji bo înşakirina nasnameya jinan hewl dide. Heman demê de berbiçavkirina hêmanên nasnameya nijadî û hişyarbûyûna netewî jî destnîşan dike ku hasasiyetên di vê warê de jî hatine parastin. Sazîbûna komelê li Stenbolê destnîşan dike ku Komel ji aliyê kesên rewşenbîr û bajarî ve hatiye avakirin.

c. JI BO CIVATA DAYÎKAN

Pirsî ji esrê dewran: "Fenn û tereqqîya te

Dewlet serê çi ye?" Got "dewlet serê jinan e"

Lewra qe nahewin ew, şev û roj ewan xebat e

Ca zarîyek mezin kin; jîna welat bi wan e

Însan bi eslê fitret ne qenc e, ne xirab e

Qenc û xirabîya me bi rakirina dîyan e

Emre Resul e: "Cennet bin pîyê ummehatan"

Lewra deha, zekawet bi terbîya ewan e

İlm, fezîleta wan hindî biket tereqqî,

Techîz bibin mukemmel bi exlaqê maderane

Em de bilind bin hinde, heta bigîhîne ewcan

Wextê felahbûnê, zeman jî ev zeman e

Gotin vekirine dayan civatekê bilindî

Ya Reb tu pêkve bîne, tewfiqekê de wan e

Rehmî nedît ku laiq teqdîm biket hediye

Hediyye ger qebûl bit wî daye cîsm û can e. (Rehmî, 1919: 15)

Ji Mala Hekarîyan Ebdurrehîm Rehmî

1. Tehlîla di Konteksta Dîrokî de

1.1. Zeman û Mekan

Ev helbest, ji aliyê Ebdurrehîm Rehmî ve di sala 1919an de hatiye nivîsandin. Bi kurtasî temaya ku di helbestê de hatiye pêşkeşkirin li ser rola dayîkbûnê ye, ji bo meşrûkirina rola dayîktiyê, bi piştgiriya referans û metaforên olî gotarê xurt kiriye.

1.2. Jin û Rola Dayîkbûnê

Di civaka wê serdemê de jin, bi taybetî wekî hêmana bingehîn a pergala malbat û exlaqê dihat dîtin. Ev heyam ber bi salên dawiya Osmanî ye ku tê zanîn serdema derbasdariyê ya pergaleke nû ye. Di wê pergala nû de hewl tê dayîn ku di bingeha guherînê de jin jî bibin xwedîrol. Îfadeyên mîna “civata dayikan” û “waxte fellahbûne” daxuyaniyên di derbarê rolên jinan ên di guherîna civakî de ne.

1.3. Çarçoveya Exlaqî û Olî

Îfadeya “Emre Resul e: "Cennet bin pîyê ummehatan" nîşaneya nirx û statû dayîna Îslamê ya li hemberî dayîkan e. Ev jî destnîşan dike ku dîn, di têşegirtina hêmanên exlaqî û civakî de xwedîrol e.

1.4. Tesewura Pêşerojî

Îfadeya “Ca zarîyek mezin kin; jîna welat bi wan e” rola zarokan ku bi rêya perwerdekirina dayîkan a di avakariya netewî de derdixe pêş.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Ziman û Şêwaz

Helbest bi bikaranîna metaforeke hêzdar dest pê dike ku *“Dewlet serê çi ye?" Got "dewlet serê jinan e"* ev îfade dide zanîn ku rola dayîkbûnê ne tenê di nav malbatê de heman demê de di danîna bingeha civakê de jî xwedîrol e. Bikaranîna îfadeya *“Emre Resul e: "Cennet bin pîyê ummehatan"* wekî amûreke retorîk ku xwe dispêre otorîteya olî ku di warê avakariyê de rolê xurtir dike. Bi rêya vê *îfadeyê “Însan bi eslê fitret ne qenc e, ne xirab e, Qenc û xirabîya me bi rakirina dîyan e”* li ser rola exlaqî û pedagojîk ya dayîkan tê sekinandin.

2.2. Rolên Zayendî

Gotara helbestê, dide ragihandin ku jinan bi taybetî dayîkan ji bo pêşketina civakî wekî hêmana bingehîn dibîne û rolên gelêrî ên zayendî ji nû ve bi formek nû vedijîne. Dayîkbûnê bi rolên perwerdekirina zarokan û tertîbkirina exlaqê pîroz dike, lê ev rolana tenê bi malbat û civakê re sînordar in, daxuyaniyek li ser xweserî û wekheviyê tune ye.

2.3. Hêz û Otorîte:

Helbest, bi dayîna hezeke sembolîk bo dayîkan dest pê dike û vê di çarçoveyeke olî û exlaqî de bi rih û can dike. Dayîkan wekî heza guherîner bo civakê pênase bike jî vê guherîneriyê bi çarçoveya patriyarkal sînordar dike.

3. Encam

Bi awayekî giştî daxuyanî û gotarên di helbestê de hatine pêşkeşkirin diyar dike ku rola dayîkbûnê bi referans û hêmanên olî hatiye payebilindkirin û parastin.

Lê vê jî bi xwe re sînordariya rolên jinan a bi ser dayîkbûnê re derxistiye holê. Berbiçavkirina rola dayîkbûnê pêşî li ber daxwazên xweserî û wekhevîxwaziya jinan girtiye. Heman demê de bikaranîna gotarên kevneperest û modernîst dualiteyeke ava kiriye lewra hevî û daxwazên ji dayîkan tên kirin bi rêya bilindkirina xeta modernîst dertên pêş, lê referans û hêmanên olî parastina nirxên kevneşopiyê dike.

4. HAWAR (1932-43)

Hejmara yekemîn a Hawarê, di 15yê Gulana 1932an de roja yekşemê li Şamê di çapxaneya Terekî de hatîye çapkirin. Hawar, ji panzdeh (15) rojan carekê bi kurdî-fransizî hatîye weşandin û li ser hev 57 jimar hatine çapkirin. Mesulmidûrê kovara Hawarê Celedat Elî Bedirxan e. Hejmara dawîn a Hawarê, di 15ê Tebaxa 1943an de hatîye çapkirin. (Veroj, 2021)

Mebesta avakirin û weşandina kovarê di hejmera yekemîn a kovarê de bi sernivîsara "Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê" hatiye belavkirin: Hawar dengê zaninê ye. Zanin xwenasin e, xwenasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ku xwe nas dike; dikare xwe bide nasîn. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ku ziman şerta heyinê ya pêşin e. Hawar ji vir pêve bi her tiştê ku kurdanî û kurdîtî pê bendewar e re, dê mijul bibe. Tenê siyaset jê dûr e, xwe nake nav siyasetê. Hawarê siyasetê ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, hiner û sinhetê de dê bixebitin.

Mijar û temayên sereke yên di nav pelên Hawarê de zêdetirîn hatine weşandin ev in; ziman û millet, alfabe û rêziman, ferheng, edebiyat û folklor, danasîna klasîkên kurd, tarîx û cografya, jiyana sosyal û neteweyî û namayeên xwendevanan.

Ji kovara Hawarê du nivîs hatine hilbijartin. Her du nivîs jî ji aliyê Rewşen Bedirxanê ve di nav stûnên Hawarê de hatine belavkirin. Nivîsa yekem di hejmara 27an de bi sernava "Kebanî û Mamoste", ya duyem jî di hejmara 28an de bi sernava "Jin û Bextiyariya Malê" hatiye weşandin.

a. KEBANÎ Û MAMOSTE

Xwendevanên ko çavên xwe Ii sernameyên vê bend û vê stûnê bigerînin heye ko beri ewilî bibêjin, gelo di vê stûnê de ji me re qala dirûtin û aşbaziyê wê bikin. Ji ber ko bi adetî di van stûnan de qala van tiştan dikin. Ji milê din wê lê ecêbmayî

bimînin û ji xwe bipirsin; kebanî û mamoste bi çî awayî gihane hev û ji bona çi? Lê heke wan sebr bi xwe da û bi nivîsara min ve çûn û ew xwendin ewê bibînin ko heq di destê min de ye û divêt kebanî û mamoste bigehin hev û di her kebaniya Kurdmanc *de mamosteyek hebe. Bê şik, wezîfa jinan a pêşin diyatî û kebanîtî ye. Ji bo jinan ji van pêştir tu wezîfe nîne û her kar û wezîfe di pey wan re têt. Lê gava mirov bala xwe dide û tesîra jinan Ii ser jiyina miletan a civakî derpêş dike, dibîne ko jin rasterê û nerasterê û bi awayên têvel li jiyîna miletan kar dikin. Ji lewre jinan ji wezîfeyên xwe yên eslî pê ve wezîfeyinê din ên mihîm hene.*

Mêrên ko qedera miletan di destên xwe de digirin li ber destên jinan bi xwedî dibin, terbiya xwe a pêşîn ji wan digirin û tiştên ko di zarotiya xwe de dielimin heta *axa gorinan ji bir nakin û ew tim û tim li wan hikim dikin. Ji lewre medhelokê gotiye: «Kurmê şîrî heta pîrî».*

Ji me jinên Kurdmancan *re ji van pê ve wezîfeke din jî heye. Ew wezîfe ji rewşa miletê me ya xweser dizê. Ji lewre, jin û diyên* Kurdmancan *berê xwe didim we, ji we, ji we bi tenê re dibêjîm. Xwehên min en delal, herwekî hon jî dizanin derdê miletê me yê mezin û xedar nezanî ye. Nezanî nexweşiyek e, û dermanê wê zanîn e. Nik miletên xudan hikûmet û teşkîlat vê nexweşiyê di xestexaneyine xisûsî de derman dikin û ji wan xestexanan re dibistan dibêjin. Mamoste, bijîşkên wê xestexaneyê ne. Miletê me, ne xwediyê wan xestexanan e. Miletê me milelekî bê teşkîlat, bê xwedî û serî, miletekî belawela ye û di bin hikmê miletine din, miletine dijmin de ye. Lê dijminê me yê mezin, ê meztir nezanî ye. Divêt em şerê wê dijminê xedar bikin. Di vî şerî de jî ji me jinên* Kurdmanc *re divêt ko arîkariya mêrên xwe bikin, zaroyên xwe bielimînin xwendin û nivîsandinê û wan ji nexweşiya nezantiyê xelas bikin. Ev xebat ji me, ji jinên* Kurdmac *re ji hemî jinên dinyayê bêtir divêtin. Ji ber ko zaroyên xelkê gava diçin dibistanê berî her tiştî hînî zimanê xwe dibin. Lê yen me wekê diçin dibistanê bi zimanê xelkê dielimin û carina yê xwe ji bîr dikin*, ji ber ko me dibistan *nîne û zaroyên me diçin dibistana xelkê. Ji lewre diyên* Kurdmanc *ji diyên her welat û miletî bêtir divêt bi xwendina zarokên xwe mijûl bibin û beriya ko ew ji destên wan bifilitin û bikevin dibistana xelkê wan hînî xwendin û nivîsandina zimanê wan bikin, Ji bona vê yekê jî ji diyên* Kurdmanc *re divêt berî ewilî ew bi xwe hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin da ko bikarin zarokên xwe jî hîn bikin.*

Ev e Hawar ji nû ve derket, yen ko kêm û zêde bi tîpên Kurdmancî nas dikin, bi xwendina Hawarê dikarin zanîna xwe pêş ve bibin û yên ko yekcar nizanin divêt dest bi hînbûna elfabiya xwe bikin. Xwehên min, ez ji we re sekinî me. Ji min re binivîsînin, tiştê ko ji bo hînbûnê ji we re gerek e, ezê wan bi dilxweşî ji we re bişînim. Bi pêkanîna daxwaza we xweş bizanin ez tu minetê li we nakim, lê mineteke mezin li xwe dikim, ji ber ko hon bi vî awayî rê didin min ko ez xizmeta welatê xwe bikim. Xweyîngino! ez carekê din dibêjim, me jinên Kurd ên îro, yên ko nifşê miletê me yê ayendê li ber destê xwe bi xwedî dikin, me du wezîfeyên giran hene: Hînbûn û hînkirin. Ji lewre ji me re divêt berî pêşîn em bibin şagirt û di pey re mamoste; mamosteyê zarokên xwe. (Bedirxan, 1941: 12)

REWŞEN BEDIRXAN

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

1.1. Konteksta Dîrokî

Metin, di sala 1941an de yanî piştî Meşrûtiyeta deyem û di serdemên destpêka Cumhuriyetê de, di kovara Hawarê de hatiye weşandin. Hawar ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve hetiye weşîn û di parastina ziman û çanda kurdan de xwedî roleke bingehîn e. Ev serdem, rastê piştî hilweşîna Împaratoriya Osmanî, avabûna netew-dewletan tê ku bi vê awayê kurd di bin hukumraniya netew-dewletên wekî Îran, Iraq, Sûrî û Tirkiyeyê de hatine dabeşkirin.

1.2. Binemayên Siyasî û Kulturî

1.2.1. Polîtikayên Bişaftinê

Li Tirkiyeyê di navbera salên 1920-1930an de zextên li ser ziman û kultûra Kurdî (wek mînak li qadên giştî, ji bilî zimanê tirkî bikarneanîna zimaneke din dikare were dayîn.) zêde dibin. Diyardeya zarokên kurd *"bi zimanê milletên din"* perwerde dibînin, li hemberê van polîkayên bişaftinê wekî rexneyeke dikare were xwendin.

1.2.2. Netewperweriya Kurd

Hawar, ji bo pêşxistin û belavbûna xwendin-nivîsandin û alfabeya kurdî mîna amûreke hatiye bikaranîn. Metin, mîna perçeyeke vê projeya netewperwer jinan wekî parazvanên ziman û kultûrê bi cih dike.

1.2.3. Cihê Jinan ên Civakî

Di civaka kurd a wê serdemê de, jin bi gelemperî bi rolên kevneşopiyî (dê, kevanî) dihatin temsîlkirin, li ber vê yekê tevgerên netewperwer jinan wek aktorên çalak ên di nav tekoşîna kulturî û siyasî de ji nû ve pênase kirin. Metin jî vê xeta derbasbûyînê di xwe de dide der.

1.3. Rolên Jinan û Temsîliyet

1.3.1. Rolên Kevneşopiyî

Tekst, derpêş dike ku ewilîn erka jinan *"dêtî û kevanîtî"* ye. Ev jî bi binyada patriyarkal a civaka wê serdemê re hevaheng e û jinan wekî navenda saziya malbatê pênase dike.

1.3.2. Rolên Netewperwer/Nûjen

Jin, di heman demê de wekî aktorên "mamoste" û veguherînerên dahatûya netewê" tên pênase kirin. Ev jî nîşan dide ku rolên kevneşopiyî bi erkên netewperwer (parastina ziman û kultûr kurdî) ve hatine berfirehkirin.

1.3.3. Hilberîner/Parazvana Kulturî

Jin, bi fêrkirina xwendin û nivîsandina kurdî ya ji zarokên xwe re, wek figûrên li hemberî nezaniyê şer dikin tê teswîrkirin. Ev jî, di parastina nasnameya kurdî ya li hemberê bişaftinê de roleke navendî li jinan bar dike.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Avakariya Nasnameyê û Şêwaz

2.1.1. Şêwaz

Metin, bi diyardeyên wek *"xweyîngino!" û "xwehên min en delal"* rasterast bang li jinên kurd dike. Ev jî, bi înşakirina tewreke(ton) hestewar di navbera jinan de piştgiriyê xurt dike û nasnameyeke hevpar diafirîne. Îfadeya *"jin û diyên kurdmancan berê xwe didim we, ji we, ji we bi tenê re dibêjîm.",* diyar dike ku xîtab rasterast li ser hedefê ye (qest jê jin in) û jinan vedixwîne wergirtina berpirsiyariyeke taybet.

2.1.2. Avakirina Nasnameyan

2.1.2.1. Jina Kurd

Jin, di rizgariya kulturî û ya neteweyî ya gelê kurd de mîna figûreke navendî tên pênasekirin. Bi diyardeya "jin û diyên kurdmancan", dêtî bi nasnameya nijadî ve tê girêdan û jin mîna bargirên projeya netewî tên bicihkirin.

2.1.2.2. Mamoste û Xwendevan

Metin, jinan hem vedixwîne "fêrbûnê" hem jî vedixwîne "fêrkirinê". Ev rola dubendî jinan ji cihê pasîf (tenê dê) derdixe cihekî aktîf (perwerdeker, veguhêzera kulturî).

2.1.2.3. Aktora Fedakar

Îfadeya nivîskar "bizanin ez tu minetê li we nakim, lê mineteke mezin li xwe dikim", hewlên jinan wek çarçoveyeke xizmet û fedakariyê çarçove dike, ev jî retorîya fedakariyê ye ku di gotarên netewperwerî de zêde tê dîtin.

2.2. Stratejiyên Retorîkî û Metafor

2.2.1. Metafora Nexweşiya Nezaniyê

Nezanî, bi îfadeya *"Nezanî nexweşiyek e, û dermanê wê zanîn e"* wek nexweşiyê tê metaforkirin. Dibistan mîna "nexweşxaneyan", mamoste jî mîna "bijîşkan" tên pêşkeşkirin. Ev jî, nezaniyê wek xetereyeke civakî dramatîze dike û perwerdeyê mîna çareseriya manûnemanê derdixe pêş.

2.2.2. Retorîya Cengê

Nezanî, bi *"dijminê me yê mezin, ê meztir nezanî ye"* mîna "dijmin" tê kesandin û jin ji bo bi vê dijminê re "şerbikin" tên vexwendin. Ev gotara milîtarîst, jinan ji rolên pasîf ber bi rolên aktîf diajo û zimanê têkoşer ê tevgera netewperwer di xwe de dide der.

2.2.3. Bikaranîna Gotinê Pêşiyan

Gotina *"Kurmê şîrî heta pîrî"* li ser mayîndebûna bandora perwerdeya di salên destpêkê de ya li ser zarokan radiweste. Ev jî, agahiyek kevneşopiyî bi agahiyek modern ve entegre dike ku meşrûiyeta kulturî ya metnê zêde dike.

2.2.4. Îqnakirina Hestî û Mantiqî

Metin, xîtabê hewla parastina zarokan ji bişaftinê ya dayîkan dike ku bi vê awayê cazîbeyeke hestewer ava dike. Heman demê de encamên pratîk (wendakirina ziman û nasnameyê) ên bi zimanekî biyanî perwerdekirina zarokên kurd mîna argumaneke mentiqî pêşkeş dike.

2.3. Çarçoveya Îdeolojîk

2.3.1. Zayenda Civakî

Diyarkirina erka ewilîn a jinan "dêtî û kevanîtî" binyada patriyarkal a serdemê derpêş dike. Lê belê firehkirina van rolan bi roleke modern wek mamostetî, derfet dide ku jin li qadên giştî de zêdetir berbiçav bibin. Ev, ji gotareke feminîst wêdetir stratejiyeke mobîlîzasyona netewperweriyê ye.

3. Encam

Metin, di konteksta netewperweriya kovara Hawarê ya di navbera salên 1930-1943an de, jinên kurd hem bi rolên kevneşopî (dê, kevanî) hem jî bi rolên modern (mamoste, parazvanên çandî) temsîl dike. Tehlîla naveroka dîrokî, derpêş dike ku metin li hemberî polîtîkayên bişaftinê û rewşa bêrêxistinbûyîna kurdan wekî bersivek be hatiye nivîsîn. Tehlîla rabêjiyê jî derpêş dike ku, metin bi stratejiyên mentiqî, hestî û kulturî jinan mobîlîze dike, lê belê vê yekê di çarçoveya netewperwerî û patriyarkal de pêk tîne. Metin di derbarê têgihiştina pêwendiya temsîliyetên jinên kurd bi dînamîkên sosyo-polîtîk ên serdemê re çarçoveyek hêzdar derpêş dike. Di tekoşîna kulturî de cihê jinan ên navendî derdixe pêş, di heman demê de sînordariyên serdemê yên binyatî û îdeolojîk di xwe de dide der. Metin, di projeyeke netewper de jinan mîna aktorên çalak bi cih dike, ev jî rê dide ku jin di nav binyada patriyarkal a wê serdemê de berbiçavtir bibin. Lê belê bilindkirina erkên ewilîn ên jinan ku kevanî û dêtî ne, wekî sînordariyên sereke tên tespîtkirin. Herî dawî jî bangewaziya fêrbûn û fêrkirina ji bo hemû jinên kurd dide nîşandan ku cudahiyên sosyo-aborî ên di navbera jinên gundewar û bajarî de hatine piştguhkirin.

b. JIN Û BEXTIYARIYA MALÊ

Gelek jin hene; bawer dikin ko rehetî û xweşiya malê bi pere û dewlemendiyê ye. Lê ne wisa ye. Seadet û bextiyarî ne ji dewlemendan bi tenê re ye. Xincikên

belengazan hene ko seadet û bextiyarî, ji qesra dewlemenda çêtir ê bêtir, tê de qerar digirin û bi rehetî cih dibin. Carina seadet sadegî ye û bextiyarî pê rewşen û geş dibe. Sadegiya xwediya malê ew e ko bi xelkê dora xwe re mihirvan û dilovan bibe, piçûkan neêşine, bi mezinan re ji adetê der midarayê neke. Bi van wesfan xwediya malê dikare hejkirina xelkê xwe, çi kiçik, çi mezin, ber bi xwe ve bikişîne û bibe perestiya wan. Gelek tiştên bêehemiyet hene ko carina jin li ser wan disekinin û bi stûriyê pergara mala xwe xerab dikin. Ji xwe erin her tiştî tevlîhev dike û tamsariyê dixe hêlîna seadetê. Ji jinan re divêt ji mêran bisebirtir bibin û gava mêr dixeyîdin ew sebirê bi xwe bidin. Erin agireke, ji bo vekuştina wî, jê re av divêtin, jê re hênîkahî gerek e, ne agirekî din. Ber vê yekê gava mêr germ dibin divêt jin honik bibin û wê germiyê şirgerm bikin. (Bedirxan, 1941: 9)

REWŞEN BEDIRXAN

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

1.1. Binyata Civakî ya Serdemê

1.1.1. Rolên Jinan û Civaka Kurd

Di serdema metin lê hatiye nivîsîn de ku rastî sala 1941an tê, di wê serdemê de civaka kurd, piştî hilweşîna Împaratoriya Osmanî û bi avabûna netew-dewletan di warê nasname, kultûr û binyada civakî de di nav veguherînan de bû. Rolên jinan ên navmalî, hîma bingehîn a binyata malbata kevneşopiyî dihate dîtin. Metin, rola jinê ya navmalî datîne navendê, ku bi wê re binyada patriyarkal a serdemê di xwe de dide der û heman demê de di nav vê binyatê de otorîteyeke menewî û berpirsiyarî li jinê bar dike.

1.1.2. Pozberiya Kevneşopî û Nûjenîbûnê

Metin, li ber pîrozkirina nirxên kevneşopiyî yên mîna dilovanî, sadeyî û sebrê, li hemberê nirxên dewlemendî û refaha madî ku modernîteyê bi xwe re anîne rexneyek li dar dixîne. Ev jî, li ber hewildana parastina nirxên kevneşopîyî ji aliyê entelektûelên kurd ên serdemê ve lihevanîna nirxên modern di xwe de dide der.

1.1.3. Ronîdarî û Perwerdehî

Tekst, li ser sererastkirina kiryarên jinan ên navmalî şîretan di xwe de dihewîne, li ber vê yekê jî bi awayê nerastere wek şexseke bîrewer û xwedîfezîlet hêzdarkirina rola jinê ya navmalî armanc dike.

1.2. Peyama Metnê ya Dîrokî

Metin, diyar dike ku bextewarî ji dewlemendiya madî wêdetir xwe dispêre nirxên menewî. Ev jî, di serdema piştî Osmanî de di konteksta zordariyên aborî û cudahiyên çînî de ku di nav civaka kurdan de tê dîtin wate dibîne. Di civakeke ku feqîrî lê belav e de, metin, diparêze ku li hemberê neçariyên madî jî aramiya navmalî pêkan e ku bi vê awayê xurtkirina coşa civakê û piştgiriyê armanc dike. Bi berbiçavkirina rola jinê ya navmalî, normên zayenda civakî hem ji nû ve hildiberîne, hem jî di nav van rolan de xweseriyek û berpirsiyariyeke li jinê bar dike. Balkişandina li ser divêtiya bi sebirbûyîn, dilovanî û keseke bi nirxên kevneşopiyî ve girêdayî ya jinê, piştgirî dide berdewamiya pergala patriyarkal û di heman demê de hêza manewî ya navmalî ya jinê derdixe pêş.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Ziman û Şêwaz

2.1.1. Şêwaza Fêrker

Metin, bi şêwazeke fêrker û rêber hatiye nivîsandin. Nivîskar bi awayê rasterê xîtabê xwîneran (bi taybetî jinan) dike ku dîrektîfên eşkere di derbarê divê çawa tevbigerin de dide. Ev jî, hewla rewşenbîrên kurd ên serdemê ya li ser piştgiriya pêşvebirina exlaq û perwerdehiya civakî di xwe de dide der.

2.1.2. Zimanê Metaforîk

Teswîra hêrsê wek “agir” û ya sebra jinê jî wek “av”, rengeke bandorker û şiirî li metnê bar dike. Ev metaforin, rewşên pejnî şênber dike ku ev jî wê derfetê dide xwîner bikaribe peyamê bihêsantir têbigihêje.

2.1.3. Barê Hestewer

Metin, rengeke hestewer di xwe de dihewîne û empatiya xwîneran armanc dike. Berbiçavkirina divêtiya dilovanî û mihrîvanîbûna jinê, avakirina pêwendiyeke pejnî ji xwe re dike armanc.

2.2. Gotara Zayenda Civakî

2.2.1. Rola Jinê

Metin, jinê wekî hîma bingehîn a aramî û bextewariya malê bi cih dike. Pênasekirina jinê ya bi wesfên "sadeyî, dilovanî, mihrîvanî û sebr", di derbarê rolên zayenda civakî de gotareke kevnerû di xwe de dide der. Jin, wek figûra ku malbatê yekgirtî dihêle û avê li hêrsa mêrê dike tê îdealîze kirin. Ev jî, rola stabîlîzator û keda hestewar a ji aliyê pergala patriyarkal li jinê hatiye barkirin bi zelalî li ber çevan radixîne.

2.2.2. Dulibiya Jin-Mêrî

Metin, di navbera jin û mêrî de gotareke temamkeriyê ava dike. Mêr bi awayê "hêrsok" û "biheraret" tê pênasekirin, li hemberê vê jin bi wesfên "hênikahî" û "bisebir" tên bi cih kirin. Ev dulibî, li gor normên zayenda civakî ya serdemê, mêran di roleke aktîf de, jinan jî di roleke pasîf de teswîr dike. Lê bele ev, di nav malê de cureyeke serdestiyeke menewî jî li jinan bar dike.

2.2.3. Xweseriya Jinê

Metin, li ber şîretên li ser sererastkirina kiryarên navmalî yên jinan, bi awayê nerastere dipejirîne ku jin aktorên xwedîhişmend in. Berbiçavkirina divêtiya jin bi sebr û şirîniya xwe hêrsa mêrê daxîne, balê dikişîne ser hişê pejnî û rola rêvebir a jinê ya navmalî.

2.3. Gotara Sadeyî û Bextewariyê

2.3.1. Rexneya li ser Dewlemendiya Madî

Metin, diparêze ku bextewarî ne bi dewlemendiya madî, bi sedeyî û nirxên menewî dikare were bidestxistin. Di civaka kurd a wê serdemê de ku bêderfetiyên madî berbelav e. Ev gotar, xurtkirina piştgiriya civakî û bilindkirina moralê malbatên feqîr ji xwe re dike armanc.

2.4. Çarçoveya Îdeolojîk

2.4.1. Îdeolojiya Patriyarkal

Metin, rola navmalî ya jinê digre navendê û bi ser vê re îdeolojiya patriyarkal ji nû ve hildiberîne. Lê belê, bi berbiçavkirina rola menewî ya navmalî ya jinê vê îdeolojiyê nerm dike û cureyeke hêzeke endîrekt dide jinê.

2.4.2. Piştgiriya Civakî

Balkişandina xweseriya bextewariyê ji dewlemendiyên madî, piştgiriya civakî û nirxên kolektîf derdixe pêş. Ev, di nav mercên dîrokî yên civaka kurd de wek gotareke pêkhêner erkê dibîne.

2.4.3. Pendên Exlaqî

Metin, bi şêwaza rêbereke exlaqî hatiye nivîsîn û kesayetan (bi taybetî jinan) teşwîqê kiryarên xwedîerdem dike. Ev, bi hewla xurtkirina binyada exlaqî ya civakê ku ji aliyê ronakbîrên kurd ve tên kirin ve hevkêş e.

3. Encam

Metna bi navê "Jin û Bextiyariya Malê" ya rewşen Bedirxan, dema bi tehlîla naveroka dîrokî ve tê tehlîlkirin, Di civaka kurd a piştî serdema Osmanî de vekêşanên di navbera kevneşopiyan û modernbûnê de di xwe de dide der. Dema bi tehlîla gotarî ve jî tê tehlîlkirin, tê dîtin ku di metnê de rolên jinan ji aliyê pergala patriyarkal ve ji nû ve tên hilberîn, li ber vê jî di nav malbatê de otorîteyeke menewî li jinê bar dike û li hemberî dewlemendiya madî, sadeyî û piştgiriyê pîroz dike. Metin, di warê têgihiştina binemayên kulturî û civakî yên serdemê de daneyên grîng di xwe de dihewîne û hem di asta kesayetiyê, hem jî di asta civakî de pêşkeşiya rêberiya exlaqî ji xwe re dike armanc.

B. SERDEMA GEŞEDANÊN POLÎTÎK Û VEJÎNÊ (JI DESTPÊKA SALÊN 1970'Î HETA DAWIYA SALÊN 1990'Î)

Metnên ji kovarên bi navê "Devrimci Demokrat Gençlik, Medya Guneşi, Rewşen, Hevdem û Nûdem" hatine hilbijartin, di bin banê vê beşê de bi ser metodolojiya navborî re hatine vekolîn. Ji ber ku di beşa destpêkê û di beşa yekemîn de bi berfirehî li ser rewşa jina kurd û kurtedîroka weşnageriya kurd hatiye rawestîn, di vê beşê de wê rasterast li ser analîza metnên hatine hilbijartin were sekinandin.

1. DEVRİMCİ DEMOKRAT GENÇLİK

Kovara bi navê "Devrimci Demokrat Gençlik", li Stenbol û Enqereyê di sala 1978an de di binê berpirsiyariya Medeni Marşil û Selim Bakaç de, bi kurdî û tirkî li ser hev 11 hejmar derketine. Ji ber nivîs û naverokên di nav pelên kovarê de hatine weşandin kovar tê qedexekirin û mesulên kovarê bi deh salan tên cezakirin. (Malmisanij&Lewendî, 1992)

KOMALEYA JINÊN ŞOREŞGER ÊN DÎMOKRAT

(KJŞD)

Endamên Birêz yên Dîwanê, Nûnerên Bijarte yên Ciwanên Şoreşger ên Dîmokrat û Mêvanên Hêja,

Em, wekî Komeleya Jinên Şoreşger ên Dîmokrat, I. Kongreya Mezin a DDKD'yê ku bi erka birêxistinkirina karker, gundî û ciwanên xwendevan ên welatê me rabûye û vê erkê bi rêbazên têkoşînê yên di cih de, ji zêdetirî salekê ve bi serfirazî dimeşîne bicoş pîroz dikin.

Gelê me, ji hêla burjûwaziya dagirker ve bi ziman û çanda xwe ve tên asîmîlekirin, keda wî bi xedarî tê mijandin, jêderên dewlemendiyê yên binerd û sererdê welatê me têne talankirin û wêrankirin. Dema ku ciwanên me ji xwebixwe re hatine biyanîkirin û bi kultûra dejenere ya burjûwaziya dagirker hatine xemilandin ku veguherîne kesên ji pirsgirêkên welatê xwe dûr û hêmanên bêpirsiyar: DDKD wekî yekane rêxistina navendî ya welatê me hate damezirandin û DDKD ciwanên me ji bêrêxistinbûn û serberedayîtiyê rizgar kiriye. DDKD, dema ku hewl dida ciwanên me di bin sîwaneke yekgirtî de kom bike, zanistiya çîna karkeran wekî rêber ji xwe re hilbijartiye û bi têkoşîna xwe ya biryardar îspat kiriye ku, li dijî Maoîzma dij-şoreşger û hemû tevgerên maceraperest û meczûp, tekoşîna ciwanên welatê me, ji têkoşîna rizgariya neteweyî û civakî nayê veqetandin. Di rêya daxwazên demokratîk ên gelê me de, ji bo çareserkirina pirsgirêkên akademîk, aborî û kulturî yên jin û mêr temamê karker, gundî û ciwanên xwendevan, ji bo bicihanîna erkên xwe yên di têkoşîna demokratîk de hewl dide û di vê têkoşînê de cihê xwe yê rûmetdar digire. Ciwanên me, bi avêtina gavên mezin ên di rêya hevgirtina bi ciwanên cîhanê re, di ciwanên me de ji bo pêşxistina ruhê enternasyonalîst tevkariyek girîng pêk aniye.

DDKD, digel van xebatên xwe yên erênî wekî rêxistineke ciwanî, divê zêdetir girîngiyê bide birêxistinkirina jinên me yên ciwan. Eger berfirehkirina şerê Ciwanên Dîmokrat ên Şoreşger were xwestin; di vê têkoşînê de bi awayekî çalak beşdarbûna jinan wekî zarûretekê xwe bide der, wê demê di vê çarçoveyê de erkên girîng dê bikevin ser milên me. Bêguman, di warê perwerdekirina jinên me yên ciwan de, di bilindkirina asta wan a kulrturî û kişandina wan a bo qada rêxistinbûnê de, wekî rêxistinî û wekî yek bi yek takekes, erkên mezin dikevin ser milên me. Ev erk dîrokî

ye, paşvexistin an paşguhkirina vê erkê ne gengaz e. Di têkoşîna rizgariya neteweyî û civakî ya gelê me de, dem, dema beşdarkirina jinên me yên ku bi sedan sal in li gundên dûr, li zeviyan û li pişt deriyan hatine jibîrkirin e. Ji bo perwerdekirina dayik, xwişk, hevjîn û keçên me, ji bo hişyarkirina wan li hember bûyerên civakî, divê her kes erka xwe bi cîh bîne.

Eger bêyî beşdarbûna jinan rizgariya rastîn ya gelê me neyê bidestxistin, eger bêyî piştgiriya jinan hilweşandina dagirkeriyê ne pêkan be, wê demê divê jin jî ji aliyek ve têkevin nav vê têkoşînê. Bi vê wateyê, her kes divê berpirsiyariya xwe bizanibe û neçar e ku bi awayekî subjektîf erka xwe bi cîh bîne. Ev erk dê bibe ya me hemûyan. Divê neyê jibîrkirin ku berpirsiyariya vê erkê jî dîsa ya me hemûyan e. Em, wekî Komeleya Jinên Dîmokrat ên Şoreşger, di bin sîwana DDKD ya ku yekane rêxistina navendî ya ciwanên welatê me ye de hevbend dibin ku; bi şanazî û rêzdarî têkoşîna wê ya li dijî emperyalîzm, dagirkerî, faşîzm û Maoîzma dij-şoreşger pêşwazî dikin ku; Em bawer dikin ku wê biryarên ku di I. Kongreya Mezin a DDKD de werin girtin, wê rê li ber têkoşîna ciwanên welatê me vekin û qadên nû yên têkoşînê pêşkeş bikin.

Em, ji organên rêveberiyê yên ku nû werin hilbijartin re, di têkoşîna wan a di vê rêyê de serkeftinê dixwazin. (Devrimci Demokrat Gençlik, 1978: 10)

Bijî KJŞD

Komeleya Jinên Şoreşger ên Demokratîk

Şaxa Amedê

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

1.1. Tirkiyeya Salên 1970'yî û Tevgera Kurd

Metin, di sala 1978an de peyameke pirozbahî û piştgiriyê ye ku ji bo pîrozbahiya I. Kongreya Mezin a DDKD'yê hatiye nivîsîn. Di vê serdemê de DDKD wek tevgereke *"bi erka birêxistinkirina karker, gundî û ciwanên xwendevan ên welatê me rabûye"* tê pênasekirin û diyar dike ku tevger *"vê erkê bi rêbazên têkoşînê yên di cih de, ji zêdetirî salekê ve bi serfirazî dimeşîne."* Metin destnîşan dike ku gelê kurd *"ji hêla burjûwaziya dagirker ve bi ziman û çanda xwe ve tên asîmîlekirin, keda wî bi xedarî tê mijandin."* Ev, diyar dike ku metin di konteksta têkoşînê ya li hemberî

metînkariya netewî û çînî ya civaka kurd de hatiye nivîsandin. Bicihkirina DDKD'yê ya *"yekane rêxistina navendî ya welatê me"*, misyona tevgerê ya yekkirin û beralîkirina ciwanên kurd derpêş dike.

1.2. Bicihbûna Îdeolojîk û Rola DDKD'yê

Metin, diyar dike ku DDKD ciwanan ji *"bêrêxistinbûn û serberedayîtiyê rizgar kiriye"* û hewl dide ku ciwanan *"di bin sîwaneke yekgirtî de kom bike."* Sekna îdeolojîk ya tevgerê bi *"zanistiya çîna karkeran wekî rêber ji xwe re hilbijartiye"* zelal dibe û radigihîne ku li dijî *"Maoîzma dij-şoreşger û hemû tevgerên maceraperest û meczûp"* têkoşîneke bibiryar dimeşîne. Ev, diyar dike ku tevger di xeteke Marksîst-Lenînîst de diherike û ji rêbazên îdeolojîk ên din vediqete. Herwiha îfadeya *"tekoşîna ciwanên welatê me, ji têkoşîna rizgariya neteweyî û civakî nayê veqetandin"*, diyar dike ku DDKD vîzyona yekkirina têkoşînên neteweyî û çînî di xwe de dihewîne.

1.3. Pêşçavkirina Birêxistinbûna Jinan

Metin, wateyeke taybet li rola jinan a di têkoşîna şoreşger de bar dike: *"Eger bêyî beşdarbûna jinan rizgariya rastîn ya gelê me neyê bidestxistin, eger bêyî piştgiriya jinan hilweşandina dagirkeriyê ne pêkan be, wê demê divê jin jî ji aliyek ve têkevin nav vê têkoşînê."* Ev, beşdariya polîtîk a jinê ya di têkoşînê de wekî pêdiviyeke jêneger derdixe pêş. Herwiha îfadeya *"di warê perwerdekirina jinên me yên ciwan de, di bilindkirina asta wan a kulrturî û kişandina wan a bo qada rêxistinbûnê de, wekî rêxistinî û wekî yek bi yek takekes, erkên mezin dikevin ser milên me"*, di warê perwerdekirin û birêxistinkirina jinê de pêdiviya avêtina gavên şênber derdixe pêş. Ev yek, diyar dike ku DDKD di nav wê hewlê de ye ku dixwaze jinan wek failên siyasî hêzdar bike.

1.4. Pozisyona Dîrokî ya Jinên Kurd

Metin, diyar dike ku jinên kurd wek dîrokî hatine marjînalîzekirin: Diyardeya *"bi sedan sal in li gundên dûr, li zeviyan û li pişt deriyan hatine jibîrkirin"*, derpêş dike ku jin ji qadên civakî û siyasî hatine dûrxistin/derkirin. Ji bo jêborîna vê vederkirinê, pêwistiya *"perwerdekirina dayik, xwişk, hevjîn û keçên me, hişyarkirina wan a li hember bûyerên civakî"* derdixe pêş. Ev, fikra beşdariya jinan a têkoşîna rizgariya neteweyî û civakî ku wek "erkeke dîrokî" tê dîtin hêzdar dike û mîsyona

Komeleya Jinên Şoreşger ên Demokratîk a ji aliyê siyasî ve bîrewerkirina jinan li ber çavan radixîne.

2. Tehlîla Gotarî

Metna Komeleya Jinên Şoreşger ên Demokratîk, bi gotareke şoreşger, antî-kolonyal û proto-femînîst ji bo mobîlîzekirina jin û ciwanên kurd hewl dide.

2.1. Gotara Marksîst û Antî-Kolonyal

Metin, gelê kurd wek mexdûrê pergaleke mêtinkar pênase dike: *"Gelê me, ji hêla burjûwaziya dagirker ve bi ziman û çanda xwe ve tên asîmîlekirin, keda wî bi xedarî tê mijandin, jêderên dewlemendiyê yên binerd û sererdê welatê me têne talankirin û wêrankirin."* Ev gotar, gelê kurd wek gelekî "mêtinkarkirî" bi cih dike û têkoşîna rizgariya netewî di çarçoveyeke antî-kolonyal de pêşkeş dike. Pêşçavkirina diyardeya *"zanistiya çîna karkeran wekî rêber ji xwe re hilbijartiye"*, diyar dike ku metin xwe spartiye çarçoveyeke Marksîst û li hemberî mêtinkariyê rahendeke çînî ya têkoşînê derdixe pêş.

2.2. Gotara Navendparêzî û Yekîtiyê

Pênasekirina Komeleya Jinên Şoreşger ên Demokratîk wek "yekane rêxistina navendî ya welatê me", gotareke navendparêzî û yekîtiyê di xwe de dide der: Îfadeya *"dema ku hewl dida ciwanên me di bin sîwaneke yekgirtî de kom bike"*, mîsyona tevgerê ya dabînkirina yekîtî û ji holê rakirina gelemşeyiyê derdixe pêş. Daxuyaniya pêdiviya têkoşîna li dijî "Maoîzma dij-şoreşger û hemû tevgerên maceraperest û meczûp", hewla parastina sadeyîya îdeolojîk a Komeleya Jinên Şoreşger ên Demokratîk derdixe pêş û bi vederkirina rêbazên alternatîf pêşengtiya xwe meşrû dike.

2.3. Gotara Proto-Femînîst a di Derbarê Rola Jinê ya Şoreşger de

Metin, gotereke pro-femînîst ku girîngiya jinan a di têkoşîna şoreşger de derdixe pêş xurt dike: *"DDKD, digel van xebatên xwe yên erênî wekî rêxistineke ciwanî, divê zêdetir girîngiyê bide birêxistinkirina jinên me yên ciwan."* Diyar dike ku *"bi awayekî çalak"* beşdarbûna jinan a di têkoşînê de *"zarûrî"* ye û ji bo *"perwerdekirina jinên me yên ciwan, bilindkirina asta wan a kulrturî û kişandina wan a bo qada rêxistinbûnê"* berpirsiyariyên kolektîf û şexsî derdixe pêş. Lê belê,

metaforên malbatî yên wekî *"dayik, xwişk, hevjîn û keçên me"*, kêşeyeke di navbera rolên jinan ên kevneşopiyî û şoreşger de ava dike. Ev, wek hêmaneke karektera proto-femînîst a gotarê sînordar dike derdikeve pêş.

2.4. Gotara Enternasyonalîst û Hevkariyê

Metin, bi kiryarên ciwanên kurd ên wekî *"bi avêtina gavên mezin ên di rêya hevgirtina bi ciwanên cîhanê re"* û *"ji bo pêşxistina ruhê enternasyonalîst"* diyar dike ku tevkariyên girîng pêşkeş kiriye. Ev gotar, têkoşîna kurd di konteksta şoreşgeriyek gerdûnî de bi cih dike û dilsoziya li hemberî rêgezên enternasyonalîzma Marksîst derpêş dike. Ev, wateyeke gerdûnî li têkoşîna herêmî bar dike û ciwanên kurd wekî perçeyek nasnameya şoreşgeriya gerdûnî bi cih dike.

2.5. Zimanê Mobîlîzasyon û Performansê

Metin, bi îfadeyên wekî *"divê her kes erka xwe bi cih bîne"* û *"bicoş pîroz dikin"* zimaneke performansî bi kar tîne. Diyardeya *"ev erk dîrokî ye, paşvexistin an paşguhkirina vê erkê ne gengaz e"*, acîliyet û zarûreta exlaqî ya têkoşînê derdixe pêş. Hevoka *"her kes divê berpirsiyariya xwe bizanibe û neçar e ku bi awayekî subjektîf erka xwe bi cîh bîne"*, berpirsiyariya şexsî û kolektîf teşwîq dike û bi taybetî jinan vedixwîne beşdariya pêvajoya siyasî. Ev zimanê mobîlîzasyonî, mebesta metnê ya xwîneran dixwaze bilebitîne hêzdar dike.

2. 6. Kirdewariya Jinê ya Siyasî

Rola jinê ya di têkoşîna şoreşger de, yek ji temayên sereke yên metnê ye: *"Eger bêyî piştgiriya jinan hilweşandina dagirkeriyê ne pêkan be, wê demê divê jin jî ji aliyek ve têkevin nav vê têkoşînê."* Perwerdekirin û birêxistinkirina jinê, wek *"erkeke dîrokî"* tê pênasekirin û ev, bangewaziyeke ji bona wek faileke siyasî hêzdarkirina jinê derdixe pêş.

3. Encam

Metna Komaleya Jinên Şoreşger ên Dîmokrat, belgeya destpêka serdemeke ku jinên kurd di têkoşîna şoreşger de wek bikerên siyasî tên bicihkirin e. Tehlîla naveroka dîrokî, diyar dike ku metin balê dikişîne ser di têkoşîna neteweyî û çînî de rola navendî ya Komaleya Jinên Şoreşger ên Dîmokrat û girîngiya jinê ya di vê têkoşînê de derdixe pêş. Tehlîla gotarî, mebesta metnê ya bi riya gotarên antî-

kolonyal, Marksîst û proto-femînîst mobîlîzekirina ciwan û jinên kurd derdixe holê. Belam, bikaranîna metaforên malbatî, di warê wekheviya zayendî de sînordariya gotarê jî derpêş dike. Herî dawî, nivîsandina metnê ya li ser navê pîrozbahiya I. Kongreya DDKD'yê, rola weşangeriya kurd a wekî amûra belavbûna îdeolojîk û mobîlîzasyona polîtîk derdixe pêş.

2. MEDYA GUNEŞİ (1988)

Medya Guneşi, di sala 1988an de li Stenbolê, di bin berpirsîyariya Cemal Ozçelik de dest bi weşanê dike. Nivisên vê kovarê bi piranî bi tirkî bûn lê di hemû hejmarên wê de nivîsên kurdî jî hebûn. Naveroka kovarê mehane derdiket, li ser xeber û lêkolînên sîyasî bûn. Kovara Medya Guneşi, di bin şertê cunteya 12 Îlonê bi weşana xwe karekî cesurane pêk anî û piştî 12 Îlonê cara pêşîn wê di rupelên xwe de cih da zimanê kurdî. Medya Guneşî bi giştî 63 hêjmar derket. Heta sala 1992yan 15 hejmarên kovarê derketin û 48 hêjmar jî wek rojnameya du hefteyî bûn. Hemû hêjmarên kovarê tên berhevkirin û di derheqê wan de doz tê vekirin. (Malmisanij&Lewendî, 1992)

Ev metna ku ji bo tehlîlê hatiye hilbijartin di sala 1990'î de, di hejmara 13an de, ji nav metna Xezal Ararat a bi navê "Di Şerê Netewî û Civakî de Jin" hatiye hilbijartin û bûye mijara tehlîlê. Metin, bi serenava "Rewşa Jina Kurd" hatiye nivîsîn.

REWŞA JINA KURD

Rewşa welatê me yê ku di nav statuya kolonyalîzmê de ye û avahiya sosyo-aborî ya paşdemayî, wekî her beşeke pelçiqî, zordestîkirî û neheqî lê hatî kirin, mohra xwe li ser jiyana jina kurd jî xistiye. Wekî zayend binpêkirin û pelçiqandina jinê di nav civaka kurdan de bi pirsgirên taybet ên di warê paşdemayîna sosyo-kulturî, bi asta pêşketina aborî, polîtîk, civakî û kulturî re rasterast girêdayî ye. Kevneşopiyên kevnar ên bi sedsalan hatine afirandin û pêşdaraziyên çandî, di têkiliyên navbera jin û mêran de bi awayekî pir eşkere xwe nîşan didin. Jiyana civakî ya li bajaran bi nisbî hinekî pêşketîtir e, lê li gundewaran ji bo jina kurd tenê ji cendereyeke ji nirxên feodal-eşîrî pêk tê îbaret e. Avahiya malbatê ya kevneşopiyî ku li ser bingeha serweriya mêran hatiye avakirin, li gorî xwezaya xwe, bi gelemperî keçên ciwan li derveyî pêvajoya perwerdehiyê dihêle. Di hinek malbatan de li tenişta birayên ji zanîngehê derçûne, hebûna xwişkên ku xwendin û nivîsandinê nizanin,

nîşaneyek eşkere ya girîngiya ku ji keçan (a rastî ya ku nayê dayîn) ku pirê caran ji malbatê/nifûsê jî nayên hesibandin re tê dayîn e. Piraniya jinên ku xwendin û nivîsandinê dizanin, berî ku perwerdehiya xwe ya bingehîn temam bikin, neçar dimînin ku dev ji dibistana seretayî berdin. Piraniya yên ku dikarin perwerdehiya xwe bidomînin, bi gelemperî ber bi pîşeyên gelêrî yên jinê ve; mamostetî, sekreterî, dîrûnkerî û hemşîretî, têne beralîkirin. Li gundewaran, jin rasterast lê bi awayekî nedîtbar beşdarî hilberînê dibin. Jinên ku bi awayekî pir zêde beşdarî çalakiya aborî dibin, bi temamî ji serxwebûna aborî ne agahdar in. Hema hema ti mafê gotina jinan li ser bazarkirina tiştên ku di hilberîna wan de kedeke mezin dane û li ser bikaranîna dahata ku di encamê de tê bidestxistinê tune ye. Bi vî awayî, newekhevîya ku di pêvajoya hilberînê de dest pê dike, di pêvajoya dabeşkirinê de jî berdewam dike. Rola çalak a di hilberîna çandiniyê de, ku wekî dûmahiya xwezayî ya karên malê yên westîner ên rojane pêk tê, jina kurd *berî wextê xwe ji qewetê dixe.*

Piraniya mezin a jinên bajarî yên karker û memûr tevî statûya xwe ya mûçegir, nikarin ji pozîsyona xwe ya duyemîn xilas bibin. Di sala 1983'an de, hejmara giştî ya jinên karker ên sîgortekirî 6971 bû, ev jî asta pêkenînê ya ewlehiya civakî ya jina ku li Kurdistanê *dixebite nîşan dide. Eşkere ye ku li welatê me, ya ku pirsgirêkên jinan bi temamî girantir dike û rê li ber çareseriyê digire pergala newekheviya civakî û serdestiya kolonyalîst e. Car caran bi optimîzmeke zêde angaşt dikin ku cihê jina* kurd *di civakê de li gorî jinên civakên din ên paşdemayî baştir e, ku li hemberî mêran xwedî otorîteyeke veşartî ye (ji ber çi sedemê nay zanîn!) û bi mînak dayîna çend jinên ku serokatiya eşîran kirine an di nav derdora xwe de derketine pêş, îstîsnayan wekî rewşa giştî lanse dikin. Bêguman, dema bi civakên Îslamî yên fanatîk re tê berawirdkirin, rewşa jina* kurd *baştir e. Lê belê, di ehven-î şerî (di nav ên xirab de ya baş) de jî cihê xwepesînê nîn e.*

Di van salên dawî de, tevî ku lezbûna geşedana kapîtalîst, di welatekî bindest de ku saziyên serdest ên feodal eşîrî- olî bi hemû hêza xwe serwer in, bendewariya ku rewşa jinê ji rewşa welat bi gavekê pêşdetir be, bêwate ye. Eşkere ye ku heta sazûmaniya kolonyalîst neyê hilweşandin, pergala civakî ya newekhev ji holê neyê rakirin û civakeke serbixwe û demokratîk neyê avakirin, tu pirsgirêkeke civakî nikare çareseriyeke mayînde bibîne. Ji ber vê yekê, rizgariya jinê jî bi giranî bi tekoşîna rizgariya neteweyî û civakî re hemhal e. Tu berjewendiyeke jinê, bi taybetî jina

karker û gundî, di berdewamiya vê mekanîzmaya kevnare û neheqiyê çêdike de, ku wê bi zordestiyeke piralî û zulmeke nedîtî re rû bi rû dihêle, tune ye. Ev hemû zarûretên objektîf û subjektîf ên heyî ji jina kurd, *ku nîvê nifûsê pêk tîne, daxwaz dikin ku divê ew di refên pêş ên tekoşîna rizgariya neteweyî û civakî de, ku wê şertê rizgariya wê jî misoger bike, cih bigire.*

Jin ji aliyekê ve ji bo şikandina zordestiya neteweyî û çînî bi awayekî çalak beşdarî proseya veguherîna civakê dibin, ji aliyê din ve jî dê bi rêxistinbûna jina demokratîk a serbixwe, wekî cins, xwedî li pirsgirêkên xwe yên xweser derbikevin. Îro, jina kurd *ku li gelek deverên gundewarî ewqas di rewşeke zîlet de ye ku nikare bi mêran re li ser heman sifreyê rûnê, ne mimkun e ku meriv pirsgirêkên wê yên xweser piştçav bike û redkirina birêxistinbûna wê ya serbixwe û demokratîk a li ser bingeheke şoreşger dê helwesteke ne li gor rastiyê be. Di encama nirxên* hezar salan, *şêwazên tevgerê, rêgezên olî û kevneşopiyan de rewşa kêmker a ku ji aliyê jina bi xwe ve jî wekî şêwazeke jiyana xwezayî tê pejirandin, dîsa wê tenê bi destê jinê, bi têkoşîneke birêxistinbûyî ya dirêj û dijwar ku bêyî derengî dest pê kirinê dikare wê rizgar bike. Ji vî aliyî ve, tevgereke jina welatparêz-demokratîk a ku li ser bingeha pirsgirêka jinê rêxistinbûyî ye û refên xwe fireh digire, ji bo şikandina hişmendiya paşverû ya jinan jî gaveke mecbûrî ye. Ji bo ku jin bikaribe xwe bi pêş bixe, kesayetiya xwe bibîne û potansiyela xwe ya welatparêzî realîze bike, tevgereke wiha pêwîst e. Di heman demê de, bi pêvajoya jin kesayetiya xwe bibîne û xwedî li pirsgirêkên xwe derbikeve paralel, bi awayekî hê bêhtir bi hişmendî ewê bikaribe* dudiliyan *fêm bike, çareser bike, ewê mîlîtarîze bibe û di tekoşîna veguherîna civakê de cihê xwe zexmtir bike. Di rabirdûyê de û îro, partiyên siyasî yên ku armanca wan rizgariya neteweyî û civakî ya welatê me ye, her çend di bernameyên xwe de bi çend rêzikan li ser pirsgirêka jinê nivîsî be jî, di pratîkê de nikaribûne polîtîkayeke realîst û dilsoz bişopînin. Tecrûbeyên heta niha nîşan didin ku qalibên ramana ku kokên wan digihêjin dîroka bi hezaran salan, mixabin di nav şoreşgeran de jî bi hêsanî nehatine hilweşandin. Dema rapirsîn li ser pratîka têkoşîna sosyalîst a rabirdûyê tê kirin, gelek xeletî û kêmasî têne peydakirin. Di hin rewşan de, tevî ku jin bi awayekî ne kêm beşdarî tevgerên siyasî bûbin jî, nebûna wan di organên rêveberiyê û di astên* berpirsiyar de, *tenê bi kêmbûna wesfên jinan ve girêdan tiştekî deraqilane ye.*

Di nav rêxistinên ku bi serdestiya mêran hatine mohrkirin de, hin erkên ku wekî berdewema karên malê tên dîtin, an jî jinê di rewşeke pasîf de dihêlin, ji jinan re rewa hatiye dîtin. Nizanim gelo pêwîst e ku li ser jiyana taybet lêpirsîn were kirin? Tevî ku şoreşger bin jî, nayê karê tu mêrekî ji wê pozîsyona îmtîyazî ya ku îdeolojiya patriyarkal jê re mîras hiştî, red bike. Hê jî nikare were gotin ku ev rewş guherî ye. Lê belê, ji aliyekî ve behsa sosyalîzmê, wekheviyê û exlaqa bilind tê kirin, ji aliyê din ve tenê pênaseyeke pelçiqandin û astengkirina mirova jiyana xwe pê re parve dike heye: Cotstandartî. Kesekî/e ku nikaribûye xwe biguherîne soza wê/î ya veguherandina civakê wê di çi astê de pêbawer û dilsoz be?

Yên ku îdîa dikin ku, dê jiyaneke bêkedmijî li ser bingeha wekheviyê were avakirin, erkdar in ku ji niha ve di jiyana xwe ya taybet de tovên vê yekê biçînin. Her wiha, ji ber ku rizgariya civakî ne tenê mêran, jin û mêran, temamê mirovahiyê dike armanca xwe... Divê neyê jibîrkirin ku "çi bê çandin, ewê were çinîn." Rewşa reel, wekî di pirsgirêkên din ên şoreşa neteweyî ya demokratîk de, di pirsgirêka jinê de jî, hewce dike ku xeletî û kêmasî bêne vekolandin û rêgezeke saxlem û hevgirtî bê şopandin. Wekî ku tê zanîn, eger maf û daxwazên beşeke ku di nav têkiliyên newekhev de cih digire neyên ronîkirin, çareseriyên li gorî rewşa wê ya taybet neyên pêşkêşkirin û rêbazên têkoşînê neyên diyarkirin, têkoşîna ku tê îddiakirin ku dê her du alî jî ber bi rizgariyê ve bibe, di encamê de berdewamiya heman rewşa hiyerarşîk bi xwe re tîne. Têgihiştina pirsgirêkê bi paş de xistinê, bêçareserî an jî çareseriyeke kêm û nîvco bi xwe re tîne. Di pirsgirêka jinê de, ji bo avakariya hişmendiyeke hevdem û ji bo ev hişmendî hêdî hêdî belav bibe û bi cih bibe, beriya ku desthilatî bê bidestxistin û piştî bidestxistina wê jî gelek tişt hene ku bêne kirin. Di vê yekê de jî erka bingehîn dikeve ser milê jinên pêşeng ên bi hişmendî û biryardar. Ji ber ku dîrok hîna jî nebûye şahid ku zordar, kesên di bin zordestiyê de rizgar kiriye an jî ji rizgariya wan re pêşengiyê kiriye. Pêwîstî bi hebûna tevgereke jinan heye ku bi awayekî rêxistinî serbixwe be, lê di warê îdeolojîk de rizgariya civakî û zanistiya wê wekî rêber bigire; piştgirî bide rizgariya neteweyî û bi xwe di nav vê de cih bigire, û li ser bingeha pirsgirêkên taybet ên jinan rêxistinbûyî be, xwedî xwezaya rêxistineke girseyî ya demokratîk be. Bêguman bingeha rêxistineke wisa bi giranî dê ji aliyê jinên kedkar ên kurd ên bindest, zordestîkirî û di bin zordariya sêalî de mane, pêk were.

Erka ku dikeve ser tevgerên siyasî jî ev e ku; bi awayekî ku zirarê nede serxwebûna rêxistineke wisa, têkiliyên saxlem pê re deynin, kadroyan jê werbigirin û kadroyan bidin, û bi vî awayî avahiya wê ya îdeolojîk a xwedî ruhê şoreşgerî biparêzin. Di dîroka têkoşîna hema bêje hemû welatên ku rizgariya xwe ya neteweyî û civakî pêk anîne an jî di vê rêyê de gavên girîng avêtine de, cihê rêxistinên jinan ên bi vî rengî neçarî bûye û erkên girîng bi cih anîne. Tenê bi vî awayî dikarin potansiyela mezin a jinan, ku rizgariya xwe bi rizgariya civakî re bi hev ve dibîne, çalak bikin. Bi vî rengî, jinên ku bi hişmendiya pirsgirêka xwe bi awayekî çalak beşdarî têkoşîna avakirina civakeke azad û nayê talankirin dibin. Di nav rêxistinê de li şûna cihê wan ên ji berê ve ne zelal, dibin xwedî ciheke bi kesayetî û bi rûmet. Gava ku jin di her qonaxa xebata rêxistinî de li gorî wesfên xwe berpirsiyarî û înîsiyatîfê wergirt, di biryarên heyatî de bûn şirîk, tevî ku demokrasiya nav rêxistinê pêş bixe; di heman demê de wê hêz û dînamîzmê jî bide avahiyên rêxistinî. Gelo kesek heye ku pêdiviya wî/ê bi vê yekê tune be? (Ararat, 1990: 44-45)

Xezal ARARAT

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

Ev metin, ji nav metna Xezal Ararat a bi navê "Di Şerê Netewî û Civakî de Jin" hatiye hilbijartin û bûye mijara tehlîlê. Metin, bi serenava "Rewşa Jina Kurd" hatiye nivîsîn. Metna navborî, rewşa sosyo-ekonomîk, mercên kulturî û siyasî ya jinên kurd di konteksta feodalîzm û mêtinkariyê de dinirxîne, xilasiya jinan bi hevgirêdana têkoşîna netewî û civakî ya yekpare re dibîne.

1.1. Konteksta Dîrokî û Temayên Sereke

1.1.1. Bandora Feodalîzm û Mêtinkariyê

Metin, diyar dike ku civaka kurd ji ber *"Rewşa welatê me yê ku di bin statûya kolonyalîzmê de ye û avahiya sosyo-aborî ya paşdemayî"* tê pelçiqandin. Ev vegotin, amaje bi serdema ku li Tirkiyeyê di salên 1990'î de têkoşîna PKK'yê ya çekdarî ku gotara rizgariya netewî xurt dike, û serdema ku lê meseleya kurd bi kûrahî tê nîqaşkirin dike. Vegotina *"Wekî zayend binpêkirin û pelçiqandina jinê di nav civaka Kurdan de bi pirsgirên taybet ên di warê paşdemayîna sosyo-kulturî, bi asta pêşketina aborî, polîtîk, civakî û kulturî re rasterast girêdayî ye"*, têkiliya pelçiqîna jinan rasterast bi feodalîzm û mêtinkariyê re datîne. Ev diyarde, bandora di dawiya

salên 1980'î û destpêka salên 1990'î de li herêmên ku kurd lê dijîn, paşdemayîna sosyo-ekonomîk û polîtîkayên dewletê di xwe de dide der.

1.1.2. Neyeksaniya di Perwerdeyê de

Metin, bi vegotinên wekî *"avahiya malbatê ya kevneşopî ku li ser bingeha serdestiya mêran hatiye avakirin, li gorî xwezaya xwe, bi gelemperî keçên ciwan li derveyî pêvajoya perwerdehiyê dihêle"* û *"li tenişta birayên ji zanîngehê derçûne hebûna xwişkên ku xwendin û nivîsandinê nizanin"* Astengiyên li pêşiya xwegihîştina perwerdeyê yên keçikên li herêmên gundewar ên kurd, tîne ziman.

1.1.3. Nebînayiya Aborî û Kedê

Metin bi vegotinên, jin li herêmên gundewar *"rasterast lê bi awayê nebînayî beşdarê hilberînê dibin"* û *"haya wan ji xweseriya aborî jî tune ye"*, rola keda jinê ya di hilberîneriya çandiniyî de derdixe pêş. Vegotina *"Hema hema ti mafê gotina jinan li ser bazarkirina tiştên ku di hilberîna wan de kedeke mezin dane, û li ser bikaranîna dahata ku di encamê de tê bidestxistinê tune ye"* di salên 1990'î de li herêmên kurdewar, di aboriya çandiniyê de rewşa keda jinê ya tê binpêkirin derpêş dike. Her wiha îfadeyên *"nikarin ji pozîsyona xwe ya duyemîn xilas bibin"* û daneya "*Di sala 1983'an de, hejmara giştî ya jinên karker ên sîgortekirî 6971 bû"*, kêmasiya temînata sosyal û di hêza xebatê de temsîliyeta sînordar a jinan derpêş dike. Ev dane, di salên 1980'î de bandora polîtîkayên neolîberal ên li ser keda jinan di konteksta dîrokî de dide rûniştin.

1.1.4. Temsîliyeta Jinan a Siyasî û Birêxistinbûn

Metin, pêdivî bi *"tevgereke jin a welatparêz-demokratik ku xwedî refên berfireh û di bingeha pirsgirêka jinê de xwe birêxistin kiriye"* dibîne. Ev jî, di salên 1990'î de rastê serdema avbûna birêxistinên jinên kurd tê. Lê belê rexneya *"Di rabirdûyê de û îro, partiyên siyasî yên ku armanca wan rizgariya neteweyî û civakî ya welatê me ye, her çend di bernameyên xwe de bi çend rêzikan li ser pirsgirêka jinê nivîsî be jî, di pratîkê de nikaribûne polîtîkayeke realîst û dilsoz bişopînin"* sînordariya temsîliyeta jinê ya di nav tevgerên kurd de derpêş dike. Ev, di salên 1980'î û 1990'î de domdariya serweriya patriyarkal a tevgerên çep ên li Tirkiyeyê berbiçav dike.

1.2. Referansên Dîrokî

Metin, bi vegotina xwe ya *"kevneşopiyên kevnar ên bi sedsalan hatine afirandin û pêşdaraziyên çandî"* bandora li ser jinan a saziyên feodal ên ji Osmanî heta Komarê dirêj bûne derdixe pêş. Vegotina *"Bêguman, dema bi civakên Îslamî yên fanatîk re tê muqayesekirin, rewşa jina Kurd baştir e",* di salên 1990'î de berawirdkirina meyla sekûler a civaka kurd bi civakên Rojhilatanavîn re perspektîfeke dîrokî pêşkeş dike. Diyardeya *"di sala 1983'an de, hejmara giştî ya jinên karker ên sîgortekirî 6971 bû"* diyar dike ku metin xwe dispêre rastiyên dîrokî û piştgirî ji daneyên fermî girtiye. Ev, di salên 1980'î de sînordariya polîtîkayên aborî ya di warê beşdariya jinan a hêza xebatê de, bi awayê tarixî piştrast dike.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Hêmanên Bingehîn yên Gotarê

2.1.1. Gotara Tadeyî ya Pevgînî (intersectionality)

Metin, bi derpêşkirina îfadeya *"jinên kurd di bin zordestiyeke piralî û zulmeke deraqilane de ne"*, pevgîna pelçiqandinên di bingeha zayend, çîn û nasnameya nijadî de pêk tên îfade dike. Îfadeya *"Rewşa welatê me yê ku di nav statuya kolonyalîzmê de ye û avahiya sosyo-aborî ya paşdemayî, wekî her beşeke pelçiqî, zordestîkirî û neheqî lê hatî kirin, mohra xwe li ser jiyana jina kurd jî xistiye"* bandora mêtinkariyê û feodalîzmê ya li ser jinan bi hev re girê dide. Hevoka *"Eşkere ye ku li welatê me, ya ku pirsgirêkên jinan bi temamî girantir dike û rê li ber çareseriyê digire pergala newekheviya civakî û serdestiya kolonyalîst e"* vê pelçiqandina pevgînî li ser çarçoveyeke sîstemî dide rûniştin. Ev gotar, pirsgirêkên xweser ên jinan bi perspektîfeke femînîst derdixe pêş.

2.1.2. Rexneya Patriyarkal

Metin, hem domdariya binyatên patriyarkal ên kevnerû hem jî yên li qada siyasî rexne dike. Diyardeyên *"Avahiya malbatê ya kevneşopiyî ku li ser bingeha serweriya mêran hatiye avakirin"* û *"Jiyana civakî ya li bajaran bi nisbî hinekî pêşketîtir e, lê li gundewaran ji bo jina Kurd tenê ji cendereyeke ji nirxên feodal-eşîrî pêk tê îbaret e"* li qadên gundewar û bajarî dirfên cihêreng ên tadeyiya patriyarkal dide der. Her wiha diyardeya *"tevî ku şoreşger bin jî, nayê karê tu mêrekî ji wê*

pozîsyona îmtîyazî ya ku îdeolojiya patriyarkal jê re mîras hiştî, red bike", serweriya mêran a di tevgerên şoreşger de rexne dike. Hevoka *"Lê belê, ji aliyekî ve behsa sosyalîzmê, wekheviyê û exlaqê bilind tê kirin, ji aliyê din ve tenê pênaseyeke pelçiqandin û astengkirina mirova jiyana xwe pê re parve dike heye: Cotstandartî"*, vê rexneyê sor dike ku dudiliyên di nav tevgerên şoreşger de îfşa dike.

2.1.3. Bangewaziya Birêxistinbûna Xweser a Jinan

Metin, bi *gotara "Jin ji aliyekê ve ji bo şikandina zordestiya neteweyî û çînî bi awayekî çalak beşdarî proseya veguherîna civakê dibin, ji aliyê din ve jî dê bi rêxistinbûna jina demokratîk a serbixwe, wekî cins xwedî li pirsgirêkên xwe yên xweser derbikevin",* pêwistiya hebûna tevgereke jin a xweser diparêze. Diyardeya *"tevgereke jina welatparêz-demokratîk a ku li ser bingeha pirsgirêka jinê rêxistinbûyî ye û refên xwe fireh digire, ji bo şikandina hişmendiya paşverû ya jinan jî gaveke mecbûrî ye",* balê dikişîne ser pêvajoya jinan a xurtkirina hişmendiya xwe û failbûna wan. Hevoka *"Di encama nirxên hezar salan, şêwazên tevgerê, rêgezên olî û kevneşopiyan de rewşa kêmker a ku ji aliyê jina bi xwe ve jî wekî şêwazeke jiyana xwezayî tê pejirandin, dîsa wê tenê bi destê jinê, bi tekoşîneke birêxistinbûyî ya dirêj û dijwar ku bêyî derengî dest pê kirinê dikare wê rizgar bike"*, destnîşan dike ku rizgariya jinan tenê bi têkoşîna wan re pêkan e. Ev, bi derketina di salên 1990'î de rêxistinên jinan re paralel e.

2.1.4. Îmaja Jinê ya Şoreşger û Şervan

Metin, jinên kurd ne wekî qurbaniyên pasîf, wek failên çalak bi cih dike. Diyardeya *"Ev hemû zarûretên objektîf û subjektîf ên heyî, ji jina Kurd ku nîvê nifûsê pêk tîne, daxwaz dikin ku divê ew di refên pêş ên tekoşîna rizgariya neteweyî û civakî de, ku wê şertê rizgariya wê jî misoger bike, cih bigire"*, jinan wek pêşengên têkoşîna şoreşger pênase dike. Hevoka *"Di heman demê de bi pêvajoya jin kesayetiya* xwe *bibîne û xwedî li pirsgirêkên xwe derbikeve paralel, bi awayekî hê bêhtir bi hişmendî ewê bikaribe dudiliyan fêm bike, çareser bike, ewê mîlîtarîze bibe û di tekoşîna veguherîna civakê de cihê xwe zexmtir bike",* potansiyela milîtanbûn û failbûna jinan derdixe holê.

2.2. Bicihbûna Îdeolojîk a Gotarê

2.2.1. Gotara Netewperwer û Çînî

Îfadeya *"Eşkere ye ku heta sazûmaniya kolonyalîst neyê hilweşandin, pergala civakî ya newekhev ji holê neyê rakirin û civakeke serbixwe û demokratîk neyê avakirin, tu pirsgirêkeke civakî nikare çareseriyeke mayînde bibîne"*, felata netewî bi perspektîfeke sosyalîst re dike yek. Hevoka *"Ji ber vê yekê, rizgariya jinê jî bi giranî bi tekoşîna rizgariya neteweyî û civakî re hemhal e"*, jî têkoşîna jinê bi têkoşîna netewî û çînî re dike yek.

2.2.2. Gotara Rexneyî

Bi rêya îfadeyên *"Dema rapirsîn li ser pratîka tekoşîna sosyalîst a paşerojê tê kirin, gelek xeletî û kêmasî têne peydakirin"* û *"Di hin rewşan de, tevî ku jin bi awayekî ne kêm beşdarî tevgerên siyasî bûbin jî, nebûna wan di organên rêveberiyê û di astên berpirsiyar de, bi tenê bi kêmbûna wesfên jinan ve girêdan tiştekî deraqilane ye"*, di tevgerên şoreşger de kêmasiya temsîliyeta jinan tê rexnekirin.

2.3. Stratejiyên Gotarî û Pêwendiyên Hêzdariyê

Metin, jinên kurd hem wek "kesa tê pelçiqîn" hem jî wekî "faileke hêzdar" teswîr dike. Îfadeya *"Îro, jina kurd ku li gelek deverên gundewarî ewqas di rewşeke zîlet de ye ku nikare bi mêran re li ser heman sifreyê rûnê"* qelsiya mewcûd derdixe pêş, pêşniyariya "di her qonaxa xebata rêxistinî de li gorî wesfên xwe girtina berpirsiyarî û înîsiyatîfê û şirîkbûna di biryarên heyatî de", potansiyela hêzdarbûna jinan derdixe pêş. Îfadeya "*bi pêşkeşiya angaştên wekî…car caran bi optimîzmeke zêde angaşt dikin ku cihê jina Kurd di civakê de li gorî jinên civakên din ên paşdemayî baştir e… îstîsnayan wekî rewşa giştî be lanse dikin"* mesafeyek rexneyî dike navbera xwe û gotara cihê baştir a îzafî. Bi *hevoka "Lê belê, di ehven-î şerî (di nav ên xirab de ya baş) de jî cihê xwepesînê nîn e"* vê rexneyê teqez dike.

3.Encam

Metna Xezal Ararat a bi navê "Rewşa Jina Kurd", di çarçoveya tekoşîna kurd û jinan a salên 1990'î de, diyar dike ku jinên kurd di bin "statûya kolonyal", "nirxên feodal-eşîrî" û "tadeyiya piralî" de têne çewisandin, lê bi gotinên wekî "rêxistina demokratîk a jinan a serbixwe" û "pêşengên tekoşîna rizgariya neteweyî û civakî",

jinan wekî faileke şoreşger bi cih dike. Analîza naveroka dîrokî nîşan dide ku ev nivîs şert û mercên sosyo-aborî û siyasî yên salên 1980 û 1990'î (mînak, "di sala 1983'an de hejmara jinên karker ên sîgortekirî 6971 bû") vedibêje; analîza gotarî jî diyar dike ku gotarên femînîst, netewperwer û çînî bi awayekî têkelî hatine bikaranîn. Nivîs, bi rexneya "cot standartî", nakokiyên navxweyî yên tevgerên şoreşger eşkere dike, û bi banga "dîtina jinê ya dîtina kesayetiyaxwe", wekî metneke pêşeng a tevgera jinên kurd derdikeve pêş. Ev analîz diyar dike ku vê nivîsê di salên 1990'î de, di rojname û kovarên kurdî de temsîliyeta jinan xurt kiriye û herwiha xwedî karaktereke manîfestoyî ye.

3. REWŞEN (1992)

Rewşen, di binesazîya Navenda Çanda Mezopotamyayê di sala 1992an de, di bin berpirsîyarîya İbrahîm Gurbuz û Edîbe Şahin li Stenbolê dest bi weşana xwe kir. Rewşen, Kovarek mehane bû û bi kurdî û tirkî derdiket. Rewşen di sala 1997an de navber da weşana xwe û paşê cardin ji alîyê heman sazîyê bi navê Jiyana Rewşen wek dewama Rewşenê derket. Jiyana Rewşen jî wek Rewşenê kovarek çandî, hunerî û wêjeyî bû. Bi perîyoda mehane li Stenbolê derket. Ev kovar, heta navîna sala 2002'yan di bin berpirsîyarîya Kawa Nemir 51 hejmar weşîya. Piştî girtina wê bi demeke kurt bi navê Rewşen-name, dîsa di bin edîtorîya Kawa Nemir de dest bi weşanê kir. Lê ev kovar bi vî şiklî tenê sê hejmar derket û bi vî awayî kelepora Rewşenê ya ku ji sala 1992yan vir de dewam dikir, bi dawî bû. (Acar, 2010)

Ev metna ku ji kovara Rewşenê hatiye hilbijartin, di sala 1993an de, di hejmara 9an de, bi îmzeya Adar Jiyan bi serenavê "Ey Jina Kurd" hatiye weşandin.

EY JINA KURD

Bi xîret î pir bi ar î

Fedakar î ey jina Kurd!

Him dayîk î tu him yar î

Cefakar î ey jina Kurd!

Him karker î him kevan î

Tu rencber û palewan î

Li serê çiya Berîvan î

Tu şerwan î ey jina Kurd!

Ji zaroka ra dê û bav î

Tu ji me re çav û gav î

Bi şewq û rohnî û tav î

Tu jiyan î ey jina Kurd!

Bejn zirav î por dirêj î

Him sazbend î him dengbêj î

Li vê halê me dibêjî

Tu mizgîn î ey jina Kurd!

Keça rind, bi bisk û kez î

Tim li pêşiya gel dilezî

Ji bo azadî dibezî

Tu hêvî yî ey jina Kurd!

Reng zelal, wek heba tirî

Dev li ken, gula vekirî

Bi wê zarê xwey şekirî

Tu şêrîn î ey jina Kurd!

Têşîrês î dolabvan î

Tu nanpêj û tenûrvan î

Tu dilsoz û dilovan î

Tu şahî yî ey jina Kurd!

Ji dijmin bi kîn û hêrs î

Êdî li halê xwe dipirsî

Ji mirinê tu natirsî

Tim li kar î ey jina Kurd!

Tu serkêş î we pêşrewan î

Tu şer dikî bi pêlewanî

Şehîd dibî bi qehremanî

Tu namirî ey jina Kurd!

Tu şerwan î we şoreşger î

Tu çekdar î serleşker î

Ji bo welêt te da serî

Tu şehîd î ey jina Kurd!

Heya bê bes zehmetkêş î

Ji dozê ra bi dilêş î

Serî hilda tim li pêşî

Tu rêber î ey jina Kurd!

Daw-dêlê te yê hilkirî

Şer li ku be tu li wir î

Li ber gula singvekir î

Canfeda yî ey jina Kurd!

Tu pir jîr û şareza yî

Ne kole yî serbixwe yî

Tu rûmeta gelê me yî

Bi huner î ey jina Kurd!

Nikarim bidim pesnê te

Hemû huner tê ji destê te

Xwar dibim li ber şexsê te

Tu hêja yî ey jina Kurd! (Jiyan, 1993: 1)

Adar Jiyan

1.Tehlîla Naveroka Dîrokî

1.1. Konteksta Dîrokî

1.1.1. Meseleya Kurd û Tirkiyeya Salên 1990'î

Salên 1990'î, li Tirkiyeyê tevgera kurd hem ji aliyê polîtîk ve hem jî ji aliyê têkoşîna çekdariyê ve zêdetir dertê pêş. Kiryarên PKK'yê (Partiya Karkerên Kurdistanê), şerên bi dewletê re û zêdetir berbiçavbûna nasnameya kurd a li qada giştî taybetmendiyên bingehîn ên vê serdemê ne. Jinên kurd, di van salên navborî de ji sînordariya rolên kevnerû wêdetir, di tekoşîna polîtîk û leşkerî de aktîf rol girtine. Di vê kontekstê de helbest hem rolên jinê yên kevneşopiyî hem jî nasnameya wê ya şervan pîroz dike. Bi referansa van risteyan "*Tu şerwan î we şoreşger î", "Tu çekdar î serleşker î"* ev yek tê piştrastkirin.

1.1.2. Rola Jinan

Di salên 1990'î de di nav tevgerên kurd de girîngiya jinan xurt dibe. Jin, hem di şervaniyê de hem jî di qadên sosyal û kulturî de berpirsiyariyên pêşengtiyê wergirtine ser milên xwe. Bi referansa van risteyan "*Tu serkêş î we pêşrewan î / Tu şer dikî bi pêlewanî, şehîd dibî bi qehremanî"* tê dîtin ku metin vê veguherînê di xwe de dide der, her wiha piralîbûna nasnameya jina kurd derpêş dike.

1.2. Temayên Dîrokî yên Helbestê

1.2.1. Nasnameya Piralî

Metin, rolên gelêrî (dê, kevanî, cotkar, berîvan) yên jina Kurd û rolên nûjen û milîtan (şervan, şoreşger, pêşeng) bi hev re girê dide. Risteyên mîna "*Him dayîk î tu him yar î, / Cefakar î ey jina Kurd!"*, "*Him karker î him kevan î" û "Tu serkêş î we pêşrewan î", "Tu şerwan î we şoreşger î"* vê nasnameya piralî pêşçav dikin. Ev jî diyar dike ku di salên 1990'î de jinên Kurd ji normên zayenda civakî xwe rizgar kirine û di qada polîtîk de aktîf rol girtine.

1.2.2. Berxwedêrî û Têkoşîn

Metin, rola jinên kurd a di têkoşîna neteweyî de pîroz dike. Ev risteyên rêzkirî *"Ji dijmin bi kîn û hêrs î / Êdî li halê xwe dipirsî"* û *"Ji bo welêt te da serî / Tu şehîd î ey jina Kurd!",* di têkoşîna xweseriyê de fedakarî û wêrektiya jinê derdixin pêş. Ev jî di atmosfera şerên salên 1990'î de rola jina kurd a sembolîk û rasteqîn berbiçav dike.

1.2.3. Berxwedana Kulturî

Metin, balê dikişîne ser rola jina kurd a veguhêzî û parêziya mîrasa kulturî. Risteya *"Him sazbend î him dengbêj î / Li vê halê me dibêjî"* detnîşan dike ku jina kurd bi rêya huner û destanan dîrok û nasnameya kurd veguhêzandiye. Ev jî, di wê serdema ku kûltûr û zimanê kurdî di bin zextan de ne rengeke berxwedana kulturî ye.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Ziman û Retorîk

2.1.1. Îdealîzasyon û Pesn

Helbest, ji bo pirîzkirina nasnameya piralî ya jina kurd bi zimaneke bicoş û çilwerî hatiye hûnandin. Îfadeyên wek *"Tu pir jîr û şareza yî /Fedakar î ey jina Kurd" û "Tu hêvî yî ey jina Kurd"* jinê wekî remz û leheng îdealîze dike. Ev jî mebesta avakariya nasnameyê û bilindkirina morala kolektîf di xwe de dihewîne.

2.1.2. Xîtab û Dubare

Di her çarînê de dubareya îfadeya "Ey jina Kurd", hem hêza xîtabê xurt dike hem jî bala xwîner dikişîne ser rola jinê ya navendî. Ev dubarekirin, hewayeke dirûşmî an jî manifestoyî li helbestê bar dike û bangeke keolektîf diafirîne.

2.1.3. Metaforên Estetîkî û Xweza

Helbest, bi îmajên xwezayî zelalî û xweşikiya jinê derdixe pêş. Risteyên mîna *"Reng zelal, wek heba tirî / Dev li ken, gula vekirî / Bi wê zarê xwey şekirî"* hem xweşikiya jinê ya fîzîkî hem jî ya menewî îdealîze dike. Ev jî, wê derfetê dide ku jin wek remzeke estetîkî bi cih bibe.

2.1.4. Metaforên Şer û Berxwedêrî

Diyardeyên wekî "*Li ber gula singvekir î" û "Tu çekdar î serleşker î",* destnîşan dike ku jin ji figûraniya pasif derketiye û bûye şervaneke aktîf. Ev, diyardeyeke hêzdar a gotara femînîst e.

2.2. Gotara Îdeolojîk

2.2.1. Netewperweriya Kurd

Helbest, bi destnîşankirina rola jinê ya di têkoşîna neteweyî de gotareke netewperwer diafirîne. Bi van rêzan "*Ji bo welêt te da serî / Tu şehîd î ey jina Kurd!",* fedakariya jinê ya ji bo doza netewî tê pîrozkirin.

2.2.2. Gotara Femînîst

Helbest, bi parastina xweserî û pêşengtiya jinê gotareke femînîst derpêş dike. Risteyên wekî *"Ne kole yî serbixwe yî" û "Serî hilda tim li pêşî"* diyar dike ku jina

kurd, xwe ji normên zayenda civakî bihûriye û di têkoşîna azadî û wekheviyê de bûye pêşeng.

2.2.3. Avakariya Nasnameya Kolektîf

Îfadeyên wekî "*Tu rûmeta gelê me yî"* û *"Tu ji me re çav û gav î"* diyar dike ku, jina kurd ji figûreke şexsî wêdetir remzeke kolektîf e. Jin, wekî hêvî, rûmet û pêşeroja gel tê bi cih kirin.

3.Encam

Helbesta Adar Jiyan a bi navê "Ey Jina Kurd", di sala 1993an de di konteksta sosyo-polîtîk de, metnekê edebî û polîtîk e ku nasnameya piralî ya jina kurd bi awayek xurt pîroz û bilind dike. Tehlîla naveroka dîrokî, destnîşan dike ku helbest bi xurtbûna tevgera kurd a salên 1990'î, bi belavbûna rola jinê û bi berxwedana çandî re girêdayî ye. Analîza gotarî, derpêş dike ku helbest bi rêya temayên pesn, têkoşîn û berxwedanê, jina kurd hem mîna remzeke şexsî hem jî mîna remzeke kolektîf ava dike. Referansên navmetnî, piştrast dike ku helbest bi rêya hevgirêdana gotarên femînîst û netewperwer jina kurd hem bi rolên kevnerû hem jî bi rolên nûjen pîroz dike. Helbest, hem wekî berhemeke edebî hem jî wekî manifestoyeke li gor rihê polîtîk ê serdemî erk dibîne.

4. NÛDEM

Nûdem, kovareke demsalî û bi kurdî ye. Xwedî û berpirsiyarê kovara Nûdemê Firat Cewerî ye. Di 1'ê Kanûna 1992an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiriye. Kovarek hunerî, wêjeyî û çandî ye. Hejmara wê ya dawiyê di sala 2001an de hatiye weşandin û bi temamî ji 40 hejmaran pêk tê.

Armanca kovarê, di hejmara yekem a kovarê de bi vê awayê tê veguhestin: Armanca wê ya sereke ew e ku di rêya gel de be, ji bo vejandina zimanê kurdî û ji bo pêkanîna edebiyata kurdî ya nûjen bibe bingeh. Bi qasê ku Firat Cewerî radigihîne, wê kovara "NÛDEM" bi kurtasî ji van celebnivîsan pêk tê: Çîrok, helbest, perçeroman, rexne, hevpeyivîn, lêkolîn, werger, edebiyata dinyayê ya modern û klasik, klasikên kurdî, xelatên navneteweyî, sînema, tiyatro, nivîsên li ser edebiyat, huner û kulturê, wêne, karîkator û hwd. Ji bilî van jî bêyî ku em ji çarçeva kovarê bi

dûr kevin, em ê bikaribin di pêşerojê de hin nivîsan lê kêm, an jî lê zêde bikin. (Nûdem, 1992)

Ji bo tehlîlê ji kovara Nûdemê bi tevahî 2 metin hatine wergirtin. Metna yekem di hejmara kovarê ya 13an de bi sernava "Bixwîne Jinê" ji aliyê Keça Kurd ve hatiye nivîsandin. Metna duyem jî di hejmara kovarê ya 26an de bi sernava "Di Civatê de Wekheviya Jin û Mêran" bi îmzeya Bekir Şahîn Soreklî hetiye weşandin.

a. BIXWÎNE JINÊ

Tu hînê ziman be bixwîne jinê

Nemîne nezan û li jorê tenê

Bixwîne, bibîne tu wan gewhera

Ji xeml û ji xêzan, ji bejna te ra

Bibîne li nexşê welat û gela

Bi xame bihûne li nav rûpela

Bi xame birêse li ser wan kesa

Çeleng û leheng û li ser fêrisa

Bixwîne li cîhan, li Vêtnam binêr

Keça xwendevan û çeleng û dilêr

Bi ceng û bi lêdan li rêça welat

Bi xwendin, bi zanîn çi rengê xebat

Bi rengê xebatê nego: Ez keç im

Li pêşya kura go divê ez biçim

Li şar û li gunda, li şax û şikeft

Li piştê girêda tiveng û du rext

Li pêş top û tangan diçûn lek bi lek

Di sînga xwe çandin gule pir gelek

Keça xwendevan wê li gel gundiya

Dikêla, dikola, genim çandiya

Bi qîr û bi hêrza li pêş dabezî

Li ser mêja dijmin civandin kezî

Didan xwîn û can, wê nego ev çi ye!

Bi saz û bi awaz digo partî ye!

Bi kêşa xwe anî ewê bawerî

Bi nîşan wê danî welatperwerî

Keça Kurd mebe hemdemê paşverû

Jiyan her li goran diçê pêşverû

Li gerdûn binêre li dê û keçê

Li gel pêşveçûn, gav bi gav ew diçê

Ji oda tenê, reştarî derkeve

Li jêr sêbera naskirin rakeve

Bi nasîn û zanîn dibî çavşiyar

Ji bo her kesî tu dibî şengeyar. (Keça Kurd, 1995: 75-76)

KEÇA KURD

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

1.1. Konteksta Civakî û Polîtîk a Serdemê

1.1.1. Têkoşîna Azadiyê ya Kurdan

Di salên 1990'î de, li Tirkiyeyê tevgera kurd hem ji aliyê tekoşîna siyasî ve hem jî ji aliyê tekoşîna çekdariyê ve pêlên xwe berfirehtir dike. Ji nû ve pênasekirina nasnameya kurdan û berxwedana kulturî di van salan de li pêş çav in. Helbest, bi referansa *"li piştê girêda tiveng û du rext" û "li pêş top û tangan diçûn lek bi lek"* di nav vê tekoşînê de cihê aktîf ê jinê derdixe pêş.

1.1.2. Rola Civakî ya Jinan

Di salên 1990'î de jinên kurd, ji rolên zayendî yên civakî yên kevnerû wêdetir ti tekoşîna siyasî û kulturî û di tekoşîna çekdarî de rolên aktîf wergirtine ser xwe. Helbest, jina kurd wek figûreke perwerdekirî, wêrek û welatperwer îdealîze dike û vê veguherînê pîroz dike.

1.2. Peyama Dîrokî ya Helbestê

1.2.1. Bîrewerbûn û Perwerdehî

Risteyên *"Tu hînê ziman be bixwîne jinê / Nemîne nezan û li jorê tenê"* rola perwerdehiyê ya krîtîk a ku di bilindkirina statûya civakî ya jinan de berbiçav dike. Di salên 1990'î de di civaka kurdan de perwerde, bi taybetî ji bo jinan, di warê serxwebûn û avakariya nasnameyê de wek amûreke grîng dihate dîtin. Metin, jinan ber bi agahiyê û bîreweriyê beralî dike û bi ser vê jî wan teşwîqê veguherîna civakî dike.

1.2.2. Fedakarî û Welatparêzî

Risteyên wek *"Didan xwîn û can, wê nego ev çi ye!",* tê dîtin ku jinên kurd ji bo welatê xwe di warê fedakariyê de ji aliyekî ve jî xwe paş de nedane. Ev jî, rihê berxwedan û fedakariya tekoşîna serdemê di xwe de dide der û jinan li navenda vê tekoşîne bi cih dike.

1.2.3. Wekhevî û Veguherîna Civakî

Bi referansa *"bi rengê xebatê nego: Ez keç im"* û *"li pêşya kura go divê ez biçim"* tê dîtin ku di tekoşînê de jin jî bi awayê wekhev bi mêran re dikarin cih bigrin û heta dikarin pêşengtiyê jî bikin. Ev, peyameke reformîst e ku di civaka kurd de jinan teşwîqê beşdariya tekoşîna wekheviya civakî dike.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Ziman û Şêwaz

2.1.1. Şêwaza Bicoş û Epîk

Helbest bi zimanekî bicoş hatiye hûnandin û xwedî toneke epîk e. Bi risteyên wek *"Bi ceng û bi lêdan li rêça welat"*, rihê tekoşînê tê pîrozkirin û xwîner tên motîvekirin. Ev, bangewaziyeke li gorî atmosfera siyasî ya serdemê ye.

2.1.2. Dubarekirina Bêjeyan

Dubareya lêkera "xwendinê", balê dikşîne ser girîngiya perwerdeyê û bandoreke fêrker ava dike. Ev, resterast armanc dike ku peyameke rabigihîne xwîner û jinan sewqê fêrbûnê bike.

2.1.3. Zimanê Remzî û Metaforîk

Îfadeyên mîna *"di sînga xwe çandin gule pir gelek",* şayesîneke hêzdar li helbestê zêde dike. Ev, hem balê dikişîne ser aliyê fîzîkî hem jî aliyê zîhnî yên tekoşînê.

2.2. Gotara Zayenda Civakî

2.2.1. Nasnameya Nû ya Jinê

Metin, jinên kurd ji rolên kevneşopiyî û navmalî derdixe û wek figûreke tekoşer, bîrewer û wêrek ji nû ve pênase dike. Bi risteyên wek *"li piştê girêda tiveng*

û du rext" û "li pêş top û tangan diçûn lek bi lek" nasnameya şervan a jinê derdixe pêş û li hemberê gotara pergala patriyarkal ku jinan dadixîne rolên pasîf lêpirsînek pêk tîne.

2.2.2. Wekheviya Zayendî

Bi diyardeyên mîna *"bi rengê xebatê nego: Ez keç im"* û *"li pêşya kura go divê ez biçim"*, wekheviya di navbera jin û mêran de û karîna wan a pêşengtiyê bi awayê zelal tê derpêş kirin.

2.2.3. Xweseriya Jinê

Bi referansa *"Bi nasîn û zanîn dibî çavşiyar"* vê risteyê, tê dîtin ku jin bi rêya perwerdeyê û bîrewerbûnê dikarin xweseriya xwe bi dest bixin. Metin, avakariya nasnameya ferdî ya ji aliyê jinan ve û kapasîteya di tekoşîna civakî de aktîf rol girtina jinan derdixe pêş.

2.3. Welatparêzî û Gotara Nasnameyê

2.3.1. Nasnameya Kurd

Îfadeya *"Keça Kurd mebe hemdemê paşverû"* bi awayekî eşkere balê dikşîne ser nasnameya etnîkî a kurdî. Ev jî, di salên 1990'î de ku tekoşîna li ser nasnameya kurd zêde ye, hewildanên hêzdarkirina bîreweriya etnîkî di xwe de dide der. Jin, wek remza tekoşîna netewî ya kurdan tê bi cih kirin.

2.3.2. Niştimanperwerî û Fedakarî

Îfadeyên wek *"Bi nîşan wê danî welatperwerî"* û *"Didan xwîn û can, wê nego ev çi ye!"* diyar dike ku fedakariya ferdan a di rêya welat de erdema herî pîroz e. Ev jî, çarçoveya tekoşîna xweseriyê piştrast dike û jinan li çeperên pêş ên vê tekoşînê bi cih dike.

2.3.3. Berxwedana Kulturî

Bi referansa *"Bi saz û bi awaz digo partî ye!"* vê risteyê, berxwedana kulturî tê pîrozkirin. Saz û awaz remzên nasnameya kulturî ya kurdan in û dide zanîn ku tekoşîn, ne tenê di warê siyasî de, heman demê de derbasê rahenda kulturî jî bûye.

2.4. Çarçoveya Îdeolojîk

2.4.1. Îdeolojiya Femînîst

Helbest, bi parastina ku jin dikarin xwe ji rolên kevnerû bişon û di têkoşînê de pêşengtiyê bikin gotareke femînîst hildeberîne. Lê belê ev, ew femînîzm e ku bi netewperweriya kurd re têkil bûye; xweseriya jinan, bi têkoşîna welat re girêdayî ye.

2.4.2. Îdeolojiya Netewperwer

Helbest, nasname û welatparêziya kurd li navendê bi cih dike. Jin, wekî remza tekoşîna neteweyî ya kurd tê pîrozkirin û hewla ferdî, ji îdealeke kolektîf re xizmet dike.

2.4.3. Perwerde û Nûjenbûn

Risteyên mîna *"Keça Kurd mebe hemdemê paşverû" û "Jiyan her li goran diçê pêşverû*", piştgiriya gotara pêşveçûn û nûjenbûnê dikin. Perwerde, ji bo hemdemîkirina jin û civakê wek amûreke tê pêşkeşkirin.

3. Encam

Helbesta Keça Kurd a bi navê "Bixwîne Jinê", di sala 1995an de di kovara Nûdemê de tê weşîn. Rola jina kurd a di veguherîna civakî de ku bi rêya perwerde, têkoşîn û welatperweriyê ve tê pîrozkirin. Tehlîla naveroka dîrokî, destnîşan dike ku têkoşîna xweseriya kurd a di salên 1990'î de bi bizavên diasporayê û bi veguherînên rolên civakî yên jinan ve girêdayî ye. Tehlîla rabêjiyê jî destnîşan dike ku, helbest di wê armancê de ye ku bi avakariya gotarên femînîst, modernîst û netewperwer jinan hem di asta ferdî de hem jî di asta kolektîf de pêşve bibe. Metin, bangewaziyeke xurt e ku destnîşan dike jin, di nav mercên dijwar ên civaka kurd de dikarin pêşengtiyê bikin û heman demê de dide zanîn ku "agahî" amûra hêzdartirîn a azadiyê ye.

b. DI CIVATÊ DE WEKHEVIYA JIN Û MÊRAN

Ji salan û vir ve ye ku di rojname û kovarên kurdî de salê careke behsa jinan û mafên wan tête kirin. Sal bi sal di heyva adarê de Roja Navneteweyî ya Jinên Cîhanê ji aliyê rêxistin û dezgehine welatên Rojhelata Navîn de tête "pîrozkirin." Wekî diyar e, ramana "mafên jinan" ji welatên rojavayî hatiye der û biryara Koma Neteweyên Yekgirtî ku salê rojeke wek Roja Navneteweyî ya Jinan bi

nav bike, bi bûyereke li Dewletên Yekgirtî yên Emerîka hatibû meydanê re peywendiya wê heye. Wek tetê zanîn, di rojên îroyîn de di nav civatên van welatan bi xwe de hemahema çi şopên bîrhanina vê rojê nemane. Roja Jinan bêtir li welatên ku wek welatên cîhana sêyem tên binavkirin maye, ew jî zêde di nav rêxistinên xwe çep dizanin de û bi şêweyeke rûtînî. Dema bebsa "mafên jinan" tête kirin, gelo mebest çi ye? Di nav civateke paş mayî de, yan di nav civatên ku tê de ol, erf û tore rolên mezin dilîzin, bersiva pirsa: "mafên jinan çi xwebêjê dide?" gellekî dirêj û kûr dibe. Lê eger mirov li gor mentiq biponije bersiva vê pirsê dikare bi kurtî wisa betê dayîn: Hemû mirov layiqî eynî mafa ne. Ji ber ku jin û peya herdu jî mirov in, ew layiqê eynî mafa ne. Lê dayîna bersiveke wisa bi gotinê hesa ye û bi kirinê dijwar e. Çima dijwar e? Dijwar e ji ber ku rola jinê di civatekê de ne wek rola wê ya di civatekê din de ye. Dijwar e ji ber ku baweriyên olî û erf û toreyên civakî ji bo bersivdana vê pirsê roleke mezin dilîzin. Li milê din, mafên jin û peyan di nav civatekê de bi proseseke dirokî ve girêdayî ye ku ev jî bi sedan, dibe ku bi hezeran sal paş dihere.

Di rastiyê de civatek wek mirovekî bi du destan e: destek jin e, yê din peya ye. Divêt her du dest ji bo berjewendiyên hevbeş, ji bo amadekirina nifşê nû û ji bo pêşeroja endaman civatê bi ittîfaq li gel hev kar bikin. Lê li vir divêt mirov pirseke giring bi bîr bîne: her civat bi eynî çavî li wekheviya jin û mêran nanihêre. Di nav hindek civatan de karê jinê li mal e: Lênêrîn û xwedîkirina zarokan e, amadekirina xwarinê ye, şûştina kinc û cilan e û hwd. Bê guman yek ji sedemên vê dîtinê ew e ku di demên raberdû de yên pere û xwarin peyda dikirin her peya bûn. Lê di nav civatine îroj de, bi taybetî li bajarên mezin, dema ku jin jî dest bi kar dike, dîtina ku şûna jinê li mal e nema dikare cihê xwe bigire. Li vir rolên jin û peyan li nav hev dikevin û krîzên malbatî dikarin dest pê bikin, heger mêr dest ji dîtinên adetî bernede (wek mînak, heger mêr hîn ji jina xwe bipê ku ji wî û ji zarokan re xwarinê amade bike, kincên wan bişo û otî bike, hundir malê paqiş bike… beyî ku biçe alîkariya wê; û bixwaze ku jina wî tevdîra xerckirina peran bi tevahî bi dest wî ve berde, li gel ku jin jî wek wî diçe kar û wek wî peran bi dest dixe.)

Bivêt nevêt, bi derbasbûna demê re erf û tore jî dest bi guhertinê dikin. Tecrûbeya civatên rojavayî di vî warê de ve yekê piştrast dikin (hindek kes wisa bawer in ku erf û toreyên civatên rojavayî her wek xwe bûne. Di rastiyê de ne wisa ye. Gelek ji erf û toreyên ku îroj di nav civatên Rojhelata Navîn de zindî ne, bere di

nav civatên rojavayî de jî hebûne.) Di nav civatên pêşketî de heye ku nema hewcedarî ji bo rêxistinên jinan hebe, ji ber ku di nav van civatan de bizav tête kirin ku jin û mêr li gel hev beşdarên birêvebirina civatê û welêt bibin. Bi gotineke din, hebûna rêxistinên cuda ji bo jinan û meran dikare bi serê xwe wek îspateke newekhevbûna wan bête hesibandin. Li welatên ku di navbera jin û peyê de bi rastî wekhevî heye, qanûn mafên her duyan jî diparêze, herdu li pêş qanûnê yek in.

Di rêxistinên siyasî û civakî de jî ew xwediyên eynî mafan û eynî pewîstiyan in. Li welatên Rojhelata Navîn rewşa jinan nayê guhertin heger jin bi xwe wekheviyê nexwaze. Lê li milê din, ji bo bidestxistina mafê wekheviya tevahî û daxwaza wî mafê rewşeke alîkar divêt. Di nav civateke gundî de ku fersendên di dest jinan de bi sînor in, ku jin nikare wek mêr biçe xwendegehe, wek wî karekî bi dest xe, wek wî serbest be, guman nîne ku hevgirtin û têkoşîna jinan ji bo wekheviyê dê dijwar be. Ev rewş taritir û dijwartir dibe, dema rêxistinên olî bi navê Xwedê bawerî û dîtinên xwe li ser jinê feriz dikin. Wek nimûne, li Cezayir û li hin bajarên Misrê keç û jin tên kuştin ji ber ku wan serê xwe li gor daxwaza rêxistinên olî girê nedane. Li ser kaxezê, yan di munaqaşayeên devkî de, dibe ku pirsa wekheviya jin û mêr wek tiştekî hêsan bête ber çav, lê di rastiyê de ev pirs yek ji dijwartirîn pirsan e. Baş e, li welatekî wek Kurdistanê ku bi kêmasî %80 jinan ne xwende ne, ola îslamê, eşîrtî û erf û toreyên kevnar hîn roleke mezin dileyzin û kar ji bo jinan hemahema tenê li malê heye, yanî di civatake wisa de jin ewê çawa bikaribe wekheviyê bixwaze, yan jî heta haydara mafê wekheviyê be? Gelo li welatên wek Kurdistanê rêxistinên jinan ku di endamên ji çend jinên bajarî pêk tên, ku ya di bin bandora siyaseta dewletê, ya jî di bin ya partiyekê de ne, heta çi radeyê dikarin bi ser bikevin? Û ji bo jinên civateke wisa, gelo ewê mafê me hebe ku em behsa mafên wan bikin? Gelo ew mafên ku ji bo jinên austuralî, swêdî û emerîkî hene, me maf heye ku em eynî mafan ji bo jina Kurd ya li Kurdistanê bixwazin! Jê bêtir gelo her mêrê ku ji bo mêr jinê daxwaza wekheviya tevahî dike, amade ye ku wê wekheviyê ji bo xwişka xwe, yan jî ji bo jina xwe bixwaze! Gelo sînorê wê wekheviyê ji ku dest pê dike û li ku kuta dibe? Ya jî, ew wekheviya em dixwazin gelo bê sînor e?

Hêjayî gotinê ye ku di rewşa îroyîn de di nav gelek civatên Rojhilatanavîn de mafên peyan jî bi sînor in. Cendirmeyek dikare bêyî sedem li mirovekî heqaretê bike û heta lêxe; leşgerek dikare mirovekî bide ber gulleyên reşaşa xwe; milîsên hukûmat

û partiyan dikarin mirovan bi tewanên wek xiyanetê û casûstiyê bikûjin. Belengazî, bê par mayîna ji xwendin û zanatiyê, erf û edetên curbecur, nakokî, pirsa namûsê û gelek tiştên din rola xwe dilîzin. Mirov dikare vê pirsê jî ji xwe bike: Peyayê ku bi xwe ne azad be, peyayê ku bixwe wekheviyê hîs neke, peyayê ku hevîrê wî di nav wehzên olî, erf û toreyên êlî û civateke ku tê de ço her tête bikaranîn, ku tê de "zor zane, devê tifinga mor dizane" gotineke gelêrî ye..., gelo ev peya ewê bikaribe baweriya xwe bi wekheviya jin û mêran bîne?

Tew li welatekî wek Kurdistanê ku ji hev beşbeş e, ku tê de hemahema her tişt bi siyaseta dewletan û ya partiyan vd girêdayî dimîne; ku tê de nexweşiyên civakî, gelşên hawirdorî, bêkarî, nebûna xizmetên tendûristî, kêmzêde niximî mane, ku tê de her dewlet û partî û mezheba olî bizava mêjîşûştina xelkê dike: Di civatake wisa de gelo ji bo wekheviya jin û mêr çi hêvî hebe, dema ku mafên mirov: Jin dibe, peya dibe, zaro dibe, li gor mercên di nav civateke bi şaristanî de hemahema ji holê wenda ne? Golo ewê çi mafê me hebe ku em hêviyên mezin ji cotkarekî nexwende bikin ku li dereke wek Kurdistanê dimîne, dema li welateke wek Swêdê, yan Almanyayê, yan Austuralyayê yekî rojhelatanavînî bi salan li wir mabe, lê dîsa jî bikaribe xwişka xwe, jina xwe, yan jî dotmama xwe bikûje, ji ber ku ew li gor erf û edetên welatê eslî ranebûye û rûneniştiye?

Di nav civateke wek ya Kurdan de, berî ku behsa mafên jinê bête kirin, pêwîst e bête aşkerakirin ka mebest ji van mafan çi ye. Hindek kes mafên jinê bi rola wê ya di nav "siyasetê" ve girê didin lê beşdarbûna di karên siyasî de xwebêja wekheviyê nade. Wek nimûne, li welateke wekî Îrana îroj, heger jineke bibe seroka welêt jî mirov ê nikaribe bibêje ku li vî welatê wekheviya jinan û mêran heye, çimkî ev jina serok heger bixwaze jî dê nikaribe li gor daxwaza dilê xwe kincan li xwe ke, dê nikaribe zewaca mêrekî bi du jinan re qedexe bike. Bi gotineke din, heger li welatekî wisa jinek tew bibe serok jî, pîvanên olî û civakî dê rê nedin wekheviya tevahî ya jin û mêr. Guherîna ji derve de jî xwebêja wekheviyê nade. Jina ku kiras û xeftan û bervaneka xwe bi pantilonekî "jeans" dabe guhertin, yan tew di meşeke xwenîşandanê de jî cih girtibe, gelo ewê gihiştibe mafên xwe? Jina ku ji dervede dibiriqe, dibe ku fermandarê li ser mêrê xwe be, gelo gihiştiye mafên xwe? Jina ku di nav hefteyekê de ji gundekî çiyayî digihê Parîsê û piştî sê salan li gel mêrê xwe û wênekêşa vîdyo li gund vedigere, gelo gihiştiye wekheviyê? Bêguman mirov nikare

sedî sed bibêje erê. Ji aliyekî din ve, gotina ku di nav civatên rojavayî de wekheviyeke sedî sed heye jî ne rast e. Hinek tenê ji derve de wek "xwedan maf" tên dîtin. Di rastiyê de ew mafên xwe bi kar nayînin û hê jî xwe ji mêran piçûktir û nizimtir dibînin, yan tew wekheviyê mereq nakin.

Li milê din di nav cıvata Kurdî de hejmareke ji jinan heye ku xwe ji mêran kêmtir nabînin lê ji bo xatirê erf û edetan ji "usûlê" der naçin. Bêyî dirêjkirina gotarê, mebest li vir ev e: Ji bo ku jin bigihê wekheviya jin û mêr divêt ew bixwe vê yekê bixwaze, divê guhertineke berdewamî di nav tevahiya civatê de cih bigre. Di nav salên dema vê guhertinê de pêwîst e hemû tiştên xwe bi wekheviya jin û mêr ve peywendîgir bikin, vekirî û bi şêweyên bi rêk û pêk têkevin munaqaşeyê, ji mafê mulkiyetê bigrin ta têkiliyên cinsî û pirsa namûsê. Yan na bi razekîkirina (teqlîdkirina) civatên rojavayî û bikaranîna klîşeyên siyasî wekheviya jin û mêran nikare cih bigre. Li milê din, divêt jin bi bawerî daxwaza mafên xwe biki, ne ku razeke jinên civatên din bike. Guhertinên civakî di warê wekheviya jin û mêr de pewîst e xuristî bin, çimkî bivê nevê rewşa civatê ya gelemper rola xwe bilîze. Heger guhertin xuristî û bi demê re be gelşên bi encama guhertinê cîh digrin jî dê kêmtir bibin.

Xwendin, mebest xwendina pirtûkan û rojname û kovaran baş e, ji bo perwerdekirin û pêşvebirina endamên civateke pir grîng e. Ji ber ku piraniya civata Kurdî nexwende ye, naxwînin, yan bi zamanê wan pirtûkan şêwecuda û kalîtebaş bi sînor in, him wekheviya jin û mêr û him jî hejmareke din ji pirsên civakî dê demeke dûr û dirêj bêbersiv bimînin. Mebest li vir helbet piraniya gelê Kurd e, ne kom û komikên li vir û wir in.

Roja Navneteweyî ya Jinan nikare tiştekî ji bo jinên tevahiya cîhanê bike, heger di nav civatên ciyawaz bi xwe de guhertinên mezin dest pê nekin. Ji bo wekheviya jin û mêr di nav civateke de, ne tenê guhertina raman û dîtinên mêran, ne tenê guhertina raman û dîtinên jinan, lê herweha guhertina şert û mercên jiyanê û berî her tiştê jî ittîfaqeke di navbera endamên wê civatê de, bi jin û mêrên xwe ve divê. (Sorekli, 1998: 61-65)

ŞAHÎN BEKIR SOREKLÎ

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

1.1. Cihê Civakî yên Jinan

Wekî ku metin jî destnîşan dike, li Kurdistanê piraniya jinan xwendin û nivîsandinê nizanîbû û binyata eşîrî, normên olî û kevnerû rolên jinan bi karên navmalî re sînordar dikirin. Di nav civaka kurdan de di sala 1995an de tevgerên jinan hîn di merheleya embriyonîk de bûn û bi gelemperî di bin siya partiyên siyasî (Partiya Karkerên Kurdistanê, Partiya Demokratîk a Kurdistanê) de xebatên xwe li dar dixistin.

1.2. Têgihiştina Roja Jinan a Navneteweyî

Di metnê de, diyarkirina li "welatên sêyemîn ên cihanê" ji aliyê tevgerên çepgir ve pirozkirina Roja Jinan a Navneteweyî, destnîşan dike ku di konteksta polîtîk a gerdûnî ya salên 1990'î de tevgerên çepgir mijara mafên jinan wek qadeke têkoşînê ji xwe re diyar kirine. Lê belê rexneya li ser sembolîkbûna van pîrozbahiyan, di atmosfera polîtîk a serdemê de balê dikişîne ser bêbandoriya çalakiyên bi vî rengî.

1.3. Ji Binemayên Dîrokî re Bersiva Metnê

1.3.1. Kêmasiya Perwerde û Bîrewerbûnê

Balkişandina metnê ya li ser kêmbûna rêjeya xwendin-nivîsandinê û xwenegihêştina agahiyan, diyar dike ku li Kurdistana 1995an binesaziya perwerdeyê qels e û her wiha ev rewş ji veguherîna civakî re dibe astengî. Di vê serdemê de sînordariya weşanên bi kurdî û qedexeya li ser perwerdehiya kurdî a ji aliyê dewletên serwer ve, bi rexneya "sînordariya pirtûkên bi naverokên guncav nexşekirî û bi kalîte" re paralel e.

1.3.2. Zextên Civakî û Siyasî

Diyarkirina metnê ya rêxistinên jinan zêdetir di bin kontrola "dewletê" an jî "partiyan" de ye, di nav civaka kurdan a sala 1995an de qelsiya tevgerên xweser ên jinan û polarîzebûna polîtîk derpêş dike. Daxuyaniya gotara xwedîlêderketina mafên jinan a Partiya Karkerên Kurdistanê wek mînak dikare were dayîn, lê sînordariya wê gotarê bi armancên siyasî yên partiyê ve, binemayeke ji aliyê metnê ve tê rexnekirin e.

1.3.3. Lihevnekirina Kevneşopî û Modernîteyê

Daxuyaniya metnê ya li ser rageşiyên di navbera rolên kevnerû û daxwazên wekheviya modern de, lihevnekirina di navbera binyatên kevneşopiyî û hewlên nûjenbûnê yên li Rojhilatanavîn a salên 1990'î derpêş dike. Metin, vediguhêze ku têkoşîna mafên jinan a li Rojava pêvajoyeke dîrokî ye, herwiha îma dike ku li Kurdistanê û Rojhilatanavîn hîn nû li ber welidînê ye.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Stratejiyên Retorîk û Ziman

2.1.1. Zimanê Muqayeseyî û Gerdûnî

Metin, wekheviya mêr û jinê bi gotareke wek *"hemû mirov layîqê heman mafan in"* dide dest pê kirin. Lê vê gotara gerdûnî, bi kontekstên herêmî yên Kurdistan û Rojhilatanavîn re muqayese dike û bi vê awayê mijarê tevlihev dike.

2.1.2. Vebêja Metaforîk

Bi teswîra civakê ya "mirovekî du mil", destnîşan dike ku jin û mêr divê di nav hevsengiyeke de bixebitin. Ev metafora navborî, ramana wekheviyê şênber dike ku çarçoveyeke ku dikare were dîtbarîkirin pêşkeşî xwîneran dike.

2.1.3. Tewra Rexneyî û Pirsyarker

Metin, hem gotara wekheviyê ya civakên Rojavayî bêyî îdealîze bike rexne dike hem jî li ser binyatên Rojhilatanavîn lêpirsînê pêk tîne. Mînak, destnîşan dike ku li Rojava wekhevî tam tesîs nebûye, bi ser de jî diyar dike ku li Rojhilatanavîn wekhevî ji aliyê binyatên eşîrî û olî ve tê astengkirin.

2.1.4. Bi Pirsan Avakariya Argumentan

Metin, bi pirsên retorîk ên wekî "Jin çawa dikarin wekheviyê daxwaz bikin?", "Sînorên vê wekheviyê ji ku deest pê dike?" xwîner sewqê ramînê dike. Ev pirs, hem di zîhnê xwîner de nîqaşeke dide dest pê kirin, hem jî argumentên nivîskar hêzdar dike.

2.2. Temayên Sereke

2.2.1. Wekheviya Mêr û Jinê û Binemayên Civakî

Metin, her çiqas wekheviya jin û mêrê wek mafekî mirovî yê gerdûnî pênase bike jî, destnîşan dike ku sepandina vê wekheviyê bi konteksta dîrokî, civakî û kûltûrî ve girêdayî ye. Destnîşankirina fikra ku mafên jinan ramaneke jêderka wê Rojava ye, tenê li welatên wek Rojhilatanavîn û Kurdistanê bi dînamîkên cihêreng dibê were nirxandin.

2.2.2. Kevneşopî, Bawerî û Rolên Civakî

Metin, balê dikişîne ser vê yekê ku binyata kevneşopî, ol û eşîrî zordariyê li ser daxwazên jinan ên wekheviyê dike. Bi taybetî li Kurdistanê kêmbûna rêjeya xwendin- nivîsandinê, sînordariya rolên jinan bi yên navmalî re û zextên normên olî-eşîrî, têkoşîna wekheviyê zêdetir dike rewşeke têkel.

2.2.3. Veguherîna Civakî û Perwerde

Metin, balê dikişîne ser vê yekê ku ji bo wekheviya mêr û jinê pêdivî bi veguherînên bingehîn ên civakî û perwerdeyê heye. Nezanîna xwendin û nivîsandinê û kêmasiya xwenegihêştina agahiyê wekî yek ji mezintirîn astengiyên li pêşiya têkoşîna wekheviyê be pêşkeş dike.

2.2.4. Hevrûkirina Rojava û Rojhilatanavînê

Metin, radigihîne ku civakên rojavayî di warê mafên jinan de zêdetir li pêş in, lê destnîşan dike ku ev pêşveçûyîn bi pêvajoyeke dîrokî ve pêk hatiye. Her wiha diyar dike ku civakên li Rojhilatanavîn jî ji ber binyatên kevnerû ji vê pêvajoyê bêpar mane.

2.2.5. Kirdewariya Daxwaza Wekheviyê

Metin, diyar dike ku divê jin wekheviyê daxwaz bikin, lê ji bo vê daxwazê jî divê atmosfereke guncav a civakî hebe. Her wiha, lêpirsînek li ser samîmiyeta daxwaza wekheviyê ya mêran jî tê kirin.

2.3. Pozisyona Îdeolojîk

Metin, perspektîfeke sekûler û modernîst di xwe de dihewîne. Wekheviya mêr û jinê di çarçoveya mafên mirovan de dinirxîne, bi ser vê re jî binyatên olî,

kevneşopî û eşîrî wek astengiyên li ber wekheviyê dibîne. Lê, xwe ji pesindana Rojavayê ya bê şert û merc dûr dixîne û destnîşan dike ku divê têkoşîna wekheviyê li gor binemayên her civakeke bixwe were dirûvîn. Ev jî, destnîşan dike ku metin ne bi temamî berê xwe dide Rojava ne jî bi temamî gotareke herêmî di xwe de dide der; zêdetir di navbera regezên gerdûnî û rastiyên herîmî de li dengeyek digere.

3. Encam

Ev metna di sala 1995an de ji aliyê Şehîn Bekir Soreklî ve hatiye nivîsîn, mijara wekheviya mêr û jinê hem ji aliyê çarçoveya mafên mirovan ên gerdûnî ve hem jî di konteksta binemayên dîrokî û civakî yên Rojhilata Navin û Kurdistanê ve tehlîleke berfireh pêşkêş dike. Bi awayê gotarî, hewl dide ku hevsengiyek di navbera barîgehîbûn û herêmîbûnê de ava bike û bi pirsên retorîk û metaforan xwîner sewqê ramîn û lêpirsînê bike. Bi rêya tehlîla dîrokî, bandorên perçebûna siyasî ya li Kurdistana sala 1995'î, rêjeya kêm a xwendin-nivîsê, binyata eşîrî û normên olî li ser mafên jinan derpêş dike. Metin diyar dike ku, ji bo wekheviyê pêdivî bi veguherînên bingehîn ên civakî, tifaqa mêr û jinê û perwerdehiyê heye, her wiha diparêze ku divê ev veguherîn xwedî demajoyeke dirêj û bi taybetî di konteksta herêmî de be. Ev jî, hem rexneyek li ser mercên sosyo-polîtîk ên serdemê tîne ziman hem jî ji bo pêşerojê nexşerêyek pêşkeş dike.

5. HEVDEM

Hevdem, kovareke duzimanî, siyasî û çandî ye ku di sala 1993an de li Stenbolê, bi zimanê kurdî-tirkî derket. Xwedî û berpirsiyarê kovara Hevdemê M. Siddiq Taşdemir e. Kovar, heta sala 1994an bi tevehî 7 hejmar derketine. Navên wekî; Bayram Ayaz, İbrahim Guçlu, İsmail Goldaş û Bubê Eser ji bo kadroyên girîng ên di kovarê de dinivîsîn, dikare werin rêzkirin. (Acar, 2010)

Ev metna ji bo tehlîlê hatiye hilbijartin, di sala 1994an de, di hejmara kovarê ya 7an de bi serneva "Bibîranîna Leyla Qasim" ji aliyê Fatma Karahan ve hatiye weşandin.

BI BÎRANÎNA LEYLA QASIM

Di salvegera bîstemîn a Leyla Qasim de ku ji aliyê Rejîma Baas a Iraqê ya faşîst ve hat qetilkirin, kesayetiya wê ya di têkoşîna wê de bûye sembol bi rêzdarî bi

bîr tînim. A rast li piştî kesayetiyeke wekî Leyla, ku bûye rihê têkoşîna neteweyî, lez û wate daye û ya girîngtir jî, bûye sembola nasnameya jina kurd a têkoşer, nivîsandin û axaftin bi min hîç ne hêsan e. Ez naxwazim qebûl bikim ku mirovên bi vî rengî hêja -ku ez ne alîgirê mirina tu kesekî me- bibin qurbaniyên siyaseta berjewendiyên zalimane û dijminê mirovahiyê, û ku bedela berxwedana li hember vê yekê jiyana wan be. Lê mixabin, welatê me hîn jî di destê van mêtinkarên xwînmij de ye û her roj bi dehan Leyla di vê rêyê de şehîd dibin. Herwiha bi hezaran şervanên bê nav û bê nasname şehîd dibin jî hene. Derbarê Leyla Qasim de qe nebe em tiştekî dizanin. Di warê xwedîlêderketina dîroka têkoşîna me de, ez zêde giringiyê didim vê yekê.

Leyla, di 13ê Gulana 1974an de li Bexdayê ji aliyê Rejîma Baasê ve ligel pênc hevalên xwe hate îdamkirin. Agahî û belgeyên derbarê Leyla Qasim de ku heta îro hatine, pir kêm in. Zêdetir bi vegotinên devkî yên kesên ku wê nas dikirin hatine parvekirin. Agahiyên hevnegirtî jî hene; mînak, kesên angaşt dikin ku ew xwendekara sosyolojiyê ye jî hene. Li vir em ê bi giştî agahiyên ku têne qebûlkirin parve bikin. Bîst sal berê Leyla, di 23 saliya xwe de xwendekara pola dawî ya Fakulteya Zanistên Perwerdehiyê ya Zanîngeha Bexdayê bû. Ew yek ji wan jinên kurd ên kêm bû ku fersenda xwendina zanîngehê bi dest xistibû. Di ciwaniya xwe de wê ji bo rizgariya welatê xwe têkoşînê hilbijartibû û di nav refên PDK-Iraqê de cih girtibû.

Leyla, ku di sala 1950yî de li Xaneqîna girêdayî Kerkûkê, li parçeyê başûrê Kurdistanê ji dayik bû, paşê ligel malbata xwe koçî Bexdayê kir. Leyla ya ku, di dema xwendekariyê de polîtîk dibe, di heman demê de bi xortekî kurd ê bi navê Cevat, ku xwendekarê Beşa Kurdolojiyê ya heman zanîngehê bû re bi nîşanî ye. Li gorî agahiyên ku em ji rayedarên PDK-Iraqê fêr bûne, Leyla li Bexdayê berpirsyara karkeran a herêma 5emîn bû. Leyla, ligel hevserê xwe Cevat û hevalên xwe Nesimî, Fuat, Mufît û Hesen Reşît, di 29ê Nîsana 1974an de di dema pêkanîna çalakiya revandina balafirê ji balafirgeha Bexdayê de, ji aliyê hêzên ewlehiyê yên Rejîma Baasê ve tê girtin. Paşê di dadgeheke riyalî(dekoratîf) de bi îxdamê tên cezakirin. Di demeke kurt de, cezayê darvekirinê yê Leyla û pênc hevalên wê di 13ê Gulanê de tê lidarxistin.

Leyla, ku navê xwe di têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê de bi awayekî nemir da nivîsandin, bi taybetî bi navê xwe yê ji bo jinên kurd bûye sembol û

bi kiryara xwe, mohra xwe li serdema nû xist. Jinên kurd ên ku bi gelemperî di têkoşîna polîtîk de, nemaze di qadên jêrîn ên têkoşînê de cih digirtin an jî barên giran, ên li piştî eniya şer hilgirtibûn ser milên xwe, bi Leyla re derketin pêşiyê û nîşan dan ku imtiyaza lidarxistina çalakiyên mîlîtanî tenê ne aîdê mêran e. Jinên kurd, bi taybetî di qada siyasî ya ku bi piranî ji wan re girtî bû de, fêr bûn ka çawa cihê xwe bigirin û dîtin ku ew ji mêrekî ne cudatir û ne jî kêmtir in, her wiha di vê mijarê de pêşdaraziyên di civakê de jî şikandin. Û Leyla Qasim, her çendî bi bedela jiyana xwe jî be, ev yek bi ser xist. Jineke kurd a hêja ye ku navê qehremaniyê bi dest xistî ye.

Îro, Dewleta Federal a Başûrê Kurdistanê bi têkoşîna xwe ya ku nîv sedsalê derbas kiriye, dest bi xweîdarekirinê kiriye û bûye yek ji mînakên baş ên demokrasiyê û her wiha hem xwedî li têkoşîna xwe ya rabirdûyê derdikeve hem jî saziyên xwe ava dike. Di heman demê de, tevgera jinên Başûrê Kurdistanê, bi navê Leyla Qasim rêxistina jinan ava dike, konferansa jinên Kurd li dar dixe û gelek çalakiyên din pêk tîne. Ev hemû çalakî, her çendî pir bi wate bin jî, di heman demê de mînakên xweş in ku jinên kurd li ked, nasname, pêşeroj û dîroka xwe xwedî derdikevin.

Parçeyên din ên Kurdistanê li hêleke, jinên Bakurê Kurdistanê, wisa xuya dike ku li ser wateya Leyla Qasim a ji bo wan û ji sembolîzmê wêdetir li ser destkeftiyên ku wê li tevgera jinên kurd zêdekiriye, zêde kûr nefikirîne. Tenê di van salên dawî de, jinên kurd ên ku dest bi eleqeya dîroka xwe kirine, ên lêpirsînê li ser xwe dikin û hewl didin xwe birêxistin bikin, di salvegerên mirina wê de dest bi bîranîna Leyla'yê kirine. Ev mijar, bi rastî ji her aliyî ve, di rojeva tevgera jinên kurd de divê bibe xaleke girîng. Dikare were gotin ku, bi taybetî pîrozbahiyên 8ê Adarê Roja Jinên Cîhanê ji bo komên jinên kurd bûye kevneşopîyek.

Her kes li gorî xwe di vê mijarê de tiştekî dike. Ev roj, rojek e ku wateyek gerdûnî bi dest xistiye û ji hêla jinên kurd ve jî lidarxistina wê watedar û pêwîst e. Ji bilî nîşandana alternatîfê, di 13'ê Gulanê de bîranînên gelêrî yên li gor naverokê pêkan e dikarin were lidarxistin. Wekî din, ji ber ku ev roj xwedî wateyek neteweyî ye, bi taybetî xwedî nirxek taybet e û ji bo me jinên kurd, bi taybetî, ev yek dikare bibe fersend û nîşangerek herî girîng ku em xwedî li ked, laş, nasname û dîroka xwe derkevin û bi vî awayî li dahatûya xwe jî xwedî derkevin. Ev bûyer, di warê têkildarî

bilindbûna hişmendiya neteweyî de, îro hê bêtir wate digire. Em hêvî dikin ku, eger tevgera jinên kurd li ser bingehek serbixwe bi cih bibe û geş bibe, ew ê bikaribe bi awayekî şênber xwedî li dîroka têkoşîna xwe derkeve û wê bike rojev. Ev ji aliyekî ve peywira her jineke kurd bi takekesî ye, lê ji aliyê din ve, ji ber sedemên wekî dengvedan, gihandina beşên berfîreh ên civakê û gelek sedemên din, ev peywirek e ku jinên kurd ên rêxistinkirî jî nikarin paşguh bikin. Di encamê de Leyla, bi têkoşîn û jiyana xwe ji bo me jinên kurd gelek tiştan îfade dike.

Di dil, hiş û pratîka me hemûyan de Leyla şopên nemir hiştiye û dihêle. Lê belê, divê em Leyla'yê di rojeke wisa de tenê bi bîranînekê vala derbas nekin, li ser wateya ku wê li ser tevgera jinên kurd barkiriye, divê em li ser nîqaş û lêpirsîn bikin; li hemberî hemû zordariya ku hewl dide wê bide jibîrkirin, em her roj wê bikin jineke kurd a zindî û çalak ku di nav me de dijî. (Karahan, 1994: 85-86)

FATMA KARAHAN

1. Tehlîla Naveroka Dîrokî

Metna bi serenavê "Bibîranîna Leyla Qasim" a Fatma Karahan di kovara Hevdemê de, di sala 1994an de hatiye weşandin, metneke bibîranînê ya hestewer, polîtîk û dîrokî ye ku ew di bîstemîn salvegera dardakirina Leyla Qasim a di sala 1974an de ji aliyê Rejîma Baas a Iraqê ve de, hatiye nivîsîn. Metin, di têkoşîna rizgariya neteweyî de balê dikişîne ser rola sembolîk a Leyla Qasim. Bi taybetî ji aliyê tevgera jina kurd ve girîngiya wê tîne ziman.

1.1. Konteksta Dîrokî

Metin, di sala 1994an de, piştî Şerê Kendavê di serdema avabûna saziya federe ya li Başûrê Kurdistanê û piştî xurtbûna hişmendiya neteweyî ya kurd de hatiye nivîsîn. Metin, vê pêşveçûnê bi awayeke erênî bi bîr tîne: *"Îro, Dewleta Federal a Başûrê Kurdistanê bi têkoşîna xwe ya ku nîv sedsalê derbas kiriye, dest bi xweîdarekirinê kiriye û bûye yek ji mînakên baş ên demokrasiyê û her wiha hem xwedî li têkoşîna xwe ya rabirdûyê derdikeve hem jî saziyên xwe ava dike."* Ev, di destpêka salên 1990'î de balê dikişîne ser deskeftiyên xweser ên Başûrê Kurdistanê û pêvajoya sazûmaniya tevgera kurd di xwe de dide der. Lê, xwedîlênederketina mîrasa Leyla Qasim a ji aliyê tevgera jinên kurd a li Bakurê Kurdistanê tê rexnekirin: *"Perçeyên din ên Kurdistanê li hêleke, jinên Bakurê Kurdistanê, wisa xuya dike ku li*

ser wateya Leyla Qasim a ji bo wan û ji sembolîzmê wêdetir li ser destkeftiyên ku wê li tevgera jinên kurd zêdekiriye, zêde kûr nefikirîne." Ev rexne dide der ku, di sala 1994an de tevgera jinên kurd a li Tirkiyeyê ji aliyê bîreweriya dîrokî ve sînordar e, û hîn jî ji binyateke sazûmaniyê bêpar e. Salên 1990'î li Tirkiyeyê, ji aliyê zextên dewletê yên li ser tevgera Kurd û li qadên giştî tunehesibandina nasnameya kurd ve serdemeke dijwar e, ev jî ji konteksta tewra rexneyî ya metnê re dibe palpişt.

1.2. Temsîliyeta Dîrokî ya Leyla Qasim

Leyla Qasim, di metnê de hem wekî figûreke şexsî hem jî wekî remza têkoşîna rizgariya kurd û tevgera jinên kurd tê pênasekirin. Hûrgiliyên wê yên jînenîgariyî bi zelalî tên vegotin: "*Di sala 1950an de li Xaneqînê welidiye, bi malbata xwe re koçê Bexdayê kiriye. Li Zanîngeha Bexdayê di Fakûlteya Zanistên Perwerdehiyê de xwendevana pola dawiyê ye, di refên PDK-Iraqê de têkoşîn kiriye û bi destgirtiyê xwe yê Cevat re di 29'ê Avrêla 1974an de di dema teşebûsa revandina balafirê de hatiye desteserkirin. Leyla, di 13'ê Gulana 1974an de ji aliyê Rejîma Baas a Iraqê ve li Bexdayê bi tevî 5 hevalên xwe hat dardakirin."* Lê, balê dikişîne ser kêmasiya belgeyên di derbarê Qasim de: *"Agahî û belgeyên derbarê Leyla Qasim de ku veguhêzîne îro, pir kêm in. Zêdetir bi vegotinên devkî yên kesên ku wê nas dikirin hatine parvekirin."* Ev jî dide nîşandan ku agahiyên dîrokî xwe spartine dîroka devkî û hebûna agahiyên hevnegirtî (mînak, nîqaşên li ser beşa xwendiye) derdixe holê. Darvekirina Qasim a piştî "dadgeheke dekoratîf", bêedaletiya Rejîma Baas û zextên wê yên sîstematîk ên li hemberê gelê kurd wekî rastiyeke dîrokî pêşkeş dike.

1.3. Girîngiya Wê ya Dîrokî û Bandora li ser Tevgera Jinê

Kiryarên Qasim, di têkoşîna kurdan a neteweyî de wek hîma bingehîn tê dîtin, bi taybetî di warê ji nû ve pênasekirina rolên jinên kurd ên di qada polîtîk de: *"Jinên kurd ên ku bi gelemperî di têkoşîna polîtîk de, nemaze di qadên jêrîn ên têkoşînê de cih digirtin an jî barê giran ê li piştî eniya şer hilgirtibûn ser milên xwe, bi Leyla re derketin pêşiyê û nîşan dan ku imtiyaza lidarxistina çalakiyên mîlîtanî tenê ne aîdê mêran e."* Teşebûsa wê ya revandina balafirê, mînakek ji tevgerên radîkal ên berxwedanê yên salên 1970'î ye û derketina jinan a ji rolên alîkar ên kevneşopiyî (li pişt eniya şer) bihurîna pozisyona pêşeng û milîtan sembolîze dike. Metin, diyar dike

ku tevgera jin a li Başûrê Kurdistanê mîrasa Qasim bisazûman kiriye: *"Di heman demê de, tevgera jinên Başûrê Kurdistanê, bi navê Leyla Qasim rêxistina jinan ava dike, konferansa jinên kurd li dar dixe û gelek çalakiyên din pêk tîne."* Ev diyar dike ku, mîrateya Leyla Qasim li Başûrê Kurdistanê bi awayekî birêxistinî tê jiyîn. Lê belê guhnedêriya vê mîrasê ya tevgera jinên li Bakurê Kurdistanê, yek ji wan xalên sereke ya rexneya metnê ye: *"Tenê di van salên dawî de, jinên kurd ên ku dest bi eleqeya dîroka xwe kirine, ên lêpirsînê li ser xwe dikin û hewl didin xwe birêxistin bikin, di salvegerên mirina wê de dest bi bîranîna Leyla'yê kirine."* Ev, qelsiya bîreweriya dîrokî û kêmasiyên birêxistinî ya tevgera jinên li Bakurê Kurdistanê dide nîşandan.

2. Tehlîla Gotarî

2.1. Zimanê Mobîlîzeyî û Hestewerî

Metin, bi tewreke hestewer hatiye nivîsîn û hewl dide ku hem ji aliyê hestî ve xwîner bike binê bandora xwe hem jî mebest dike ku xwîner bilivîne. Nivîskar, kîn û hêrsa xwe ya ferdî ya li hemberê darvekirina Leyla Qasim tîne ziman: *"Ez naxwazim qebûl bikim ku mirovên bi vî rengî hêja -ku ez ne alîgirê mirina tu kesekî* me- *bibin qurbaniyên siyaseta berjewendiyên zalimane û dijminê mirovahiyê, ku bedela berxwedana li hemberî vê yekê jiyana wan be."* Ev, li hemberî bêedaletiyê redkirineke şexsî ya nivîskar dide der û di xwîner de empatiyê hişyar dike. Rejîma Baas, bi metaforên hêzdar ên wekî "mêtinkarên xwînmij" tê şeytanîkirin, ev jî zilma rejîmê dramatîze dike û rihê berxwedanê zindî dihêle. Metin, lehengiya Qasim bi rêya îfadeyên wekî *"navê xwe di têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê de bi awayekî nemir da nivîsandin"* pîroz dike, wê vediguherîne figûreke mîtolojîk û jinên kurd vedixwîne xwedîlêderketina mîrasa wê: "*Leyla bi têkoşîn û jiyana xwe ji bo me jinên kurd gelek tişt îfade dike."*

2.2. Pozisyona Îdeolojîk: Gotara Netewî û Femînîst

Metin, bi hevgirêdana femînîzmê û netewperweriya kurd gotareke îdeolojîk a cot-tebeqeyî di xwe de dide der. Gotara netewperwer, fedakariya Qasim di konteksta têkoşîneke li dijberî mêtinkariyê bi cih dike: "*Lê mixabin, welatê me hîn jî di destê van mêtinkarên xwînmij de ye û her roj bi dehan Leyla di vê rêyê de şehîd dibin."* Ev, li hemberî polîtîkayên Rejîma Baas ên "dijminê mirovahiyê" berxwedana gelê

kurd pîroz dike. Gotara femînîst jî, diyar dike ku li qada polîtîk ku mêr lê serwer in, jin jî dikarin rolên pêşengî bi hêsanî werbigrin ser milên xwe: *"Jinên kurd, bi taybetî di qada siyasî ya ku bi piranî ji wan re girtî bû de, fêr bûn ka çawa cihê xwe bigirin û dîtin ku ew ji mêrekî ne cudatir û ne jî kêmtir in, her wiha di vê mijarê de pêşdaraziyên di civakê de jî şikandin."* Nivîskar, diparêze ku divê jinên kurd xwedî li "ked, dahatû, nasname û dîroka xwe" derbikevin û bangewaziyeke femînîst a xweserî û xwebîriyê dike. Ev jî diyar dike ku divê tevgera jina kurd di nav têkoşîna neteweyî de nasnameyeke xweser ava bike.

2.3. Tewra Rexneyî û Bangewazî

Metin, tevgera jin a li Bakurê Kurdistanê rexne dike û daxwaza xwerexneyê tîne ziman: *"jinên Bakurê Kurdistanê, wisa xuya dike ku li ser wateya Leyla Qasim a ji bo wan û ji sembolîzmê wêdetir li ser destkeftiyên ku wê li tevgera jinên kurd zêdekiriye, zêde kûr nefikirîne."* Ev rexne, guhnedêriya li hemberî mîrasa dîrokî ya tevgerê û qelsiya birêxistiniyê hedef digre. Nivîskar, ji bo bisazîbûna mîrasa Qasim pêşniyariyên şênber pêşkeş dike, bi taybetî di sêzdehê Gulanê de lidarxistina çalakiyên bibîranînê pêşniyar dike: *"Di 13'ê Gulanan de bîranînên gelêrî yên li gor naverokê pêkan e dikarin were lidarxistin."* Ev ji, li hember 8 Adar Roja Jinên Cîhanê alternatîfeke netewî û herêmî pêşkeş dike û destnîşan dike *"ji ber ku wateyeke netewî temsîl dike nirxeke taybet di xwe de dihewîne."* Ev pêşniyar, dide zanîn ku divê tevgera jinê li ser bingeheke xweser were avakirin û divê bîreweriya dîrokî jî were hêzdarkirin: *"Em hêvî dikin ku, eger tevgera jinên kurd li ser bingehek serbixwe bi cih bibe û geş bibe, ew ê bikaribe bi awayekî şênber xwedî li dîroka têkoşîna xwe derkeve û wê bike rojev."*

2.4. Metafor û Remz

Metin, Qasim wek remzeke pênase dike û destnîşan dike ku navê wê yê "nemir" li dîroka têkoşînê êdî bêyî bikaribe were jêbirin hatiye nivîsîn. *"Leyla, ku navê xwe di têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê de bi awayekî nemir da nivîsandin, bi taybetî bi navê xwe yê ji bo jinên kurd bûye sembol û bi kiryara xwe, mohra xwe li serdema nû xist."* Metaforên wekî "mêtinkarên xwînmij" û "şehîd", li hemberî mêtinkariyê berxwedanê û fedakariyê dramatize dike. Destnîşankirina pêdiviya ku divê Leyla Qasim di her roja ku dibore de, di nav me de bibe jineke kurd

a jîndar û xwedîbandor. Her wiha ji bo bi awayekî dînamîk û şirûşdar domdariya mîrasa wê, pêşniyarî tên dayîn. Ev gotar, Leyla Qasim ji figûreke dîrokî wêdetir dike rewşa remzeke îdeolojîk a jîndar.

3. Encam

Metna Fatma Karahan a bi navê "Bibîranîna Leyla Qasim", Leyla Qasimê hem wekî kesayetek dîrokî û hem jî wekî sembola tekoşîna neteweyî bi rûmet dike ku, nivîsek hestyarî û mobilizeker e. Tehlîla naveroka dîrokî, darvekirina Leyla Qasimê ya sala 1974'an wekî mînakek ji polîtîkayên zordar ên Rejîma Baasê nîşan dide, herwiha destkeftiyên otonomiyê yên Başûrê Kurdistanê yên sala 1994'an û kêmasiyên tekoşîna jinên li Bakurê Kurdistanê destnîşan dike. Veguhestina Leyla Qasimê ya bi belgeyên sînordar, girîngiya dîroka devkî û zehmetiyên kêmbûna agahiyan derdixe holê. Tehlîla gotarî jî nîşan dide ku metin, bi hevgirêdana gotara femînîst û netewperweriya Kurd Leyla Qasimê wekî lehengek mîtolojîk diafirîne. Metaforên wekî "xwînmijên kolonyalîst" û salixdana "şehîd" bûnê, vegotineke berxwedanê ya hestewer diafirîne. Rexneya li ser tekoşîna jinên li Bakurê Kurdistanê, bi pêşniyarên wekî bihêzkirina bîreweriya dîrokî û bi bîranînên 13'ê Gulanê tê piştgirîkirin. Metin, ji bo jinên Kurd xwedî li nasname, ked û dîroka xwe derkevin bangeke xurt pêşkeş dike û hewl dide ku mîrateya Leyla Qasimê zindî bihêle.

ENCAM

Ev xebat, li ser tespîtkirin û vekolîna rol û temsîliyetên jinên kurd ên di rojname û kovarên kurdî ku di navbera salên piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem (1908) heta salên 1990'î disekine. Ev xebat hewl dide ku di mîhwera van her du pirsên lêkolînê de: 1- Veguherîna normên zayenda civakî ên jinên kurd ji serdema destpêka salên 1900'î ber bi salên dawiya 1990'î ji hêla kîjan binemayên îdeolojîk û sosyolojîk ve hatine beralîkirin? 2- Ji Meşrûtiyetê heta salên 1990'î di çapemeniya kurdî de temsîliyetên jina kurd, di çarçoveya nasname, îdeolojî û zayenda civakî de çawa hatine avakirin û kîjan veguherînan derbas kirine? Li ser rewşa nasnameya zayendî ya civakî a jinan, û li ser cih û temsiliyetên jinan bi ser serdeman re rapîrsînek pêk bîne. Di xebatê de wek rêbaz "metodolojiya kombinasyona tehlîla naveroka dîrokî û tehlîla gotarî" hatiye hilbijartin û li gor wê nexşerêya xebatê hatiye amadekirin.

Ev tehlîl li ser du bingehan xwe diafirîne: Ya yekemîn tehlîla naveroka dîrokî ye, ya duyemîn jî tehlîla gotarî ye. Tehlîla naveroka dîrokî, konteksta sosyo polîtîk û kulturî ya serdema ku metin lê hatine nivîsîn dide ber çavan û bi awayekî sîstematîk temsîliyetên jinên kurd di nav herikîna demê de çawa hatine veguherîn vedikole. Ev rêbaz wê derfetê dide ku di demajoya dirêj a ji Meşrûtiyetê (1908) heta salên 1990'î de, di serdemên cuda de bandora bûyerên polîtîk (hilweşîna Osmaniyan, avabûna Komara Tirkiyeyê, polîtîkayên bişaftinê, tevgerên li dîasporayê) a li ser temsîliyeta jinê were fêmkirin. Tehlîla gotarî, bi rêya nirxandina binyata ziman, retorîk û îdeolojiya metnan, derpêş dike ku jinên kurd di rojname û kovaran de bi kîjan rolan pêşçav bûne, bi çi awayê hatine temsîlkirin, û armancên îdolojîk-polîtîk ku di bingeha vê temsîliyetê de veşartî ne derdixe holê. Ev rêbaz, ne tenê ji bo dîtina wateyên ji rû ve yên metnê, heman demê de ji bo dîtin û fêmkirina têkiliyên hêzî, bînemayên zayenda civakî û gotarên netewperwerî çawa hatine derpêşkirin jî rêbazeke di cih de ye.

Metnên ku hatine hilbijartin, piştî tehlîla bi metodolojiya navborî dide der ku di çarçoveya "serdema dawiya Osmanî û di serdemên ewil ên Komarê de", bi rêya tehlîla naveroka dîrokî hat dîtin ku, piştî Meşrûtiyeta Duyem hewlên ronakbîrên kurd

ên ji bo avakariya nasnameya netewî, nûjenbûn û reformên civakî, di xwe de dide der. Ev hewlên ronakbîrên kurd, ji bo avakirina nasnameyê û hevdemîkirina netewa kurd e. Meseleya jinê ne tenê wekî wekheviya zayendî ya civakî, herwiha wekî amûreke ji bo pêşketina giştî ya neteweya kurd tê dîtin. Jin, hem ji aliyê exlaqî hem jî ji aliyê kulturî ve wek bargirên nasnameya neteweyî tên pîrozkirin. Bi rêya tehlîla gotarî jî tê dîtin ku, kodên civaka kurdan a wê serdemê ku zêdetir xwe dispêre feodalî û eşîriyê di sînordarkirina çarçoveya rolên civakî de bûne diyardeyên bingehîn. Ronakbîrên kurd, di projeyeke netewper de jina kurd mîna aktorên çalak bi cih dike, ev jî rê dide ku jin di nav binyada patriyarkal a wê serdemê de berbiçavtir bibin, lewre ew serdema ku me muxatab girtiye em dikarin bêjin ku serdema derbasdariyê ye, ji ber wê jî hewlên ronakbîran zêdetir di rengê li hev anîna normên kevneşopiyî û nûjenî de ne, dixwazin di nav wan de dengeyek ava bikin. Ji ber wê jî her çiqas bandora binemayên wekî; bawerî, ol, patriyarkalî, eşîrî, feodalî û gundewariyê eşkere bin jî hêdî hêdî rolên modern ên wek mamostetî, li qadên giştî ên cuda xuyabûna jinan bi rêya hewla rewşenbîrên kurd dest pê dikin. Lê belê bilindkirina erkên ewilîn ên jinan ku kevanî û dêtî ne, wekî sînordariyên sereke tên tespîtkirin, her wiha di civaka kurd a piştî serdema Osmanî de vekêşanên di navbera kevneşopiyan û modernbûnê de di xwe de dide der. Bi rêya tehlîla gotarî tê dîtin ku di gotarê de rol û temsîliyeta herî zêde dertê pêş "dêtî, mamostetî (lê di forma dêtiyê de), bargira rûmeta malbat û netewê, veguhêzera kulturî û hilberînera exlaqî û kulturî" ye.

Bi herikîna demê û guherîna serdemê re (senifandina serdemî ji bo tezê derbasdar e) derî li dînamîk û binemayên nû vedibe û hişmendiya nû, bi xwe re rolên civakî ên nû diwelidîne. Tevgerên siyasî, femînîzm, modernîzm, netewdewletî û nasnameya netewî di têşedayîna rolên civakî ên jinan de yek bi yek dibin xwedî rolên eslî.

Di serdema piştî salên 1980'î bi bandora binemayên li jor hatine rêzkirin, di warê rol û temsiliyetên jinê de veguherînên nû pêk tên. Bi saya faktor û dînamîkên navborî, rol û temsiliyetên nû diwelidin. Li qadên giştî, jin zêdetir bi rolên cihêreng û nû tên dîtin. Di gotarê de temsîliyetên nûjen ên bi rengê "şoreşger, têkoşer, şervan, rêvebir, pêşeng," zêdetir dertên pêş. Piştî tehlîlên bi metodolojiya navborî tê dîtin ku; di bingeha sedemên vê veguherînê de; tevgerên siyasî, îdeolojiyên li dinyayê

belavbûne, modernîzm û têkoşîna bidestxistina nasnameya netewî rolên sereke dilîzin. Ev daneyên hatine bidestxistin di warê zelalkirina xebatê de bûne alîkar ku, her serdemek xwedî temsîliyetek e, û bi hêman û çîrokên cihêreng xwe pêk aniye.

Ji bo xebatên di pêşerojê de bi heman metodolojiyê tên amadekirin pêşniyariya sereke ew e ku; divê çarçove ji alîyê sînordariya demê û qada ku ji bo temsîliyetan tê hilbijartin diyar bibe. Bi vê awayê di warê tespîta metnan û teserûfa demê de avantajek eşkere tê bidestxistin.

Ev xebat bi rêya bikaranîna metodolojiya xwe ve qasê ku hat tespîtkirin, di vê beşê de bûye mînaka yekemîn, wekî ku tê zanîn gavên ewil herdem kêmasiyan di xwe de dihewînin, lê hêmana ku wê ji xebatek jirêzbûnê dûrdixe wêrektiya avêtina gava yekemîn e. Bi hêviya ji xebatên pêşerojê re bibe pêşeng û hevkar, ev xebat cihê xwe li refên Kurdolojiyê werdigre.

ÇAVKANÎ

Acar, H. (2010). *Di Serdema Komara Tirkîyê Rewşa Kovarên Kurdî.* Di nav, Mecmû'a ê Meqalatê Nexwostîn Hemayeşê Beynelmilelî, Danişgehê Kurdistan, 562-584.

Açık, N. (2021). Kürtler ve Cumhuriyet: Kürt toplumsal cinsiyet çalışmalarının gelişimine dair bir değerlendirme. In A. Işık, G. Kılıçaslan, B. Hiroğlu, K. Sağır, & Ç. Kurt (Eds.), Kürtler ve Cumhuriyet (pp. 709–718). Dipnot Yayınları.

Academia.edu. https://www.academia.edu/126086944/Necla_Acik_2021_Kurtler_ve_Cumhuriyet_K%C3%BCrt_Toplumsal_Cinsiyet_%C3%87al%C4%B1%C5%9Fmalar%C4%B1_n%C4%B1n_Geli%C5%9Fimine_Dair_Bir_De%C4%9Ferlendirme

Alakom, Rohat. (2019). *Kürt Kadınları Tealî Cemiyetî.* Avesta. 79.

Ararat, X. (1990). Rewşa Jina Kurd. *Medya Güneşi*, 13, 44–45.

Arakon, M. (2015). Azınlık, kadın ve Kürt olmak: Modern Türkiye'de Kürt kadınlarının kimlik ve eşitlik mücadelesi. Alternatif Politika, 7(2), 298–316.

https://alternatifpolitika.com/eng/makale/azinlik-kadin-ve-kurt-olmak-modern-turkiye-de-kurt-kadinlarinin-kimlik-ve-esitlik-mucadelesi

Aydınalp, E. B. (2020). Varoluşçu özgürlük bağlamında kadın: Simone de Beauvoir ve İkinci Cinsiyet. Litera: Dil, Edebiyat ve Kültür Araştırmaları Dergisi, 30(2), 465–488. https://dergipark.org.tr/tr/pub/iulitera/issue/58552/845711

Bedirxan, R. (1941). Jin û Bextiyariya Malê. Hawar, 28,12.

Bedirxan, R. (1941). Kebanî û Mamoste. Hawar, 27, 9.

Bozarslan, M. E. (Ed.). (1985). Kovara Jîn (Cild. 1). Uppsala, Sweden: Weşanxana Deng.

Cewerî, F. (1992). Çend Gotin. *Nûdem*,1, 3.

Devrimci Demokrat Gençlik Dergisi. 9, s.10.

Dilgeş, F. (2017). *Rojnameya Kurdî ya Herî Pêşîn Kurdistan.* Nûbihar.

Ergani Madenli, Y. C. (1993). Jinên Kurd û Pirsgirêka Jinê. Rojî Kurd, 4, 185–186.

Bayraktar, G. (2023). İkinci dalga feminist hareketin feminizmin gelişimindeki dönüştürücü rolü. Advances in Women's Studies, 5(2), 49–56.

https://dergipark.org.tr/tr/pub/aws/issue/82827/1423897

Issı, M. *Hürriyet Aşığı Bir Osmanlı-Kürt Aydını: Mewlanzâde Rifat Bey,* Toplumsal Tarih, no: 196, Nisan 2010.

Jiyan, A. (1993). Ey jina Kurd. *Rewşen*, 9, 1.

Karahan, F. (1994). Bibîranîna Leyla Qasim. *Hevdem*, 7, 85–86.

Kaya, F. (2021). *İlk Dönem (1898-1920) Kürt Basınında "Milli Birlik" Söylemi.*

Keça Kurd. (1995). Bixwîne Jinê. *Nûdem*, 13, 75–76.

Kürt Tarihi Dergisi. (2020). *Sayı 39*, 14.

Malmîsanij, M. (2006). *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayıncılığının Dünü ve Bugünü*. Vate Yayınevi.

Malmisanij M. & Lewendî M. (1992). *Li Kurdistana Bakur û Li Tirkiyeyê Rojnamegerîya Kurdî (1908-1992)*. Öz-Ge Yayınları.

Malmîsanij, M. (1998). *Kürt Teavün ve Teraki Cemiyeti ve Gazetesi.* Avesta.

Memduh Selîm Beg. (1918). *Jîn, Sayı 14*, 14-15.

Mojab, S. (2013). *Devletsiz Ulusun Kadınları: Kürt Kadını Üzerine Araştırmalar*. Avesta Yayınları.

Onen R. (2018). *Ziman û Netewesazî: Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê.* Peywend.

Özdemir, H., & Aydemir, D. (2019). Ekolojik yaklaşımlı feminizm/ekofeminizm üzerine genel bir değerlendirme: Kavramsal analizi, tarihi süreci ve türleri. Akdeniz Kadın Çalışmaları ve Toplumsal Cinsiyet Dergisi, 2(2), 261–278.

file:///C:/Users/HUAWEEI/Downloads/Ekolojik_Yaklasimli_Feminizm_Ekofeminizm.pdf

Rehmî, Ebdurrehîm. Ji bo Civata Dayîkan. (1919), Jîn, 22, 15.

